



Weşana
ENSTÎTUYA KURDÎ YA AMEDÊ

Kovara Dumehane
Sal: 6 Hejmar - 30
Rêbendan - Reşemî 2010

Xwedî û Berpirsiyariya Nivîsaran
Mehmet Aydın ALÖKMEN

Edîtoriya û Redaksiyon
Serwet DENİZ - Elixan LORAN

Mîzanpaj û Berg
Enstîtuya Kurdî ya Amedê

Wêneyê Berga Pêşîn
Naûras Sadiq AAD

Şêwirmendê Hîqûqê
M. Nuri DENİZ

Çapxane
Berdan Matbaası:
Davutpaşa Cd. Güven Sanayi Sitesi
C Blok No: 239 **Topkapı/İSTANBUL**
Tlf: 0 212 613 12 11

Navnîşan
Kalem Sk. No: 32 / 4 Huzurevleri
Kayapınar/DIYARBAKIR
Tel & Faks: (0412) 237 43 16

E-Mail
kovaraw@yahoo.com
kovarawe@hotmail.com

WEB
www.kovaraw.com

ISSN: 1309-1476

Şertên Abonetiyê
Nava Welat, salek: 30 TL
Welatên Dereke, salek: 70 EURO

Banqe & Nimroya Hesabê IBANê
Mehmet Aydın ALÖKMEN
Türkiye İş Bankası 8300 Diyarbakır

TL: TR190006400000183002114889

EURO: TR420006400000283000737070

USD: TR520006400000283000737084

Nimroya Hesabê PTT'ê
Mehmet Aydın ALÖKMEN
590 24 36

- Ji edîtor / 2
- Hevpeyvîn bi Helîm Yûsiv re - **Elixan LORAN** / 3
- Du helbest - **Ozgur DOGA** / 9
- Komîtas - **Polat CAN** / 10
- Diyalogên qusiyayî - **Dîlşêr BÊWAR** / 12
- Mêvan tîn - **Kawa ŞÊXÊ** / 13
- Xeletiyên der barê Feqiyê Teyran de - **Xweşmêr** / 16
- Ma li welatê we ker tune ne - **Ezîz NESÎN** / 19
- Pênc helbest ji dîwana "Pelên Reş" - **Kawa NEMIR** / 26
- Werêameyîşê marê qolî - **Mehmûd NÊŞITE** / 28
- Qenepe- **Behlûl ZELAL** / 30
- Em ti ne- **Feratê DENGİZİ** / 32
- Dotmam - **Kendal MÎREK** / 34
- Li min negire - **Sadedîn ÇIRA** / 35
- Dosye - Romana kurdî -1- / 36
- Bi romanûsan re guftûgo, **Edîp POLAT, Lokman AYEBE, Menaf OSMAN, Omer DILSOZ, Şener OZMEN** / 37
- Roman - **Omer DEWRAN** / 52
- Mirin berî her tiştî - **Yûnûs EROGLU** / 57
- Helbest û sembol - **Kamran Simo HEDİLÎ** / 60
- Dilberê eman - **Omer FÎDAN** / 63
- Min ji te hez kir - **Berfo BARÎ** / 64
- Şahmaran - **Hogir BERBIR** / 65
- Masî 14 - **Berçema MIŞRÎTAN** / 68
- Rûspiyê edebiyata me - **Mikailê REŞÎD** 69
- Nezîre - **Mihemed RONAHI** / 72
- Cêr şikestin - **Huseyîn GUÇLU** / 73
- Du helbest - **Şengul OGUR** / 74
- Du helbest - **Zekî KAYAR** / 75
- Bîranînên sewsî - **Xecê OMERÎ** / 76
- Çarîn - **Hemkoçerê CIZAWIR** / 77
- Bi xatirê te - **Yûsûf BAGI** / 78
- Pepûle - **Ercan DOGAN** / 79
- Rengên min - **Evdê Koçer CANO** / 79
- Xêz - **Ahmet BÎLGE** / 80

*Nivîsên ku ji bo weşanê ji kovarê re tîn şandin, li xwediyên wan nayên vegerandin.
Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji edîtor

Xwendevanên hêja!

Em wek Enstîtuya Kurdî ya Amedê û Kovara W, sersala we û tevahiya kurdihez û têkoşêrên ziman pîroz dikin. Bi hêviya peyva zimanê kurdî li dar be!

Sala nû her çiqas hêviyên nû bi mirovan re çêbike jî, pêşiyê pêdivî bi nirxandina sala borî heye. Em dikarin bibêjin ku sala 2009'an salek bû ji van 200 salên dawîn ên têkoşîna gelê kurd. Wek wan salan bi hêviyên xurt ji bo azadî û mafên xwe têkoşîya, li ber xwe da, hewl da ku pêşve biçe. Kurtêlxur û hestîkoj jî her li ser riya xwe bûn, wek benekî birêx li lingên me lefiyan. Ji bo kirin û helwestên serdestan pêdivî bi nirxandinê tune. Ku çavên Ceylanê bên bîra we bes e. Yan jî sêdarên rihbigûyan...

Wek tê zanîn DTP bi yekdengî girtin. Dibe ku bê gotin; partiyek bû hat girtin çû, wê di şûna wê de yeke din bê avakirin. Lê ev ne rast e, divê em, ên ku vî tiştî dikin baş nas bikin û hay ji xwe hebin. Lewre gur bi piranî postê mihê li xwe dikin û beriya ku mirovan gez bikin hiş û mêjiyê mirovan dagir dikin. Di pêvajoya dawîn de ev rewş baştir derket holê. Çi AKP'yî, çi Ergenekonî tu cudahî di navbera wan de tune ye. Gava ku mijar kurd bin, ji rîkoyan bigire heta liboşan, ji gurgebozan bigire heta qaşoçepgirên tev bi yek dengî dizûrin. Payîna helwesteke din bêhişî ye.

Ji aliyê ziman ve jî ligel gili, gazin û gotinên jiberkirî şiyarî û pêşketinên berbiçav hene. Kurdihez her ku diçe zêdetir dibin xwedî dam û dezgeh û ev yek jî hêviyê mezintir dike. Gelek mijarên gili û gazinan hene lê bi bawerîya me divê dem û enerjî ji bo vê yekê neyên veqetandin. Çi ji me bê em bikin wê pêşketinên pir baş û xweş derkevin holê.

Xwendevanên hêja!

Bêguman tiştên ku li ser sala borî û pêvajoyê bûn gotin gelek in. Lê em ê zêde li ser ne-sekinin. Di vê hejmarê de jî heta ji destê me hat me hewl da ku em kovareke bi dilê we bigihînin ber destê we. Mijara dosyeya me “Romana Kurdî” ye. Ji ber ku mijareke berfireh e û gelek nivîs û nirxandin hene, em ê di du hejmaran de biweşînin. **Ango mijara dosyeya bê jî “Romana Kurdî” ye.** Beşa yekemîn wê di vê hejmarê de li ber destên we be. Tevî ku têra xwe nivîs li ber destên me hene jî, kesên ku bixwazin dikarin nivîsên xwe bişînin û bi qasî ku derfet destûrê bidin em ê bîr û baweriyên wan bi xwendevanan re parve bikin.

Di vê hejmarê de em CD'ya dokumentera Cegerxwîn wek diyarî li xwendevanên xwe belav dikin. Ev jî diyariya me ya sersalê ye. Em hêvîdar in hûn ê pê kêfxweş bibin. **Ji bîr nekin CD'ya xwe bixwazin.**

Di hejmara 29'an de kêmasiyeke me çêbûye; nivîsa bi navê “Dêranî gundê Xurûcê” ya ku ji aliyê Hilmî Akyol ve hatiye berhevkirin, wek a Aşemê Şukrî di naverokê de cih girtiye û jiyan û fotografê dengbêj bi çewtî di kovarê de cih negirtiye, em ji ber vê kêmasiyê jî mamoste Hilmî û xwendevanên xwe lêborîna xwe dixwazin.

Û me ji ber rewşa aborî buhayê kovarê kir **5 TL**, em hêvîdar in xwendevanên me, rewşa me fehm bikin.

Di serê adarê de W û bihar dê bi hev re bînin. Li benda me bin!

“Agirê ku min neşewitîne ez nikarim li ser wî agirî binivîsim”

Hevpeyvîn: Elîxan LORAN

Ji ber ku pexşan bo vegotinê gelekî guncav e, rola pexşanê di dîroka/dîwana wêjeyan de xwediyê roleke diyarker e. Me jî bi çîroknûs û romanûsê kurd Helîm Yûsiv re li ser berhemên wî hevpeyvînek bi wî re çêkirin. Erê, em li ser naveroka berheman axivîn lê mijar her çû ser sînor, parçebûn, trajedî, rev û şer û rewşa kurdan a mîna daweta cinan a ku deng heye lê li ber çavan tiştek tune ye...

W: Nivîs bixwe çalakiyek e, dibe ku tu wergir û nîşangeh û niyeteke wê tune be. Dîsa jî dixwazim bipirsim tu ji bo çi û ji bo kê dinivîsî? Niyeta te ya real û ya sûblî-mînal ango niyeta ku tenê binhiş jê fam dike çi ye?

Helîm Yûsiv: Meseleya nivîsê li cem min dest pê kir, beriya ku ez bifikirim “ez ji bo kê dinivîsim”. Tiştekî wisa bû ku eleqeya wê bi biryarê re tune ye. Di biçûkaniya xwe de dema ku nizanîm çawa bi ser xwendina pirtûkan ve bûm. Di zaroktiya min de pir tişt li dora min hebûn ku min ji wan fehm nedikir. Her tişt bi awayekî berevajî hatibû çêkirin. Şaşitiyeke mezin di meseleyê de hebû ku zarokekî wek min di nav wan sînoran de bi wî awayî dijiya, şaşitî çi ye, li ku ye, kê kiriye, çawa bûye min nikaribû ji nav hev derxista. Gava ku min dest bi xwendinê kir, bi taybetî jî dest bi xwendinê edebî kir, min dît ku dinyayeke din heye, ji bilî vê dinyaya ku em tê de dijîn. Bi awayekî wê dinyayê ez bi xwe re dibirim. Ev yek destpêk bû ji bo ku ez bi ser meseleya edebiyatê ve bibim. Piştî wê carekê min dît ku dihêle mirov xwe ji bîr bike. Dibe ku êşa mirov jî zêdetir bibe. Ji hêla ruhî ve ew krîzên hanê xurtir dibin, pirs pirtir dibin. Ew tiştên ku di zaroktiyê de li dora min hebûn êşeke ji serê zarokekî, ji dilê zarokekî mezintir bû. Ji bo sivikirina vê êşê bû min dest bi nivîsê kir. Min keşf kir ku nivîsandin wê êşê, wan pirsan, wê rewşa zeh-

met a ku di zaroktiyê de hebû di-kare hi-n e k i s i v i k t i r

bike. Bi vî awayî nivîsandin li ba wî zarokê biçûk dihat kişîkirin û min ji xwe dest pê kir. Yanî biryareke wisa girêdayî hundirê min bû. Min ji bo xwe, ji bo sivikirina vê êşa xwe dest bi nivîsandinê kir. Vê dawiyê min fehm kir ku tiştê herî nêzî ruhê min pexşan e bêtir ji helbestê, çîrok e û vê dawiyê jî roman e. Bi vî rengî ye. A niha tu ji min bipirsî, bersiva pirsê te niha bidim –tiştên ku heta niha min gotin ji bo destpêkê bûn- ez dikarim bibêjim ez ji bo wan kesan dinivîsim ku li cem wan lêgerînek heye. Yanî ew kesên ku dişibin min, ew kesên ku di vî aliyî de mijûl in. Mesela dema ez tiştekî dinivîsim ne derdê min e ku her kes ji min fehm bike. Yan jî her kes bizanibe bê ez çi dinivîsim. Û ne jî ez li bendê me ku ew berhem bi hezaran an jî bi milyonan bînin xwendin. Ne li benda tiştekî wilo me. Lê ji bo wan kesan dinivîsim ku bi wan mijarên ku me gotin re mijûl in; mijarên felsefîk, zanistî, mijarên jiyane, mijarên rastiya me, mijarên siyasî, mijarên civakî yên vê rewşa ku em tê de dijîn. Hinekî bi wan meseleyan re mijûl in. Ez dixwazim bi riya nivîsê têkiliyê bi wan kesan re



deynim.

W. Dema em lê dinihêrin Mêrê Avis, Jinên Qatên Bilind, Mirî Ranazin çîrok in û dûre te romana Sobarto çap kir. Çîrok ji bo te platformeke çawa ye? Û çî nîqutî dilê te, te got ez ê îcar ji romanekê bini-vîsim?

Helîm Yûsiv: Çîrok ez bûm. Dema min dest bi nivîsandinê kir min xwe nivîsand. Bi wî awayê hanê çîrokên min jî berdewam kirin. Her ku dem derbas dibû tecrûbe û serboriya mirov bi pêş diket, nivîsandina çî-rokan jî pir dibû. Yanî min xwe di vî celebê wêjeyî de dit. Hevnişên min tevan bi helbestê dest pê kirin. Lê tiştê li ba min heye ku zelal e, ez bi riya çîrok/pexşanê bêtir dikarim bibêjim. Helbest tiştêkî zêde têra êşa min nedikir bû. Di helbestê de wê mesaja mirov zêde ne zelal bûya. Ji ber wilo meseleya çîrokê/pexşanê ji hêla ruhî ve bala min kişand. Ji hêla zanistî ve jî hîlbijartina aqil û mejî her duyan bû. Yanî ne hîlbijartina aqil tenê bû. Çîrok ji bo min tiştêkî wilo bû. Mala min bû, ez di hundirê wê malê de mezin bûm. Meseleya çûna ber bi romanê ve, di dema ku ez di hundirê wê malê de mezin bûm, ji aliyê hinek kesan ve dihat gotin ku “ev çîrok, ev karakterên çîrokê an jî tevna ku çîrok pê hatiye nivîsandin, tevî ku çîrok in jî tiştêkî ji romanê ne”. Mînak “min gelek caran qala karakterekî kir ku jidayîkbûna wî heta mirina wî wê çîroka hanê dixê bin ronahiyê”. Ji ber ku gelek caran hate gotin ku “tenê roman dikare tiştên wiha bike, ev bi riya çîrokê nayên gotin”. Gelek rexneyên bi vî awayî dihatin lê min tenê guhdarî dikir. Hêdî hêdî min dit ku wê mala ez tê de bûm –dibe ku têkiliya wê bi pêşketina emir re jî hebe, yanî mirov mezin/kamil dibe- hinek faktorên hişt ku ez bifikirim, ew xaniyê ku ez tê de me jî min re teng tê. Wek kesekî ku sê çar hezar kitêbên wî hebin û di xaniyekî biçûk de be û dûre ew kitêb bibin deh hezar û yazdeh hezar, ew xanî nema têra wan kitêban dike. Ji bo min jî ew êş û ramanên ku hebûn û min dixwest bibêjim di wî xaniyê biçûk de bi cih nedibûn. Min dixwest mala xwe firehtir bikim. Çûna ber bi romanê ve hewldaneke bi vî awayî bû ji bo ku karibim

hin deriyên ber ruhê xwe vekirî bihêlim. Wan derdên xwe, wan ramanên xwe bi awayekî zelaltir bibêjim. Mala mezin hezkirina odeya biçûk a ku ez her tim tê de jiya bûm -mebesta min jê çîrok e- ji dilê min derne-xist.

W. Te her du pirtûkên xwe yên pêşîn (Mêrê Avis û Jinên Qatên Bilind) bi erebî nivîsî û dûre jî kurdiya wan derket. Ji ber kîjan sedeman te telaqê erebî da destê erebî û dageriyayî ser kurdî?

Helîm Yûsiv: Bi bawerîya min ew vegera li xwe bû. Yanî nivîsandina min a bi erebî ne tiştêkî normal bû. Zarokekî kurd bûm di malbateke kurd de mezin bûbûm, dê û bavên min heta ku mirin jî ji bilî kurdî bi zimanekî din neaxivîn. Ne bi erebî û ne bi tirkî nizanibûn. Di malbateke wisa de ez mezin bûm ku zimanê ruhê min, zimanê aqilê min, zimanê hestên min, zimanê jiyana min a ro-jane kurdî bû. Erebi tenê zimanê dibistanê bû. Piştî şeş heft saliya xwe ez erebî hîn bûm. Lê pîrbûna jêderên erebî û xwendina me ya dibistanê û dûre di zanîngehê de jî erebî bû. Ligel zêdebûna jêderên erebî zimanê kurdî qedexê bû. Yê min jî ji biçûkaniya min û heta niha kêfa min gelekî ji xwendinê re tê. Min pir dixwend, di bin bandora vê xwendinê û zêdebûna jêderên erebî de hişt ku zimanê mejiyê mirov, derbirîna mirov bibe erebî. Ji ber ku heta te pirtûkek an romaneke bi kurdî bi dest bixista te dikaribû hezar pirtûkên erebî bi dest bixî. Vê rewşa nenormal hişt ku ez bi erebî dest bi nivîsê bikim. Hêdî hêdî bi derbasbûna demê û guherînên siyasî re derfeta ku mirov zimanê xwe yê kurdî jî bi pêş bixe derket holê. Dema ku gihîşt mirov di asta zimanê erebî de wek zimanekî wêjeyî kurdî bikar bîne min dest bi nivîsandina bi kurdî kir. Çûna ber bi kurdî ve ne guherîn bû. Ew vegera li xwezahiya xwe bû. Ji ber ku tiştê herî normal ew bû ku kurdek bi kurdî binivîse. Ji ber wilo bêtir ku ez biryarên mezin wergirim min telaqê erebiyê xist destên wê. Ji ber vê yekê jî ez kêfxweş im. Ne ku kêfa min ji zimanê erebî an jî ji zimanekî din re nayê. Helwesta min li hemberî tu zimanî tune. Lê tiştê ku li ba min bû vegera li xwezahiya min bû, ve-



gera li rewşa normal. Jixwe rexne û nirxandinên ku der heqê wan berhemên min ên bi erebî de dihatin kirin de jî digotin “bi kurdî fikiriye, bi erebî nivîsiye.” Yanî di wan berhemên erebî de jî zihniyeta avakirina hevokê jî bi kurdî bû. Jixwe çîrokên ku min dinivîsandin bi giştî li ser jiyana herêma me bûn, li ser bajarê min Amûdê bûn. Ji ber wilo jî carinan diyalogên di navbera kesan de min pêşiyê werdigerand erebî û paşê dinivîsand. Ew kesên ku min qala wan dikirin zimanê wan ne bi erebî bû, kurdî bû. Dema ku min ew berhem wergerandin kurdî –bi baweriya min peyva wergerê lê nayê, jixwe bi kurdî bûn, erebiya wan werger bûn. Min ew rasteqîniya wan wergerandin. Jixwe tu gava tekstên bi erebî û kurdî bidî ber hev wê gelek cudahî hebin. Ne tenê di peyv û hevokan de, ji gelek aliyan ve cudahî hebûn. Gava min ev xebat kir, min xwe zêde girêdayî tekstên erebî hîs nekir. Tenê ruhê çîrokê, naveroka wê, tevna wê wergerand kurdî.

W. Dema em li çîrok û romanên te dinihêrin leheng bi piranî xwendevanên zanîngehê ne. Ne mamoste ne, ne bijîşk û ne endezyar in. Hê xwendevan in. Sedema ku tu profil û demografiya xwendevanên zanîngehê bi kar tinî çî ye?

Helîm Yûsiv: Çîrokên min gelekî nêzikî jiyana min a şexsî ne. Ez dikarim ji te re bibêjim ku heta niha min çîrokek nenivîsiye ku ji jiyana min tiştek tê de tune be. Ji ber ku nivîsandin tiştekî gelekî hundirîn e. Agirê

ku min neşewitîne ez nikarim li ser wî agirî binivîsim. Ez nizamim, dibe ku xaleke lawaz be ji di nivîskariyê de. Lê heta radeyeke mezin jî girêdayî jiyana min a taybet e. Çima ez van figuran hildibijêrim? Tu bala xwe bidîyê piranî girêdayî jiyana zaroktiyê, xortaniyê yan ji zanîngeh û xwendinê ne. Ji ber ku min ev her du qonax li paş xwe hiştine. Qonaxê ku min li paş xwe nehiştibe ez ê nikarim baş li ser wê binivîsim. Wek mînak; kesê çîrokê kalekî şêst an ji heftê salî be, baweriya min a heta niha ew e ku ez ê nikaribim hestên wî wek ku tê xwestin bînim ziman. Lê dema qala zarokekî an xwendekarekî zanîngehê bikim, ji ber ku min ev qonax li paş xwe hiştine ez ê karibim wan baş binivîsim. Ji ber ku wê tiştekî nû tê de hebe.

W. Çîroka te ya “Komara Dînan/Şermola” ji aliyê Teatra Jiyana Nû ya NÇM’ê ve hatibû lîstin. Û em di “Memê Bê Zîn” de rastî kurteşanoyekê tî. Di vir de rewşek heye mirov ne dizane komedî ye an trajedî ye. Bo çî qedrê serî nizane lê jê re divê sola reş?

Helîm Yûsiv: Di vê şanoyê de ku min ew wek ceribandinekê nivîsiye û kirasê kurteçîrokê lê kiriye. Min xwest ez balê bikişînim ser tîkiliya civaka me ya bi pirtûkan re. Wek simbol jî tiştê herî zêde pêdiviya mirovan pê heye, ji hêla simbolîk ve bê nîrx e sol e. Mirov dixê lingên xwe û dimeşe. Dema mirov li rewşa civaka kurd binihêre, ew civak çawa tîkiliyê bi pirtûkan re datîne, pirtûk pêdiviya ruhê insanan e. Lê pêdiviya lingên insanan bi wê solê/alavê heye. Dema ku mirov her duyan bîne beramberî hevdu, mirov dikare rewşa civaka me ji gelek aliyan ve fehm bike an jî binirxîne. Mesela civakeke ku tu pêdiviyê bi hewcedariyên xwe yên ruhî nabîne. Wê asta wê civakê çî be? Wê ew civak heta çî radeyê hatibe xerakirin? Dema ku sol ji bo her kesî pêdiviyeke sereke be û kesek li pirtûkê nepirse, ji hêla mirovayetî ve wê mantelîte û zihniyeta wê civakê çî be? Min xwest ji van her du aliyan ve civaka kurd bixim ber ronahiyê. Ji bo ku şaş neyê



fehmkirin ez nabê-
jim civakeke wiha
wiha ye. Ew nayê
wê maneyê ku ew
civak sûcdar e.
Rewşa ku civaka
kurd tê de ye sûc-
dar dikim. Sûcdar
diyar in, biyanî ne.
Wek encama dagir-
kirinê, qedexekirina
ziman, qedexeki-
rina hebûn û taybe-
tiyan, xerakirina

ruh ev hemû encamek ji encamên siyase-
tekê ne. Encamên dirokekê ne. Beramberî-
hevkirina wek komediyê nivisandin wê
derfetên wê ji çirokê zêdetir bin. “Komara
Dînan” bi awayekî din bû. Him mijareke di-
rokî bû, Komara Mehabadê hebû, him jî
hewldanên kurdan ên ji bo azadiya xwe
nîşan didin. Min xwest ez rewşa niha û ya
berê bi riya dînan binim ber hev. Ji ber ku
daxwazên kurdan ên xwezayî dema dihatin
ziman her kesî/ê serê xwe bera ber xwe
dida. Digotin “ev din in, ji derveyî civakê ne,
ji derveyî mantiqê ne”. Ji ber ku li gor wan
mantiq ew e ku zimanê te qedexe be, tu bi
zimanê serdestan bixivî. Mantiq ew e ku tu
bê welat bijî. Min xwest ez bi awayê şanoyê
vê mantiqê berovajî tazî bikim.

**W. Di “Tirsa Bê Diran” de mirov rastî
tirsekê tê. Lê ne tirseke ku mirov jê bi-
qutife. Wekî tirsa xezaleke ku her dem li
ber çavên xwe şerekî dibîne, ango destê
leheng her dem li ser dilê wî ye. Dilneri-
hetiya ku derbasî mîrga ruhê wî bûye, ji
tirsa mirinê jî bêtir dike ku di hundirê
xwe de biqilqile. Gelo ji bo çi te xwest tu
ewlehî û sigortekirina dahatûyê wek ro-
manekê pêşkêş bikî?**

Helim Yûsiv: Mijara sereke ya ku min
dixwest roman li ser ava bibe, tirs bû. Mi-
jara tirsê jî li ba min hinekî girêdayî sînora e.
Hinekî girêdayî rewşa heyî, girêdayî rewşa
welat e. Di vê romanê de min xwest ez balê
bikişînim ser navnîşana tirsê. Ji ber wilo jî
dema ku mijara tirsê tê gotin ew quncikên di
navbera çar welat û çar sînoran de tê bîra

mirov. Di nav wan sînoran de jî bi taybetî
aliyê rojava –aliyê Sûriyeyê-. Ew der hinekî ji
parçeyên din cudatir e. Taybetiya wir çi ye?
Heta adara 2004’an jenosîdeke spî hebû. Bi
her awayî ziman ji holê dihat rakirin. Li he-
rêmên kurdan ereb dihatin bicihkirin. Qir-
kirina neteweyekê li dar bû. Lê bêtî ku
dilopek xwîn birije yan jî girtin pêk bê –gir-
tin jî gelekî kêmbûn-. Bi tevahî berê xwe
dabûn ruhê mirovan û dest bi xerakirinê ki-
ribûn. Xerakirina ruhê mirov jî çi li pey xwe
dihêle? Tirsê li pey xwe dihêle. Niha kesekî
ku ji wê derê bê tu ji min bipirsî “ka wê sis-
temê û dewletê çi kir ji serên we? Tu çend
salan hatî girtin”? Wê jî te re bibêje “Ez ne-
hatim girtin”. Tu bibêji “çend kes ji malbata
te kuştin” dê bibêje “kes nekuştin”. Tu her
qala tundiyê biki dê bibêje “tune”. Tu yê bi-
bêji “wisa be ev rewşa heyî çi ye”? Ew dijiwa-
riya sergirtî ya ku kurdên me tê de dijîn, min
xwest ez perdeyê ji ser hilînim û dema per-
deyê ji ser hilîni beriya her tiştî tirsê tê dîtîn.
Mirovekî tirsîyayî, mirovekî ji xwe nebawer,
mirovekî ruhê wî xerakirî, mirovekî ku ber
bi windabûnê ve diçe. Ev hemû xisletên wî
mirovî ne ku çil, pêncî sal in siyaset û per-
werdehiya wê sistemê li pey xwe dihêle. Di
“Tirsa Bê Diran” de min xwest ev mirovê ku
em qala wî dikin hinekî deynin ber ronahiyê
û wek kesê sereke yê romanê bi cih bikim. Ji
ber wê jî min xwest di wê romanê de qala sê
karakteran bikim. Yek jê kesekî ku li wir di-
mîne, yek jê berê xwe dide derve û yek jî wan
jî dawiyê berê xwe dide derve. Ji yên diçin
derve –ji derve mebesta min Ewropa ye- yek
winda dibe yê din jî dibêje “ew winda bû” lê
ew jî hêdî hêdî li pey şopa wî ye. Bêtî ku
haya wî jê hebe. Bi vê romanê min xwest ez
rastiya civaka me ya wê derê ragihînim. Min
xwest ez bidim nîşandan ku ketiye rewşa
mişkê Kafka, ewmişkê ku bi çar diwaran
hatibû dorpêçkirin, diwarê pêncan ji bo wî
devê pisîkê bû. Derketina Ewropayê jî ji bo
wan kesan devê pisîkê bû. Ji ber wilo jî ne bi
çar aliyan ve ji pênc aliyan ve hatiye dor-
pêçkirin. Ku ew diwar jî diwarên tirsê ne.

**W. Di romana te ya dawîn “Gava Ku
Masî Tî Dibin” de rewşa kesekî, di sê qo-
naxan de tê gotin. Berî şervaniyê, dema**

şervaniyê û piştî şervaniyê. Di romanê de te bala xwe daye rewşa kes û bandora şer a li ser wî. Gelo te lehengê xwe têra xwe tenê nehiştiye?

Helîm Yûsiv: Jixwe lehengê min bi tenê bû û roman jî qala kesekî bi tenê dike. Ku te bala xwe dabe “Masî” jî destpêkê ve yekî ku bi tenê dijî ye. Bi awayekî jî malbata xwe jî hatiye derxistin û jî serî ve kesê herî nêzî Masî, kûçikê wî “Bozo” ye. Dema yek endamekî civakekê be û endamekî/e wê civakê jî kûçikekî nêzîktirî xwe nebîne nexwe ew kes bi tenê dijî. Ev yek, a duduyan di vê romanê de min nexwest ez qala şer û jiyana şervanekî bikim. Min xwest qala jiyana mirovekî bikim. Ew kes di civakekê de dijî ku parçebûyî ye. Ew ne ji ber bîr û baweriyên xwe yên siyasî –tevî ku ew di nav de ye jî- xwe di nav wî şerî ku li welatê wî tê jiyîn de dibîne. Li vê derê tiştê ku herî zêde ez lê mîqate bûm jî bo ku ez nekim ew bû ku ez balê bikişînim ser bandora wî şerî. Tu lê binihêrî jiyana Masî ya beriya şer beşeke berfireh a romanê ye. Jiyana wî ya piştî şer yanî piştî ku jî şer vedigere jî wisa ye. Dema ku min qala şer kiriye, dema ku beşdarî şer bûbû min bi riya wan tiştên insani, tiştên ku min dixwest ez bibêjim min qala wê qonaxa jiyana wî kiriye. Ya din jî wek pîrsekê di vê romanê de min xwest jî xwendevanan an jî kesên ku têkiliya wan bi vê mijarê re heye bipîrsim. Gelo kesek li aliyê din e sînor dijî –dewletek din e, civakeke din e- çima beşdarî şerekî ku li vî aliyê sînor e dibe. Û ew qasî xwe di nava wî şerî de dibîne û bandora şer lê dibe. Çima? Gelo ev sînor çi ne? Heta çi radeyê bandora xwe li vê civakê kirine û ew jî hev dûr xistine. Ew hinek jî wan pîrsan bûn ku min bi riya Masî –ku jî Binxetê bû û beşdarî şerê li Serxetê dibû- fikir. Ji ber ku bawerîya min jî ew bû ku sînor û dewletên ku ev welat parçe kirine nikaribûn bikin du civakên cihê. Tiştê ku dikaribûn bikin ew bû ku ruhekî xera bikin,

civakekê xera bikin, têkiliyan xera bikin, lê nikaribûn bikin du civakên cuda. Û ew ê nebe jî.

W: Şêweyê vegotina te ya “Gava Ku Masî Tî Dibin” ne wekî şêweya berhemên te yên din e. Di romanê de vebêj bireser in, angû obje ne. Wekî mînak derî, kum, pirtûk, nivîst, sol û hwd. Gelo jî bo balkişandina ser psîkolojiya leheng obje bêtir dikarin biaxivin? Leheng çi bi devê xwe, çi bi devê seyemîn biaxiviya dê di vegotinê de aligirtinek hebûya gelo?

Helîm Yûsiv: Du alî hene jî bo vê meseleyê. Yek; min dît dema ku ew bi xwe qala xwe bike wê weke vebêjiyeke di ser re be. Dema kesek qala xwe bike dê nikaribe bi awayekî objektîf qala xwe bike. Ji ber ku ew aliyekî meseleyê ye. Ji ber wê min nexwest ew qala xwe bike. Ya duduyan, min xwest ez balê bikişînim ser karakterê wî yê hundirîn. Yanî ev teknîka ku min bikar anî balê dikişîne ser jiyana Masî, têkiliya Masî ya bi tiştan re. Ew tişt dikarin baştir qala Masî bikin jî hevalekî wî yê mirov. Ev tişt nêzîkî karakterê Masî ye jî. Ji ber ku karakterekî bi tenê ye, ji ber ku têkiliya wî jî mirovan bêtir bi tiştan re heye. Yanî hîlbijartina vê teknîkê girêdayî karakterê Masî û hundirê wî û xwezahiya wî ye. Van her du sedeman hişt ku ez vê teknîkê bikar bînim û balê bikişînim ser wê yekê jî ew tiştên ku bi mirov re dijîn û haya mirov jê tune beşeke jî jiyana mirov in. Û rastiya mirov baştir dizanin û dişopînin û dikarin vebêjin jî.

W: Gava mirov qala çîroka kurdî bike yekser navê Helîm Yûsiv tê bîra mirov. Di gelek nivîsan de tê gotin ku çîroka kurdî xitimîye. Fikira te li ser vê yekê çi ye? Û bi awayekî îronîk mirov li meseleyê binihêre, ma xitimîn ne tiştê baş e ku dê rojekê ev xitimîn vebe û bi wê re jî gelek tiştên ku sekinibûn biherikin?

Helîm Yûsiv: Hurmeta min jî dîtî û nê-



rînên her kesî/ê re heye. Lê tu carî ez ne bi wê yekê re me ku çîroka kurdî xitimîye, yan jî hatiye xitimandin. Bi min ev dîtineke ne cih de ye. Dîtina min berevajî vê yekê ye. Gava mirov dibêje çîroka kurdî gelek kes, faktor û rewşên tîna bîra mirov. Ez ê serbilind bim ku keda min di geşbûna çîroka kurdî de hebe. Lê wê bi navekî û du navan ve ne girêdayî be. Gava mirov dibêje çîroka kurdî, mirov qala rewşekê dike. Bi dîtina min îro ro riya ku li ber çîroka kurdî û bi taybetî jî ya li ber a kurmançî li Bakur jî her rojê bêtir vekirî ye. Ev kesên ku wiha dibêjin dibe ku xwe bispêrin nîrxandinên reşbîn û wek kesên ku her tim li aliyê vala yê qedehê dinîhêrin. Bi bawerîya min divê mirov bi tenê aliyê vala nebîne. Ez jî bo çîroka kurdî xweşbîn im.

W: Gava ku mirov li jiyana Helîm Yûsiv dinîhêre toz, sînor, nasname, takekes, agirê sînemayê, mayîn, çûyîn, penaberî, nivîs li ber çavan dikevin. Te jî van tiştan û gelek tiştên girêdayî van tiştan kîjan daqurtandîye? Û dîsa jî van tiştan kîjan di hundirê te de ne û tu venereşîyayî?

Helîm Yûsiv: Ev tiştên ku te rêz kirin hemû ez im û hin tiştên din jî hene. Bawerîyek li cem min hebû -dema ku ez wan sînoran derbas bikim, di mehên dawîn ên derketina min a derveyî welêt de- ev mijarên ku te rêz kirin ez ê bikaribim li pey xwe bihêlim û ez ê jî vir herim. Piştî ku min ew sînora derbas kirin û ez çûm wê derê, min dît yek jî van tiştên ku te hejmartin jî min nikaribû jî hundirê xwe derxim. Lê her tişt jî hat guhertin. Nêrîna mirov a li wan tiştan, tîkiliya ruhî ya di mirov û di wan tiştan de, zelalbûn û nezelalbûna wan tiştan, rengê tîkiliyê yê bi wan mijaran re guherî. Lê hemû di hundirê min de zelaltir bûn. Bawerîya min ew e ku heta ez bijîm ez ê ava nivîsandinê jî van çavkaniyan vexwim. Wê ev çavkanî di hundirê min de neçikin û xelas nebin. Heta niha jî toza Amûdê di bin çermê min de ye. Li Ewropayê her roj ez serê xwe dişom lê ew toz di bin çermê de ye. Ne ava Ewropayê û ne jî ava dereke din nikare wê tozê jî bin çermê min derxe. Wisa jî mijara sînora û welatê mirov wek birînekê di bin

çengê mirov de ye. Herî ku ew birîn bi te re ye. Ji ber wilo derketina Ewropayê tenê hinek guhertin çêkirin. Bîr û bawerî û zanînen mirov de di hinek tiştan de zêdetir kirin. Tenê rengê wan birînen ruhî guherî lê kûrahiya wan wek xwe ma.

W: Çîrokeke te jî ber hevoka “dinya ji tuwaletêkê biçûktir e” li Sûriyeyê hatibû sansûrkirin. Bi rastî dinya ji tuwaletêkê tengtir e nemaze jî ji bo kurdan?

Helîm Yûsiv: Ew çîroka ku tu dibêji çîrokek bû jî pazdeh çîrokên “Mêrê Avis” hat sansûrkirin û ew çîrok jî pirtûka çapa erebî hat derxistin, paşê me li ya kurdî zêde kir. Çîrokeke gelekî taybet e, ez naxwazim li ser wê bi axivim lê bi awayekî ez dikarim vê bibêjim; dema ku min nivîsibû “dinya ji tuwaletêkê biçûktir e” ez di rewşeke wisa de bûm ku min dinya wilo didît. Piştî ku min cihê xwe guhert û min mezinahî û firehiya dinyayê dît, ez niha dinîhêrim ku tuwalet tiştêkî pir mezin e, dema mirov bide hemberî dinyayê. Ji ber mantiqa ku dinyayê bi rê ve dibe, mantiqa hêzê û pasaportê, ez dibêjim dinya ne tenê ji tuwaletê, jî qulika tuwaletê jî biçûktir e.

W: Gotina dawîn ji ya pêşîn dijiwartir e. Gotina te ya dawîn bo xwendevanên Kovara Wyê çi ye?

Helîm Yûsiv: Ji ber ku wê xwendevanên Kovara Wyê bi kurdî zanibin ez ê qala girîngiya ziman nekim. Lê her dem kêfa min jî wî xwendevanî re dihat ku, ne xwendevanekî basît bû, yanî gava ku nivîsekê bixwîne karibe tîkiliyekê bi wê nivîsê re deyne. Ew tîkili jî hêla ruh ve be, jî hêla aqil de be, serbest e bi çi awayî be. Lê jî bo xwendevanên Kovara Wyê mirov dikare vê yekê hêvî bike ku xwendevanên Kovarê jî jî wî cureyê xwendevanan be. Nivîsên ku bixwînin ne tenê wek ziman divê wek ruh jî tîkiliyê pê re deynin. Bila Wyê bişopînin û piştigiriya wê her tim bikin jî ber ku kovareke li dilê welatê me bi zimanê me derdikeve, gerek hinekî taybetiya wê hebe. Ji bo xwendin û belavkirina wê çi jî destê mirov bê divê mirov bike.

Du helbest

Ozgur DOGA

Wergera ji tirkî: Welat DILKEN

Wekî keştiyên kaxizî ku xwîn dilopî ye

Ku dengê min
Gihîşt ezmên
Cihan wê rêgeha xwe
Wenda bike
Xweliya min
Wê di destê
Mûsayê fafik de
Li zeryaya sor
Bê libakirin
Ewr
Wê tasek ava pîrozkirî
Vereşin

Zilma mûmîkirî
Gelo karibe pîramîdan bişewitîne

Ku pişta dîrokê
Xûz bû
Xwe bide
Ber deriyê razê

Wekî keştiyên kaxizîn
Ku xwîn dilopî ye
Ey Mûsa
Ji kê re rizgarî ye
Va zilm

Ey zarokê ku dahatûya xwe hatî qûndaxkirin

Zarokê ku ketî dextlê
Şoreşa leşkerî dîtiye

Ka mirov fam dike
(lê)
Çivîka
Humê
Bêgav e

Di dawiyê de
Bêhna cihê şewatê tê
Ji mamên
Serhildêr

(Ku)
Zimanek hatibe melisandin
Û
Ku yê din hatibe hincirandin
Li payîzê
Pelek diçilmise

Bi zimanê çivîkan biaxive
Ey zarokê ku dahatuya xwe hatî
qûndaxkirin

Komîtas

Polat CAN

Xebatên wî yên wekî Derwêşê Evdî, Mîrza Axa, Mem û Zîn, Hecî Mûs, Seyran, Can Bila û gelekên din niha di muzexaneyê Êrîvanê tînin parastin

Li ser çateriya cadeyên Tîrîan û Maştust, li baxçeyê akademiya Muzîkê li Êrîvanê, muzîkarê mezin û giran li ser koka dareke mezin, di siya çinaran de rûniştiye. Bi hemû hîs û melakên xwe guhdarî awazên zîz ên ku ji akademiya muzîkê tînin dike. Ew bi baskên nazdariyê û germahiyê nobedariya akademiya ku bi navê wî ye dike û rê ji keç û xortên ciwan ên ku li ser pêlekên cîhana muzîkê radibin dide. Her ku yek ji wan ciwanan noteke wî (ya ku bi xwe daniye) şaş lê dixê, ew yekser jê re rast dike. Ji ber ku ew rizgarvan, nûjengerê muzîka yek ji gelên resen ên Rojhilat û Qefqasya ye. Ew bav, oldar, lêkolîner û gerokê ku celadên Toranî jîna wî û ya gelê wî zivirandin dojehek bê serî û bê derî û ew dil û mejiyê tijî mirovperwerî û huner û dostanî ji dest girtin.

Komîtas: Ew nobedarê ku çanda gelê ermen parast, ji windabûnê rizgar kir û wek xezîneyek binirx pêşkêşî gelê xwe kir.

Dostê Gelê Kurd

Komîtas ne tenê muzîkar bû, ew di heman demê de dostekî dilgerm û hevalekî wefadar ê gelê kurd bû. Ew gelek demên cuda di nava gelê kurd de rabûye û rûniştiye û gelek têkiliyên wî yên pir baş bi kurdan re hebûne. Çand û kelepûra kurdan baş dizanibûye. Ew ji wek wêjevan û rewşenbîrên mezin ên ermen Aboviyan, Raffî, Orbelly... Komîtas ji dostekî mezin ê kurdan bûye. zimanê kurdan baş diaxivîye, li stran û kilamên wan bi dilşadi û baldarî guhdar kiriye, bi wan kilamên bêhempa sermest bûye û bi wan dengbêjan re di nava deryayên evîn, lehengî û mîrxasiyê de avjanî kiriye. Komîtas, di nava kurdan de



bi navê Siloyê Kurd dihat naskirin. Komîtas, wek yekemîn muzîkar ê ku sazbandiya kurdan û awazên stranên wan li ser notayê nivîsandiye û bi vê xebata xwe dîsertasiya (tez) dîploma bilind a muzîkê girtiye. Ev xebata xwe wek Melodies Kurdes bi nav kiriye. Di vê xebatê de kilamên kurdî yên herî navdar kom kirine, awazên wan li ser notaya muzîkê nivîsandiye û şîrove kiriye. Kilamên ku li ser xebitiye hinek jê ev in: Derwêşê Evdî, Mîrza Axa, Mem û Zîn, Hecî Mûs, Seyran, Can Bila û gelek kilam û stranên din ku niha di muzexaneyê netewî de li Êrîvanê tînin parastin.

Ji lew ra jî, ne şaş e dema ku muzîkar û rewşenbîrên her du gelan ango kurd û ermen, Komîtas ji xwe re wek nîrxekî çandî û pêşengekî sazbandiyê dibînin. Çi kes nikare dema behsa sazbandiya kurd an ji ermenan bike, bîyî ku navê Komîtas bibije derbas bibe. Cihê wî ne tenê di nava çand û sazbandiya ermenan de, di heman demê de di nava ya kurdan de jî pir baş tê ditin. Ew ne tenê di warê sazbandiyê de, ew wek pireke ji hevrişimî di nava dilê gelan de bû. Wî wek awaz û peyvên wek merhemên hekîman derd û birînen gelan derman dikirin.

Zarokê şareza û oldarê giran

Ev Komîtas kî ye? Ev ê li ser koka dara li pêşiya akademiya muzîkê ya bi navê xwe li bajarê delal Êrîvanê, nobedariya wan şagirtan dike û hemû giyanên nepak û awazên nerast re şer dike. Kî ye ev muzîkarê ku rizgarvanê rasteqîn ê bermayên resen ê muzîka gelê ermen e? Ev kî ye yê ku yekemîn car muzîka gelê kurd li ser notayê nivîsandiye û

di mezintirîn zankoyên Ew-rûpayê de wek lêkolîn pêşkêş kiriye? Û hîn gelek pirsên din dikevin bala mirovan, bi taybetî jî, kesên ku zêde agahiyên wan li ser Komîtas tune ne.

Sogomon Sogomoniyan ango Peder Komîtas di der dora sala 1869î de ji dayîk bûye. Piştî salekê dayîka wî miriye û di 11 saliya xwe de bavê xwe winda kiriye. Ev sêwiyê bêkes, di sala 1882'yan de tevî dibistana olî ya rahîban li Eçmezdînê (bajarekî li Ermenistanê ye) bûye. Dengê wî yê pir xweş bala her kesî kişandiye. Di dibistana rahîban de zarokên ermen ên ji her memleketî hatibûn hebûn. Komîtasê biçûk li hemberî dewlemendî û rengînîbûna muzîk û stranên cihên cuda yên memleketên ermenenan matmayî dimînê. Komîtas vê yekê dinirxînê û dest bi berhevkirin û nivîsandina van stran û awazan dike.

Di sala 1892'yan de Komîtas ji dibistana rahîban mezûn dibe û pileya keşetiyê digire. Piştî beşdarî gelek konferans û civînan dibe û gelek sêmîneran li ser muzîkê pêşkêş dike. Her wiha di çend kongreyên navnetewî yên muzîkê de cih digire. Êdî nirxandin û nivîsarên wî di gelek rojname, kovar û weşanan de derdikevin. Komîtas bi van xebat û bi konserên ku li Ew-rûpayê dide, gelekî navdar dibe.

Piştî van serkeftinan, Komîtas dişa vedigere bajarê pîroz ê ermenan ango Eçmezdînê. Li vê derê bi hemû hêza xwe dikeve nava xebata berhevkirin, civandin, paqijkirin û nivîsandina muzîk, stran û awazên gelêrî yên ermenan. Ew viya bes nabîne û dest bi geryaneke dirêj, di nava hemû bajar, gund û şênîyên ermenan de dike. Her cihê ku diçe, li wir stran, kilam, awazên gelêrî ji devê dengbêj û gundiyan kom dike. Van berheman hemûyan bi hev re dipêve, paqij dike, sererast dike û bi awayekî zanistî dinivîse. Wisa jî, bi vê xebata xwe xezîneyeke bêhempa û pir giranbuha ya çanda gelêrî û muzîka neteweyî ya gelê xwe ava dike û ji windabûnê diparêze.



Qurbanê çavnebariyê

Komîtas ne tenê stran û awaz ji nava gundiyan berhev kiriye. Di heman demê de, wî gelek konserên bi nav û deng li seranserê welatên Ew-rûpayê pêşkêş kirine. Heta sala 1906'an wî li Rûsya, Îtalya, Vîna, Siwîsra, Elmanya û Parîsê konser daye. Piştî van serkeftinên bêhempa, Komîtas dişa vedigere bajarê xwe yê pîroz. Lê vê carê bi başî

nayê pêşwazîkirin. Keşe û rahîbên ku jê aciz in, li derdora wî konên fitne û fesadiyan vedigirin û wî di nava xwe de napejirînin. Li ser vê yekê Komîtas pir xembar dibe û neçar dimîne ku ji wir derkeve û berê xwe bide Stenbolê. Li wir dixwaze saziyeke muzîka ermen veke, lê derfet dişa li pêşiya wî dibin asteng. Li ser vê yekê ew li şûna saziyê, komeke muzîkê ji 300 kesî, bi navê Kosan ava dike. Li rex hemû astengî, zorî û zehmetiyan Komîtas dişa di xebat û têkoşîna xwe ya muzîkê de bi ser dikeve.

Di sala 1913'an de, dişa dikeve ser riyan û di nava gund, bajar û mezreyên ermenan de digere û xezîneya gelêrî berhev dike. Bêyî ku dest li reseniya van stran û awazan bide, wan paqij dike û dinivîse.

Komîtas dostê muzîkê bû, wî bi qasî muzîka gelê xwe yê ermen, ji muzîka kurdi jî hez dikir; xebat û berhemên wî yên di vî warê de vê yekê diçespînin.

Komplo

Di wan salan de, faşîstên Toranî yên bi navê Îttihat Teraqî desthelatdariya xwe di dewleta Osmaniyan de xurt kiribûn. Planên wan ên dîr û dirêj hebûn. Wan dixwestin ku li ser nexşeya dewleta Osmaniyan çu gelekî din nemîne. Wan biryara xwe girtibûn ku hemû gelên din tune, an jî koçber bikin. Jixwe biryara li hember ermenan ji zû ve hatibû girtin û kêliya pêkanîne kêmbûn. Di sibeha 24'ê nîsana sala 1915'an de, 250 kesayetên ermen ên li pêş, ji rewşenbîr, siyasetmedar, muzîkar, nivîskar û zanyarên

ermenan hatin girtin. Di nava wan de muzîkar û keşeyê dilnizm Komîtas jî hebû. Ev hemû mezinên ermenan di kampên wek dojehê de hatin komkirin, hemû cureyên êşkence, zulm û xerabîyan bi wan hatin kirin. Komîtasê dilnarîn, bavê muzîkê, nedikarî vê hovîtiyê bipejirîne, mejî û dilê wî li hemberî wan kiryarên dermîrovî ranekir. Di encamê de Komîtas eqlê xwe avêt û dîn bû.

Li ser destwerdana gelek aliyên navnetewî û nerazîbûnên mezin, Komîtas serbest hat berdan. Lê êdî mejiyê wî çûbû dûr... Ew gelek salên dirêj di nexweşxaneyê de dînan a Parîsê de ma, ligel hemû hewldanên bijîşkan nehate dermankirin û eqlê wî paşve venegerandin.

Piştî rêwîtiyêke bi êş, azar û zorahîyan, di 22'yê meha dehan a sala 1935'an de, ew dilê mezin rawestiya û çavên xwe li jînê girtin.

Piştî salekê termê Komîtas jî Parîsê veguheztin paytexta Ermenîstanê Êrîvanê. Niha jî, gora wî bûye ziyaretêke pîroz a hemû ermenan. Navê wî jî bûye nîşana çand, huner û muzîka neteweyî ya ermenan. Li ser navê wî gelek dibistan, akademî û kom hatine saz kirin.

Komîtas bi rastî jî, rizgarvan û parêzvanê muzîka gelê xwe bû û dostekî baş ê gelê kurd bû. Nîrxê wî bi qasî ermenan li gel kurdan jî heyê...

Ew di heman demê de, sembola dostanî û biratiya gelê kurd û ermen e. Hemû faşîst û dijminên gelan mirin, lê Komîtas hîn di awaz û strana her şagirtê de dijî. Ew hîn jî, di hezkirina kurd û ermenan de dijî, ew di notayên muzîka kurdî yê ku li paş xwe hiştî de dijî.

Diyalogên qusiyayî

Dilşêr BÊWAR

*Bextiyariya jiyan û şehwetê
bi sê tiştan ve girêdayî ye; goşt-xwarin
li goşt siwarbûn û xistina goşt nava goşt
(ji çîrokeke hezar û şevekê)*

-Lê lê, ez ê rûpelên xalî
yên pêsîrên te biçînim
Li deşta singê te
govenda talanê li dar bixim
Cergûbeza salan radestî hêsrên
xwîna reşgirêdayî bikim
Kovî û hovîtiya mêrane li delava ku ji
gulava di pêşa te de diherike
hînî kuştina laşê
xewnên veçiriyayî bikim

- Lo lo malneketo gurzên kulîlkên çil-
mîsî di çemê xwînê de şîn bûn
tu hê jî simbelên xwe yên
bê mû badiyê û nikulên
xwe yên zîvîn di gerdana
xezalan de diçikîni û
laşê xwe yê kixseyî dipesîni

-Lê lê
Deng û sewta ku min ji
ber çoka Xanê vedizî
Ez ê di xizna çira salên wendayî de
li paş berbiskên te bipispisînim
û nermabayê ku di huskura
ciwaniya te de pengîziye
bi dengê bilûrê der bikim

Lo lo şêto wezê rabim
şikefta xwe ya nûranî birûçikînim
Bêhna heft gulistanan
li ser bejna pêsîran dawêşînim
Di ber goristana termê te de
xwe bihejinim
Tu yê çî rêxê bi devê
heft bavê xwe û min ve biki

Mêvan tên

Kawa ŞÊXÊ

Ew ne problema min e, ma çavê te lê ye Beşîr vegere Sûriyeyê û bêje wekî me girarê û mast dixwin?

Ji nîvroyê de telefona min lê dikeve û qut dibe, xuya ye hinek dixwzin ez ji wan re lê xim lê numareya wan li ba min dernakeve, dibe ku bavê min be ji Sûriyeyê?

Min karê xwe li restoranta ku ez tê de kar dikim, qedand û min bazda cihê telefonan.

Ez li bavê xwe geriyam, wî got hinek pere ji min re gerek in lê ne ez bûm, min ji te re lê nedaye.

Êvarî piştî ez hatim malê, dîsa telefona min lê da, lê vê carê ez gihîştimê, min vekir!

- Elo.... Elo!??

Dengek hat min digot: Eh weleh vekir em talan kirin. Û hema girt.

Ez di deng de mijûl bûm, ne birayê min bû, ne jî xezûrê min bû, min got kî dibe bila bibe, heger jê re lazim be wê dîsa bigere!

Nêrîna jinikê jî wek a min bû, heger ji wan re girîng be wê dîsa bigerin.

Dora saetekê di wê navê re çû, telefona min dîsa lê xist, min vekir dengê ji kûr ve hat min:

- Li min bigere ez Beşîr im li benda telefona te me!

- Beşîr kî ye?

- Beşîr kî? Beşîr ê lawê meta te, yan tû nema me nas dikî? Û telefon girt.

Ez lê geriyam û ew lez û beza di dengê wî de hemû çû û dest bi gazinan kir:

- Kuro malxerabo tu nabêjî lawê meta min heye, ma te meta xwe ji bîr kiriye? Ma Almanya merivan wisa diguherîne, ma ew qas jî dibe?

- Bi Xwedê ez ji te re bêjim, hûn di bîra min de ne û ez we ji bîr nakim. Tenê karê dinyayê!

- Erê, erê, ez zanim tu bi hevdana pereyan daketiye, gerek aniha te pere baş dabin ser hev ne?

- Bi Xwedê ez çî ji te re bêjim!!!

- Tu çî dibêjî bêje, wextê min heye û va ye jina min li kêleka min e, silavan li te dike.

- Li ser çavên min, tu jî silavên min lê bike!

- Kerem bike lawê xalê min, tu bi xwe jê re bêje, ma qey tu xerib î!

Û ez deh deqeyan bi jina wî re jî axivîm, û jina min li hemberî min saetê nîşanî min dide û bi dengê hêdî dibêje;

- Telefona Sûriyeyê pir biha ye.

Di dawiyê de lawê meta min rahişt telefonê û ji min re got:

- Lawê xalê min, nûçeyê gelekî xweş li ba min heye, ez ê werim Almaniyayê, ez û diya zarokan. Em ê werin bi mêvanî, meha yekemîn ji sala were ji bo mehekê.

Telefon girt, piştî ku karê du rojan kir fatoreyê ji telefonê re.

- Çi heye, çî ji te dixwaze? Jinikê pirsî.

- Wê were Almaniyayê bi mêvanî, ew û jina xwe û her sê zarokên xwe!

- Wê werin çî?

- Mêvanî.

- Kingê?

- Meha pêşîn ji sala nû.

- Wê çiqasî bimînin?

- Mehekê.

- Wê tenê li ba me bimînin, an wê herin mala birayê te û xwişka te jî?

- Niza!!!

- Kes ji merivên wî ji we nêzîktir li Al-

manyayê nîn e?

- Na!

- Ê ...

- Ê çi?

- Em ê çi bikin?

- Ez ê sibê ji birayê xwe û xwişka xwe re bêjim, bê em ê çi bikin!

- Uffffff.

- Uffffff çi?

- Ufff ne tiştê, ew ji me re ji ku derket?

- Hîna du meh mane wê Xwedê çêke!

Roja din em her sê li hev civiyan, birayê min yê mezin got:

- Wê li mala te bimînin, an wê werin ba me hemûyan?

Xwişka min got:

- Ma çêdibe, tu dixwazî vegere Sûriyeyê bêje ez tenê li mala wî mam? Divê em jî wî bibin malên xwe.

Min got:

- Em karin vê mehê li me her sêyan par bikin, her yek deh roj.

Birayê min got:

- Yê min cih li ba min nîn e, heger werin ba min ez gerek odeya xwe ya razanê bidim wan û divê ez li ser dîwanê razem û berê pişt min diêşe!

Xwişka min got:

- Ew pirsgirêka te ye, yê min ez bi xwe nahêlim vegerin Sûriyeyê û rûnên behsa min bikin, ez ê sibê herim sê doşekên mêvanan bikirim û pîjemayekî xewê ji her yekî ji wan re.

Jina min xwe avêt nava gotinê:

- Wisa be em jî mecbûr in bikin?

Min got:

- Ji pîjemayê xewê pirtir di mala me de?

- Na lo, tu dixwazî vegere Sûriyeyê û bêje em di pîjemayên xwe yên kevn de bi xew kirin?

Birayê min got:

- Ma çend zarokên wî ne?

- Sisê ne!

Birayê min got:

- Ez tiştêkî wisa nakirim, ma qey pîjemayên wan nîn in li Sûriyeyê?

Em ji hev bela bûn, piştî du rojan birayê min telefon vekir dipirse:

- Ma tu mezinbûna wan zarokan zanî?

- Ya kê?

- Ya Zarokên Beşîr.

Paşê min fam kir ku jina wî gava bihîstîye ku em ê bikin, jê re gotiye:

- Çavê te lê ye lawê meta te vegere Sûriyeyê, me bihetikîne û bêje, ji hemûyan wî em di pîjemayên kevn de bi xew kirin?

Û wî jî kirin.

Sibehê dengê deriyê min hat, min derî vekir, min dît xwişka min şûşeyên avê di destên wê de ne.

- Xêr e ev çi ye?

- Ev av e, min ji we re anî!

- Ava çi?

- Ava normal a min a berê vedixwar!

- Ma tu yê çi vexwî aniha?

- Ez ê ava tûj vexwim ya bigaz!

- Ew çima, qey doxtor ji te re gotiye?

- Na, lê divê ez xwe hînî wê bikim, berî lawê meta min were?

- Çi îşê lawê meta min bi avê ketiye?

- Çavê te lê ye here Sûriyeyê, bêje em ava wek a wan vedixwin? Ma ne divê wê ava bigaz bibîne û here behsa wê bike!

Deng çû jina min, ji odê derket:

- Ê tu çima didî me, em ê jî ava xwe bavêjin û ne tenê av, em ê xwarinên ku em ji ba ereban û tirkan dikirin, bulxur, mulxûran hemûyan bavêjin. Û di wê meha ku wê tê de werin, em ji xwarinên Almanan pê ve naxwin!

- Lê ez nikarim xwarinên Almanan bixwim? Min got.

- Ew ne problema min e, ma çavê te lê ye Beşîr vegere Sûriyeyê û bêje wekî me girarê û mast dixwin?

Jinbira min bihîst, êvarî wê jî hemû

xwarinên ku havînekê sax tê de xebitîbû hemû diyarî xelkê kirin.

Piştî me her yekê doşek, lihêf, kinc ji wan re kirin û hemû rengên xwarinê, vexwarinê di her sê malan de hatin guhertin, em dîsa li hev civiyan.

Xwişka min a ku karê paqijiyê di nexweşxaneyekê de dike, dest pê kir û got:

- Wek xwişka we ez tiştêkî ji we dixwazim, eger Beşîr pirsî tu çi karî di nexweşxaneyê de dikî, em ê bêjin ku ez di beşa jinan de kar dikim, yanî cihê zayîn mayînê wan tiştan.

Min got:

- Çima?

- Ji bo gava vegere Sûriyeyê, nere nebêje ku karê paqijiyê dike!

Min got: Em ê wêna bêjin, ew rihet e.

Jina min got: Lê tu?

- Çi bi min hatiye?

- Tu di restorantê de kar dikî, gava vegere Sûriyeyê wê bêje tu garson bûyî.

Xwişka min got: Na, ew kar yekcar nabe, divê tu dev jê berdî.

- Lê ez ê çi bikim?

Jina min :

- Ji vî karî derkeve û gava werin, em ê bêjin tu di firmaya Mercedesê de kar dikî û heger bêje: Tu çima naçî kar, em ê bêjin te mehek rihetî stendiye ji bo wî.

Birayê min ê ku reklam û rojname belav dikirin got:

- Yê min ez dev ji karê xwe bernadim, ji ber ku ev demeke dirêj e ez tê de me, heger ez derkevim ez nema karim karekî din bibînim; ji ber ku ez bi ziman nizanîm.

Ya dinî rojê nîvroyê birayê min li min geriya, min jê pirsî: Xêr e tu çima neçûyî kar?

Got: Min dev jê berdaye, jina min dibêje ku Beşîr vegere Sûriyeyê wê bêje ez kaxezan digerinim û xebera wê ye. Lê xwestekeke min ji we heye ez ê êvarî bêjim.

Êvarî em dîsa civiyan da ku em li birayê min guhdarî bikin û şûşeyên ava bigaz di orta me de ne, devê wan girtî bûn tevî ku em her sê ti bûn, lê kesî ji me nika-ribû ew av vexwara.

Birayê min dest pê kir û got: Hûn dizanin ku ez hînî zimanê almanî nebûme, lê xwestekeke min ji we heye. Ev bi çend gotinan dizanim û ez ê xwe hînî çendên din ji bikim; ez ê bavêjim nava gotinê, hûn bi min nekenin. Da ku em bêjin ez wisa hîn bûme. Çêtir e ku vegere Sûriyeyê û bêje hîna ziman nîzane.

Me ew ji qebûl kir û em mehekê sax bê girar, bamî û kutilk jiyan. Li ser tiştik miş-tikên Almanan û li ser ava bigaz, her yekî ji me şeş heft kilo kêr kirin.

Êvarekê em dîsa civiyan û me hin tiştên xwe bi yên din guhertin da ku Beşîr vegere Sûriyeyê nebêje em nehatine guhertin.

Xwişka min pirsî: Ma wê kîjan rojê were?

Min got: Ez ji nîzanim, divê em bipirsin!

Birayê min ê mezin got: Ka telefonê veke û jê bipirse, bê wê kîngê were. Divê em herin cem berber, berî were ji bo ku gava vegere Sûriyeyê nebêje porê wan wek ê me bû!

Min telefon vekir: Ha lawê meta min, em li benda te ne, tu yê kîngê werî?

- Werim ku?

- Almanyayê, ma ne te got ez ê werim Almanyayê?

- Ma hîna tê bîra te, ma ez û Almanyayê. Heqê nanê sibê bi min re nîn e, tu dibêji tu yê werî Almanyayê? Xuya ye hûn hîna kerên berê ne, Almanyayê hûn qet neguhertine.

Min telefon girt û min li wan nihêrî, ew ji pê hesiyan ku tiştêk heye.

Xwişka min pirsî: Çi heye?

- Beşîr li Sûriyeyê dibêje xuya ye ku hûn wek xwe mane û ew qas guhertin li ber çavên wî nayên xuyan.

Xeletiyên der barê Feqiyê Teyran de

Xweşmêr

Feqiyê Teyran helbestên xwe bi nivîskî di dîwanekê de berhev nekiriye û helbestên wî bi zargotinî belav bûne

Ji layê edebiyatnasan ve bi gelemperî hatiye pejirandin ku Feqiyê Teyran stûneke edebiyata kurdi ye. Bi gotinên wxê yên hunerî, edebî, felsefî û ramanî navê xwe yê zêrîn xistiye nav helbestvan û edebiyatvanên nemir. Ev çend sedsal e helbestên wî di nav kurdan de bi gotineke coş û xuroşî, bi dilxweşî û kêfxweşî tînin gotin û dubarekirin. Gotinên wî yên hunerî bûne bingeh ji bo vejîna kurd û kurdayetiye. Kurd bi helbestên wî bi çavekî xweşik temaşeyî sirûşt û jiyanê dikin, bi herikîna avê careke din dikevin raman û dilên kûr, bi awayekî rengîn temaşeyî evîn û evîndaran dikin.

Feqiyê Teyran di edebiyata kurdan de ciyekî gelek girîng hilgirtiye, lê belê bi zanistî baş nehatiye naskirin. Pêwîst e li ser vî helbestvanê hêja û nemir xebat, lêkolîn û lêgerînên zanyarî bînin kirin ku ciyê wî di nav edebiyatê de çiqas girîng e bête zanîn. Edebiyatnas û dîrokknasên edebiyatê gelek xebat li ser Feqî kirine, lê belê di gotinên der barê wî de xeletî û nakokî hene. Lazim e bi xebateke zanistî ev bînin rastkirin.

Xeletiyên der barê wî de tînin gotin bi gelemperî li ser cih û çaxê jîdayikbûn û wêfata wî ne. Ev xeletî jî, ji van sedeman derketine: Feqiyê Teyran helbestên xwe bi nivîskî di dîwanekê de berhev nekiriye û helbestên wî bi zargotinî belav bûne. Ev jî bûye sedema veguhertina helbestên wî. Sedema duyemîn jî ew e ku, edebiyatnasekî der barê wî de dema agahiyek daye yên ku jî wan ew agahî bihiştîye û xwendîye hema pejirandiye û der barê



wan gotinan de lêkolîn û lêgerînên zanistî çenekirine û ew gotin di bin çerxa zaniyariyê de derbas nekirine.

Ebdulah Varli li ser du Feqiyê Teyran disekine û dibêje bi navê Mîr Muhammed serwerê bajarê Makoyê ya girêdayî Kurdistanê Rojhilat, helbestvanek derketîye û mîr bûye û helbest jî nivîsiye. Dibe ku vî mirovî jî wekî Feqiyê Teyran ê ji Muksê, jî

xwe re ev mexles girtibe û bi vî hatibe nasikirin. Ev gotin jî girîng in, lê ya girîng ew e ku mirov helbestên wan jî xwe re bike bingeh û çavkanî da ku ev agahî zelal bibin. Di wan helbest û dîwana ku dibêjin ên Feqiyê Teyran in de mexles û navên ku derbas dibin piranî li ser Feqiyê Teyran ê Muksî ne. Her çendî dibêjin Feqiyê Teyran ê Muksî jî, jî malbata mîr e, lê belê ew bi şexsiyeta helbestvaniyê hatiye pêş. Feqiyê Teyran di helbestên xwe de behsa Makoyê qet nekiriye, di mexlesên wî de jî ev peyv derbas nabe, lê belê peyva Muksî gelek caran di helbestên wî de wekî mexlesa wî derbas dibe:

*Muksî jî eşqê sohtî ye
Ev qewl li şêx nû gotiye
Halê xwe tê da gotiye
Li "xeyn û lama" hicretê*

*Ser çeşmeya feyzê çi ye?
Hate lisanê arîfan
Ew nûreka esmanî ye
Darête qelbê xaîfan
Jê şemeyek da Muksî ye*

Lew bûm nedîtmê taifan

*Avek mehîn im kemter im
Min cerg û dil bûne birîn
Sewda û dîn û ebter im
Pabendê vê nefsa lein
Muksî yê jar û bedtir im
Ferhemnî xeyre rahimîn*

*Qewlê di Muksî sabitin
Hetta qiyamet rabitin
Ew sûlh miselet nabitin
Bi Mushef û bi ayetê*

*Bê hisab Muksî xeber dan
Ji yariya qels û nemerdan
Dê nedamet bê bi serdan
Mîm û Hê bi rûwayetê*

*Muksî dibê avê we bû
Pêxemberan aqil hebû
Qet hewceyî pirsan nebû
Wan dest gîhabû sohbetê*

Ev mexlesên ku di helbestên Feqiyê Teyran de derbas bûne îsbat dikin ku ew ji xelkê Muksê ye. Dîsa li navçeya Muksê gundê Werezozê qebra wî heye û ciyekî pîroz e di nav xelkê vê derê de. Dîsa li gundê Şandîsê ya girêdayî navçeya Hîzanê jî qebrek heye û dibêjin ya Feqiyê Teyran e û her sal li vî gundî li ser navê Feqiyê Teyran mîhrîcan tîdîdarxistin.

Xeletiyeke din ev e ku dibêjin Feqî di sedsala çardehemîn de jiyana xwe borandiye. Edebiyatnasan, bi derxistina hesaba ebcedê, diroka koçî û mîladî tev li hev kirine, yan jî bi veguherîna beyt û çarînên Feqî ev xeletî çêbûye. Di helbestên wî de diyar e ku ew hevçaxê Melayê Cizîrî ye. Dîsa bi derxistina hesabê ebcedê aşîkar e ku Feqî di çerxa 17'an de jiyaye.

Di 'Ansiklopediya Îslamê' de beşa kurd de Mînorskî dibêje; A. Jaba, "Recueil de Notices"ê de behsa neh şairên kurd dike. Yek ji wan Feqiyê Teyran e. Ew di navbera h.707-777'an (m.1302-1375) de li Muksê jiyaye û

li wê derê wefat kiriye. Ev gotin jî layê gelek edebiyatnasan ve hatiye pejirandin û jî gelek re bûye bîngeh. Mehmed Emîn Zekî Beg (Meşahirê Kurd û Kurdistanê) dibêje Feqî xelkê Makoyê ye û di navbeyna 707-777'an (m. 1307-1375) de jiyaye. A. Balî di berhema "Antolojiya Helbestvanên Kurd" de dibêje ku, F. Teyran li hêla Colemêrgê li gundê Muksê hatiye dinê. Di navbera 1302-1375'an de jiyaye. Qanatê Kurdo, di "Tarîxa Edebiyata Kurd" de dibêje Feqiyê Teyran li Muksa welatê Hekariyê, di sala 702 hîcrî (m.1375-76) hatiye dinyayê. Medenî Ayhan, gotinên xwe jî Qanatê Kurdo digire û der barê Feqiyê Teyran de wiha dinivîse: "Feqî, bi edebiyat, welatparêzî û tesewîfiya xwe gelek bandor li ser Ehmedê Xanî hiştiye. Feqiyê Teyran, li Colemêrgê bajaroka "Makose", di sala 1375'an de hatiye dinyayê."

Celîlê Celîl, di 'Keşkûla Kurmancî' de dibêje Feqiyê Teyran hemdemê Melayê Cizîrî ye û di navbera 1590-1660'an de jiyaye. Di nav weşanên Belkî de "Hemû berhemên wî" de tê gotin ku Feqî, di 1590'î de li hêla Colemêrgê, li Miksê çêbûye û di sala 1660'an de wefat kiriye. Kemal Bûrkay di berhema "Kurd û Kurdistan" de dibêje ku Feqî li navçeya Muksê ya girêdayê Colemêrgê hatiye dinyayê. Dîrokên ku der barê Feqî de hatine gotin beyan dikin û weha dibêjin: Hinek dibêjin Feqî di sedsala 14. de (1307-1375), li gorî hinekan jî di sedsala 17. (1590-1660) de jiyaye.

Feqî Huseyn Sagnîç di 'Diroka Wêjeya Kurdî' de, M. Reşîd Irgat, Mele Îsmet Kiliçaslan di xebata 'Ey Avê Av, Şêxê Sen'anî' de ku li ser Feqiyê Teyran çêkêrine, de, di vî mijarê de hemraman in ku diroka jidayikbûn û wefata Feqî zelal nediyar e. Dîsa bi hesabê ebcedê didin nîşan ku Feqiyê Teyran, li Muksê, di navbeyna sedsalên 16-17'an de jiyaye. Ya rast û zanistî jî ew e ku, em delîlên xwe bi gotinên Feqî pêşkêş bikin:

*Gul im di destê xaran
Ismê Muhammed nav im
Bilbil im di gulzaran
Ji îşqê lew zerbav im*

*Di remza mihrdaran
Tu roj ez hetav im*

*Birîndarê îşqê me
Dûr im ji siha bihan
Dizanin medahê kê me
Di hezar û yek û sihan (h. 1130)
Senaxanê Melê me
Li hemû erd û cihan*

*Li "Mîm û Hê" sotî îşqê
Li dehsed û sala sihê (h. 1030)
Mîksî li wî meymestê
Tetwîl diket hikayetê*


Dîsa hinek dibêjin, ew helbesta daneberheva Feqe û Mela di medreseyan de mela û feqîyan li hev aniye û ne ya Feqiyê Teyran û Melayê Cizîrî ye. Lê belê mexles û navên ku di şeşmalikan de derbas dibin didin zanîn ku ev helbest ji aliyê Feqiyê Teyran û Melayê Cizîrî ve hatiye gotin. Ev daneberhev, bi mexlesên wan dest pê dike û bi dawî dibe:

*Feqî:
Selama min heqîrî
Sedefek tevî ku tê kin
Îro ke li Cizîrê
Heq e ku li Melê kin
Hîlak ji derba tîrê*

*Çi derman heyê lê kin
Mela:
Selamên milyaketan
Bêhed û bêhisêb in
Şubhetên avê şetan
Ji Mela li "Mîm" û "Hê" bin
Hîlakên ji zehmetan
Derman ji "Lam" û "Bê" bin*

ÇAVKANÎ:

- 1- Ayhan, Medenî; Kürdistanlı Filozof Ehmedê Xanî, Enqere 1996
- 2- Bali, A.; Antolojiya helbestvanên kurd, weşanên Pelê Sor, Stenbol 1992
- 3- Bürkay, Kemal; Kurd û Kurdistan, derpêç 1, weşanên Deng, Stenbol 1997
- 4- Celilê Celil Keşkûla Kurmancî, Wien 2004
- 5- Cizîrî, Mele Ehmed; Diwan, weşanên Fîrat
- 6- Feqiyê Teyran; Ey Avê Av, Şêxê Senanî, weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê, 1999
- 7- Jiyan, Rênas; Feqiyê Teyran, Hemû Berhemên Wî, weşanên Belkî, Stenbol 2008
- 8- Kurdo, J.; Kürt Kültürünün Kaynakları ve Uygarlıklar Beşiği Kurdistan, weşanên Oz-Ge, Enqere 1993
- 9- Qanatê Kurdo, Tarîxa Edebiyata Kurd, weşanên Oz-Ge, Enqere 1992
- 10- Mehmed Emin Zekî Beg, Meşahirê Kurd û Kurdistanê, weşanên Oz-Ge, Enqere 2005
- 11- Nikitin, Bazil; Kürtler, weşanên Deng, Stenbol 1994
- 12- Sadinî, M. Xalid; Feqiyê Teyran, weşanên Nûbiharê, Stenbol 2009
- 13- Sagnîç, Feqî Huseyn; Diroka Wêjeya Kurdî, weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê, 2002
- 14- Varlî, Ebdullah; "Mela Ehmedê Cizîrî kî ye û di çî gavê da jiyaye?", Nûbihar, hejmar 62



Ma li welatê we ker tune ne?

Ezîz NESÎN

Wergera jî tirkî : Mihemed QOSERÎ

Ji kerema xwe re tenê vêya jî jê bipirse û hew. Min meraq kir, gelo ma qey li welatê wan ker tune ne?

Mîna ku diranê wî biêşin destekî xwe danîbû ser hinaroka rûyê xwe û serê xwe geh bi vê hêlê ve û geh bi wê hêlê ve li ba dikir. Ji aliyekî ve destê wî li ser lamê wî, ji aliyê din ve jî hey digot;

- Em hetikîn, hewarê em hetikîn!...

Bi rastî ew mirovekî pir kubar bû. Lê ez bi hatina wî ya hundir ku bi xwe ketî û berî silavekê bidî dest bi van gotinan kiriye, pir matmayî bûbûm.

- Hûn bi xêr hatin, kerem biken. Ez tika dikim li ser vê kursiyê rûnên.

- Em hetikîn, bi sosretî em hetikîn!

- Hûn çawan in?

- Ma hîn em ê çawa bin, ma çawabûn tê de maye? Em hetikîn. Wax, wax ,wax!

Min got belkî karesatek bi ser wî de, bi ser malbata wî de hatibe.

- Em ketin bin erdê, şerefa me daket du pereyan. Em bûn mirovên ku bi du pereyan jî nekin.

- Xêr e, çima ma çi qewimiye?

- Ma hîn wê çi biqewime, kerê kurmî ya qert bi duhezar û pêncsed lîreyî firotin mêrik.

Min xwe hinekî bi paş de vekişand û bala xwe da wechê wî. Gelo ew şet bûye, çi ye! Hewce nedikir ku ez tîrsa xwe veşêrim. Ji bo bibe boneya hatina hevjinê min a vê derê min got;

- Gelo hûn qahweyekê venaxwin?

- Dev ji qehwe mehweyê berdî anîha. Em hetikîn. Ma çawa kereke qert, kurmî û tew bê nal duhezar û pêncsed lîreyî dike?

- Weleh qet ne min ker firotinê û ne jî min kirîne. Tu fikra min di der heqê vê mijarê de tune ye.

- Lo yabo, ma tu ez jî ne bazirganê keranî im, lê ez pê dizanim ku kerek qet duhezar û pêncsed lîreyî nake.

- Tu hinek tengezar xuya dikî.

- Ê jixwe ez tengezar im, ma ku ez ne tengezar bim wê kî tengezar be. Qet we heta niha dîtiye ku kerek bi duhezar û pêncsed lîreyî hatibe firotin?

- Welehîn ev nêzî bîst salan e ku min qet ker neditine.

- Ez ji we pîrsa gelo kerek bi duhezar û pêncsed lîreyî dike yan nake dikim.

- Ê ma bi Xwedê ez nîzanim bê ka ez ê çi bibêjim. De li gor marîfetên kerê ne. Belkî jî bike.

- Çi marîfet û çi hal ezbenî! Ker e. Ma tu ranabe ji me re qûretîyan nake, gotara nabêje. Tevahiya wê kerek e. Kerekî jî rêzê ye. Tew bi ser halan de qert û kurmî ye. Aha ew ker bi duhezar û pêncsed lîreyî firotin mêrik. Lê ya herî sosret çi ye hûn pê dizanin, di vê firotinê de min navbertî kir.

- Waaa! Tu çawa ketî vê teşqeleşê?

- Jixwe hatina min î vir jî ber vê ye. Ez ê her tiştî jî te re bibêjim. Tê bîra te, gava ku welatê Amerîka em vexwendibûn û li ser nave Zanîngeha Stenbolê ez û hevjinê xwe em çûbûn Amerîkayê û em salekê li wir mabûn. Tu bi wê meseleyê dizanî?

- Erê, ez dizanim.

- Îcar li wir hevnasîna me bi profesorekî re çebû û em bûn dostên hevdu. Li Amerîkayê gelek alîkarî bi me re kir û qenciya wî pir giha me. Piştî em vegerîyan welêt jî têkiliyên me qut nebûn. Me bi nameyan li hev dipirsî. Zilamekî ku ji tirkan pir hez dikir bû. Xwe wek hogirê tirkan dihesiband. Dîsa rojekê nameyeke wî gihîşt destê min. Di wê nameyê de qala hevaleyê xwe dikir û jî bo hevalê xwe daxwaziyek ji min dikir. Ev hevalê wî pisporê xaliyên entîke bû. Li gor ku dostê min digot, wê vî pisporî li ser xaliyan pirtûkek binivisanda û jî bo pirtûka xwe berbihev bîne li rojhilat, di mijara xwe de hin lêkolîn dikirin. Di wextekî nêz de wê bihata

Tirkiyeyê jî. Dostê min î amerîkî dixwest ku ez bi vî hevalê wî re pêwendidar bibim.

Min jî di bersiva xwe de gotî heger ew hevalê pispor di wextê betlaneyên zanîngehan de were Tirkiyeyê, ez ê hîn bêhtir pê re pêwendidar bibim û ez ê bi hatina wî pir kêfxweş jî bibim. Li gora ku dostê min ez agahdar kirim ji xwe hevalê wî, berî ku bihata welatê me, wê biçûya Hindê, ji wir jî wê biçûya Îranê û li wan deran wê hinek lêkolîn û hûrnêrîn pêk bianiya; piştî jî wê bihata Tirkiyeyê. Ew hatina wî jî li wextê betlaneyê rast dihat û ji bo min jî wextekî di cî de bû.

Welhasil pisporê xaliyan di meha tîrmehê de hat Tirkiyeyê. Berî ku bê jî ji hevalê min telefon û navnişana min stendibû. Rojekê telefoni min kir û navê otela ku lê dima da min. Min jî wext berî wext û bi lezgînî xwe gihand otelê. Çawa ez çav li mêvanê xwe ketim, jîritiya wî bala min kişand. Ev amerîkiyê ku bi eslê xwe elman bû min wisa texmîn kir ku cihû be. Belkî berê cihûyekî elmanî bû lê dûre bûbe amerîkî.

Mêvanê min ji cihen ku berê lê geriyabû çar baholên tije xalî, merş, cacim û têrik bi xwe re anîbûn. Baholên xwe vekirin û entîkeyên xwe pêş min kirin. Ew perçeyên pir giranbiha bûn. Ji berhevkirina van entîkeyên xwe pir kêfxweş xuya dikir. Bi taybetî perçeyek xalî pêş min kir ku tevahiya wê perçexaliyê sê çar bihost pan û neh deh bihost jî dirêj bû. Digot min ev perçexalî ji gundiyeke îranî bi dolarekî kiriye lê gava ez bifiroşim wê nêzî sî hezar dolarî bike. Bi ser halan de wî rebenê gundî ji kêfa dolarekî ku ghiştibû destê wî ji mêrikê me re dua jî kiribû.

Min jî meraq kir bê ka ev kevneperçeya hanê çima ew qas biha bû. “Çimkî” got, “di her santîmetrekareyeke vê xaliyê de heştê girê hene. Loma ev xalî dibe şahesereke bêhempa.” Her ku qala lekolinên xwe û bi-destxistiyên xwe dikir, coşa wî di dilê wî de hilnedihat, difûriya derve. Digot heta niha jî vê xaliyê hûr hûnandîtir tenê min xaliyek di-tye. Ew jî di santîmetrekareyekê de sed girê hebûn û nizanîm li kîjan muzeyê bû.

Dûre perçeyek kulav pêş min kir û bi ke-

nekî fenek got; “Min ev jî bi pêncî sentî kirî. Ez îro bifiroşim wê bi kêmasî bi pênc hezar dolarî here.”

“Tu çawa dikarî van tiştên giranbiha wisa bi erzani bikirî?”

“Ê ev çil sal in ku ez bi vî karî ve mijûl im. Li gor xwe yê me jî hinek şewazên me hene.”

Piştî van gotinan jî qala hin şewazen xwe kir, lê devê min bihostekê ji hev çû. Pêre behsa hin xebatên xwe kir. Li ser mijara xaliyan sê pirtûk nivîsibû, albûmek çekiribû û ji çend koleksiyonên cihanê ê li ser xaliyan yek jê ya wî bû.

Welhasil ji bo lêkolîna mevanê min em bi hev re derketin gera Enetoliyê. Bajar bi bajar, navçe bi navçe... Li camiyan wêneyên xaliyan, merşan, caciman dikişand, li kaxizan tiştin dinivîsî, ji gundiyan têr, xalî, kulavin dikirin. Li gor ku digot ev tiştên kirîne, li berê Çînê, Hindê, Efganîstanê, Îranê ne tiştêk bûn. “Bi rastî li Tirkiyeyê xaliyên pir giranbiha hene lê hîna em li wan rast nehatine.” Digot di ber re.

Di gera xwe de em hatin herêmeke arkeolojîk. Li ve herêmê kolanên arkeolojîk bi rêvebirina du komîteyan pêk dihatin. Komîteyek a amerîkiyan bû, komîteya din jî ya elmanan bû. Sererd û binerd li hev qulaptibûn. Gir û berî tevde di moxilan re derbas kiribûn.

Di van kolanên de ne yek û dudu, lê bêhtirî pênc, şeş xopanên bajaran derketibûn ser rûyê erdê. Dîroka xopanên wan şarezayiyên ku bi ser hev de kumîşîne, ji roja me dihere heta berî Îsa bi deh sedsalan.

Gundiyan van derdorên jî ji ber hatina turistên zêde hema çî ji bin erdê derdixistin, difrotin turîstan. Zarokên biçûk li ser rîya rêz dibûn û çî ji erdê derxistibin, cîncoq bin, kevirê nivîskî bin, perçeyê şerbikan bin tevde mîna pêşengehekê li ber xwe datanîn û li benda turîstan diman. Li gora xwe bi wan re diketin tîkiliyan. “Van dalir!”, “Tû dalir!”...

Min jî xwe bi xwe gotî hey ez hatime van deran, ji bo bîranîna vê derê ez jî tiştêkî bikirim. Ji dûr ve min keçîkek û li kêleka wê jî kurîkekî biçûk dît ku li ber xwe tiştin danîbûn. Ez ber bi wan ve meşiyam. Min ni-

herî di destê keçika biçûk de destikeke wazoyeke kevn hebû, di destê kurik de jî kevirêkî şîn î biçûk hebû. Kevirê biçûk di şikle qafê mirovan de bû. Bala min kişand. Ez fikirîm ku ev kevir di hungilîskekê de dibe ku bi kar bê. Ez hêdika ber bi wan ve daqûl hatim û bi dengêkî şêrîn min ji lawikê biçûk pirsî;

- Ji bo vî kevirî tu çiqas pere dixwazî lawikê delal?

Keçikê beriya lawik xwe avêt nav gotinan û ji bo destik çil lîre xwest. Lawik jî ji bo kevirê xwe pazdeh lîre xwest. Bi rastî ne ji bo ku min jê fêhm dikir, lê bele ji bona ku ez kevir hinekî bi erzani bikirim min gotê;

- Biha ne.

Zarokan, mîna profesoran der heqê alavên xwe de gotin li du hev rêz kirin.

Bavê wan bi rojan erd kolabûn, piştî nîzanim çiqas zehmet û betilînê encex ev bi dest xistibûn. Ev bermayiyên bi rûmet bi hêsanî bi destê kesî nediketin û wekî din û wekî din...

Rabû min biryara kirîna kevirê şîn da û min dest avêt berîka xwe. Beriya ku ez pereyan derxim pisporê rêhevalê min zû bi zû jî min re got ku tu hêjahiya van bermahiyên dirokî û yên arkeolojîk tune ye. Bûyerên bi vî awayî, nexasim li hêlên rojhilat gelek caran bi serê wî de hatibûn.

"Gundiye fenek bi hostetiyêke hunerî bermayiyên kevn texlîdîkin, wan qederekî di bin axê de dihêlin û gava ku derdixin ser rûyê erdê arkeologên herî bi nav û deng jî carna pê dernaxin ku ew sexte ne û pê dixapin. Gelek caran jî bi pereyên zêde wan bermayiyên sexte dikirin."

Em rabûn li jîpa xwe yî ku me kirê kiribû siwar bûn û em bi rîya xwe de çûn. Di kelekela wê havînê de em qederekê çûn û li cihêkî, di biniya rê de me sê çar darên berû ditin. Li nêzî daran jî bireke avê hebû. Bi niyeta ku him em li bin siya van daran hinekî xwe rihet bikin û him jî firavîna xwe bixwin, ajokarê me wesayita me ajot kêleka dara pêşîn. Li bin siya dareke din jî gundiyeke navsale bi kêf û mestbûyî xwe vezelandibû. Ji gundî bi çend gavan bi pêş de jî kerê wî ketibû ser gihayê ku li ber tîrêjen roja ha-

vînê hişkbûyî û bi heweseke mezin diçêriya.

Em ji wesayita xwe peya bûn, ji ber xirepişa me gundiye xilmaş bi me hesiya û serê xwe rakir; li hêla me nihêrî. Me silav lê kir û em çûn li kêleka wî rûniştin. Me bi gundî re dest bi sohbetê kir. Di sohbetê me de gava ku gundî û amerîkî bi hev re diaxivîn, wergerên wan min dikirin.

- Gelo li van der doran gundî çî çandiniyê dikin xalo?

Gundiye ku hîn xewa xwe ji çavên xwe neavêtibû got;

- Qet tu çandiniyê nakin? Berê çandiniyê pir bû lê ji gava ku ev erd hatin kolandin û pê ve ev nêzî bîst salan e ku tu çandiniyê li van deran nabe. Hemû gundî zexel bûne.

Amerîkî;

- Rast e, li wan cihên din jî eynî wisa ye.

Min jî zîlamê gundî pirsî;

- Ê ka ev gundiye derdorê debara xwe bi çî awayî dikin?

- Mîna ku bûbe modayek her kes erdê di-kole û ferşîk merşîkan, qalîkan, kevirên rengî û tiştên mîna wan jî bin erdê derdixin. Ev tişt bi rastî xezîneyên welatê me ne lê ev gundî bi xayintî vê sermayeya ku ya me hemûyan e diherin bi pereyên pir kêr difiroşin ecnebiyan. Bi rastî gava ku ev bermayî bi pereyên ku heq dikirin hatibûna firotin, wê aniha ne Tirkiyeyek lê wê deh Tirkiyeyên din di destê me de bûna. Ev ecnebi kî ne gelo! Hemû diz in. Entîkeyên me yên bin axê tevde derxistin, bi dizî revandin birin welatên xwe û bi xêra wan xezîneyan jî xwe re bajarên bêserî û bêbinî ava kirin. Hinekan jî wan axa me bi xwe kolan û bermayiyên me birin, hinekan jî ji gundiyan bi pereyên pir kêr, bêje hema belaş kirin û birin.

Amerîkî;

- Rast e, li wan cihên din jî eynî wisan e.

- Êdî tu gûyê ku ji bin axê derkeve nemaye. Heger ku hebe ji guh nedê. Hikûmet hişyar bûye, êdî tu kes nikare tiştêkî bir-evîne. Dîsa jî diziyêke ecnebiyan hebe wê ji hikûmetê bidizin, kirînek wan jî hebe ji hikûmetê dikirin. Hikûmet jî bihayê wan î he-qîqî distîne.

Amerîkî;

- Rast e, li wan cihên din jî eynî wisan e.

- Ê madem ku rewş wisa ye, ka gundî debara xwe bi çi awayî dikin?

- Li vê herêmê şeş gundên me hene. Aniha ji van gundan tu herî kîjan malê tu yê bibînî ku xanî şût û rût in.

- Çima, ji ber çi?

- Ma wê ji ber çi be! Alavên xwe difiroşin turîstan. Tevahiya gundiyan alavên malên xwe gişî dixin bin axê, zingarî dikin û bi entîketî difiroşin. Pereyên hesin, şerbik, kevirên minhândî, kevirên rengîn, hema çi tê ber wan dixin bin axê. Qet li van derdoran fedî nemaye. Berî bi çend rojan dîsa weke îro min kerê xwe anîbû li bin daran tewilandibû û ez jî ji xwe re veketibûm. Derbekê min nihêrî ku du sê zarok li dora kerê min diçûn û dihatin. Ez ber bi wan ve çûm, min nihêrî ku lawikekî ji wan destê xwe avêtiye moriyên kerê min ku ji hefsêr biqetîne. Ez li wan qêriyam û min bi ber wan de baz da, ji tîrsa lêdanê her yek bi cihekî ve revîyan. De îcar morîk bi dest xistibûna wê ew jî bixistina bin erdê û wê moriyên kerê min jî bibûna entîke! Jixwe berê jî nalê kerê min dizibûn û xistibûn bin erdê. Dûre min bihist ku nalê kerê bi madalyontî di stûyê turîstekî re kiribûn.

Amerîkî;

- Ne min ji we re gotibû, mîna wan cihên din. Li wan cihên din jî eynî wisa bû.

- Ê xalo, ka tu bi çi awayî debara xwe dikî?

- Lawo, ma ez ê bi çi debara xwe bikim. Ez ji xwe re keran dikirim û difroşim.

Piştî ku gotinên xwe yê dawîn qedandin, çû kêleka birê û ji bo kerê xwe bi dewlê hinek av ji birê kişand û bera hewdikê ber birê da. Hefsarê kerê kişand ser hewdik, kerê ku çav li avê ket hema serê xwe ber jêr kir, devê xwe xist ava hewd û bi qurtequrt av ji hewdik kişand zikê xwe. Pîspore Amerîkî çawa çav li kerê ku av vedixwar ket, ji cihê xwe pengizî û çû ber serê kerê gundiye me. Sohbeta min û gundî jî her ku diçû kûrtir dibû.

- Xalo ma gelo bazirganiya keran têra debara te dike?

- Şikîr jî dana Xwedê re. Ev pênc sal in ku ez debara xwe bi vî karî dikim.

- Mesele mehê çiqas pere digihîje destê te?

- Qet ne diyar e, li gor kerê ku di bazarê de be diguhere

- Tu kerekê bi kêmasî di çiqas wextî de difiroşî?

- Bi Xwedê qet diyar nabe, carinan tu di sê çar mehan de nikarî kerekê bifiroşe, carinan jî tu dinihêrî ku di rojekê de te sê çar ker firotine.

Amerîkî bi heyecan hat ba me û ji min re bi dengêkî qels got,

- Ew xaliya li ser piştê kerê bala te kişand?

Ji ber ku em bi îngilîzî bi hev re dipeyivîn, gundî tu tişt ji me fam nedikir. Min bala xwe da kerê, zîvarek xaliyan bi ser piştê kerê werkiribû.

- Tu ji vî zîvarê li ser piştê kerê re dibêjî?

- Belê, lê ew zîvarê ku tu naecibîne şaheserek e. Wisa lê nenihêre. Ji gava din ve ez li ser wê perçexaliyê hûrnêrinan dikim. Bi reng, kardestî û desenên xwe mucîzeyek e. Di her santîmetrekareya wê de bi temamî sed û bîst girê hene. Li ser rûyê cîhanê tişteki wisa tune, tişteki bêhempa ye.

- Tu yê wê bikirî?

- Belê, lê divê ku gundî fam neke ku em ê xaliyê bikin. Ez bi rihê vana dizanim. Zîvarekî gemarî ku niyeta xwe lê anîbin wê biavêjin ser sergo, gava ku mirov bibêje de ka wê navêje û bifiroşe min ew bihayekî giran ji bo wî paçî dixwazin û ji nû ve lê xwedî derdikevin. Dibêjin li gor ku tu dixwazî bikirî, nexwe ev zîvar tişteki bi qîmet e. Paşê tu çiqas pere bidî wan jî dîsa çavên wan têr nabin, bihayê wê her ku diçe zêde dikin. Ji ber vî hawî divê em gundî hişyar nekin.

Di wê navberê de gundî li me qêriya û got,

- Xêr e yabo, ma ew gawir bi pistepist çi ji te re dibêje, hûn çi ji hev re dibêjin bi dizîka?

- Na ne tu mesele ye. Dibêje kêfa min gelekî ji van deran re hatiye.

- Ma kêfa wî ji çiyî van deran re hatiye? Tevde tahtik û kaşîk in, ne gulpek av heye û ne jî şênahiyek heye. Giha bi zorê li van deran şên tê.

Amerîkî, li min vegeriya û got,

- Tê bîra te, min gotibû di rewşên bi vî awayî de hinek şewazên min hene. Binihêrin ez ê a niha ji van şewazan yekê bi kar binim.

- Çawa?

- Em li xaliyê xwedî dernakevin, em ê kerê bikin û bi kirîna kerê re wê xalî bi destê me bikeve. Jixwe ji ber ku ev gundî nîzane ku xalî çiqasî giranbiha ye wê vê kevneperçeya xaliyê jî li ser piştê kerê bihêle. Em ê jî bi hevsarê kerê xwe bigirin û bimeşin. Hinekî li pêş em ê xaliya xwe rahêjin û kerê bi çole de berdin. A niha ji kerema xwe re ji gundî re bibêje ku em dixwazin vê kerê bikin.

Ez li gundî vegeriyam û min jê pirsî,

- Xalo te digot ez keran difiroşim, ne wisa?

- Belê, ez keran difiroşim.

- Ê mesele ev kerê hanê, gelo wê çiqas pere bike?

- Li gor kesê ku bikire diguhere.

- Ê heger ku em ê kirîna bin tu yê ji me re bi çî bihesibî?

Gundî kenîya,

- Ma hûn qeşmeriyên xwe bi min dikin. Mîrzayên mîna we wê çî bikin ji vî kerê kurmî?

- Ê qey pêdivîyeke me pê heye ma tu yê çî bikî ji karê me. Em dixwazin vê kerê bikin. Tu çiqas pere dixwazî, tu wê bibêje.

- Ne min gotibû li gor kesê ku bikire diguhere. Tu yê kerê bikirî yan ew ê gawir?

- Ew ê bikire.

- Ew ji kîjan mîletî ye?

- Amerîkî ye.

- Hiiiii, ne xerîb e! Ew jî ji me tê hesêb. Ê kuro jê re bibêje ma vî kerê qert û kurmî wê ji çiyî wî re bibe. Ev ker jê re nabe.

Min gotinên gundî tev ji amerîkî re gotin.

- Baş e, baş e. Nexwe ew ê kerê bi erzani bide me.

Ez li gundî vegeriyam,

- Bila qert be, ew pê qayil e.

- Weleh dilê min rihet nabe. Wê li hemberî wî eybeke mezin çêbibe. Piştî ku here welatê xwe wê bibêje tirkan ez xapandim. Ev jî tiştêkî pir ne xweş e haaa!

Min ev gotin jî ji yê amerîkî re gotin.

- Ev gundiyê tirk dilsaf e û mirovekî pir durist e. Li cihekî din bûya av li min venedixwarin û wê kerên xwe li hewa bifirostina min. Kêfa min pir ji vî mîrikî re hat weleh, ez ê jî perê wî zêdetir bidimê.

Ez li gundî vegeriyam,

- Belê, min her tişt ji amerîkî re got. Lê ew dibêje ez pê qayil im, ew dixwaze ku kerê bikire.

Binihêrin, berî ku ev ker bigihîje Amerîkayê wê di rê bimire. Haya we jê hebe, her aliyê wê ji kurmîbûnan felişîye.

- Teew tew! Yabo nîzanim bê çî bi serê te ketiye looo! Ez dibêjim mîrik bi her tiştî qayil e, wê bikire û hema hey tu gotinê dirêj dikî, Xwedê ji te razî.

- Kuro bi Xwedê ez jî şaş bûme wî. Ma ev mîratê kerê ne mê ye jî ku em bibêjin ji karêkî wî re bibe. Gelo çima ewqas bi dû vî kerê kurmî ketiye?

- Ê çî ji te re? Ma tu çî dikarî gotinan dirêj bikî. Tu ji xwe re li pereyên xwe binihêre. De ka bibêje, tu ji bo kerê xwe çiqasî dixwazî?

Gundî hinekî fikirî,

- Ji kerema xwe re tenê vêya jî jê bipirse û hew. Min meraq kir, gelo ma qey li welatê wan ker tune ne.

- Gundî dipirse, gelo ma li welatê we ker tune ne?

Amerîkî piştî ku hinekî fikirî got,

- Belê, hene. Lê kerê bi vî awayî tune ne.

Min ev gotin jî ji gundî re wergerandin. Gundî got,

- Hiiiii....Yanî ew kerên li Amerîkayê naecibîne, lê kerên tirkan dicibîne. Bi rastî jî ev tiştêkî pir balkêş e. Ê ma ka ez çî bibejim. Min kêmasiyên kerê xwe tevde ji we re gotin. Ma tu em nikarin ji bo kerekî qert û kurmî dilê vî mêvane xwe yê birûmet bihêlin. De ka em bifiroşin, soxî! Ez çawa bikim, em ji destê we xelas nebûn.

- Bi çiqasî ye?

- Sîrf ji bo we bila bi deh hezarî be.

- Çiiiii! Ma tu din bûyî? Îro bi wî pereyî hespa kihêl a herî beza tê kirîn.

- Ê yabo wê çaxê herin ji xwe re hespa kihêl a herî beza bikin. Ma çima hûn bi dû vî kerê kurmî ketine, hûn ê çî bikin ji kerê?

Gava ku min ji amerîkî re got ku daxwaza

gundî deh hezar lîre ye, hindik mabû çavên wî jî serê wî bazdana.

- Ne min jî te re gotibû, ev tevde wisan in. A niha ew xwe bi xwe dibêje kerametekî kerê min heye ku ev amerîkî dixwaze bikire, loma ew pereyan zêde dixwaze. Tu bawer bikî heger me xalî bixwesta ew ê wê çaxê jî bo xaliyê sed hezar lîre bixwesta.

- Ez karim a niha deh hezar lîreyî bidimê lê wê çaxê wê dîsa bibêje na û îcar wê pêncî hezarî bixwaze. Ji ber wê divê em bi gundî re bazara kerê bikin.

Min jî gundî re got,

- Xalo tu bi qedrê Xwedê kî tu yê rast bibêjî, te ev ker bi çi kiriye?

- Weleh ê min derew li ba min tune ne. Binihêre ez bi destnimêj im jî, nabe ku ez derewan bikim. Çermên van kerên pîr jî bo çaroxan tîn bikaranîn. Min jî ev ker jî bo çermê wî, bi pênc lîreyî kirî.

- Weee! Ma wijdanê xwe bispêre Xwedê xalo, ev kerê ku te bi pênc lîreyî kiriye tu çawa deh hezar lîreyî dixwazî? Ma çawa bû, çi qewimî...

- Ê bavê min hêrs nebe, ma tu me kerê xwe dernexistibû bazarê. Ez jî xwe re li ber siya vê darê raketibûm, hûn hatin û we xwe xist tora kerê min. Tu ez ne yê firotinê bûm, hûn ê kirinê bûn. We got ilim ka vî kerî bifiroşe me. Min got ker kurmî ye we got ser çavan, min got ker qert e, we got ser seran. Min çi kêmasiyên kerê xwe gotin, we got em qebûl dikin. Haa, berî ku ez jî bîr bikim. Lingekî kerê min seqet e, gava ku dimeşe di-kule.

- Bila be.

- Te dît. Nexwe li gor ku hûn hîn jî wî dixwazin, kerametekî ku ez pê nizamî di kerê min de heye. Yan na ev gawirê amerîkî wê çi bike jî vî kerê kurmî, ma ne wisa ye? Na, nabe. Qet jî deh hezarî kêmtir qurîşek jî nabe.

Min jî yê amerîkî re got,

- Nade qet jî deh hezarî qurîşekî jî kêmtir nake. Ka em deh hezaran bidinê û bila here.

Me du saetan li ber hev da. Mêrik jî bazara xwe qet daneket. Di navberekê de em mîna ku me dev jî kirîna kerê berdabe em jî ba mêrik çûn. Tew ne xema mêrik bû, ji cihê

xwe jî neliviya. Em dîsa lê vegeyriyan. Bi ken li me nihêrî û got,

- Min zanibû ku hûn ê paşve vegeyin.

- Na lo! Te çawa zanibû?

- Ma mirov kerekî wisa erzan zêv kiribe, mirovê çawa wî jî dest berde. We jî ev kerê erzan jî xwe re ditiye...

Bi niyeta ku em kerê li cihekî ku ne li ber çav be berdin, min çû jî ajokarê jîpê re got "Wesayîtê hinekî bi pêş de bajo û li wir li benda me bisekine"

Welhasil bi serêşekê me û xwediyê kerê dawîya dawîn li ser duhezar û pêncsed lîreyî li hev kir. Her çiqas tinaz kirin jî, dîsa qebûl kir. Me pereyên wî dan destê wî û pereyê xwe hejmart. Belê, bi temamî duhezar û pêncsed lîre bûn.

Gundiyê me rişma kerê da destê pisporê amerîkî û got,

- De li ser xêrê be û hûn hezar xêrî jî kerê xwe bibînin.

Piştî xêrxwestinê rahişt xaliya jî ser piştî kerê avêt ser stûyê xwe, paşê xwe da me û hêdî hêdî meşiya. Di ber xwe de jî digot,

- Bi rastî kerê me bi erzanî çû lê de xêrê jê bibînin.

Çav li serê amerîkî şaşo maşo bûn. Çavên rebenko man li ser xaliya ku li ser milên gundî. Ê îcar wê çawa bibe, em ê çi xweliyê li serê xwe kin!

Li min nihêrî û got,

- Binihêre, em wî hişyar nekin. Em hêdî hêdî hinekî ber bi wesayîtê ve bimeşin û dûre em li mêrik vegeyin. Tu jî mêrik re bibêje "Kerê me jî sermana dilerize, wisa bimîne wê bimire. Bi xêra xwe wî zîvarî dîsa bi ser piştî kerê wer ke jî bo ku ker hinekî germ bibe û nexweş nekeve." Lê bele divê gundî fam neke ku em li dû xaliyê ne.

Me bi rişma kerê xwe girt û em hêdî hêdî meşiyên. Ez dibêjim meş lê çi meş û çi hal, qaşo meş bû. Mevanê min jî paş ve ker di-dehfand, min jî jî pêş ve rişme dikişand lê kerê me dîsa di xwe re nedidît ku gavekê biavêje. Pişt li me şikest. Me ew xaliya hanê jî deste gundî derxista wekî din bi cehenema kerê kirî, me yê ew li wir bihişt. Axir vir de wê de bi zorê em deh pazdeh gava çûn. Derbekê me nihêrî ku gundiyê me çawa bi lez

ber bi me ve tê,

- Bisekinin, bisekinin we çika xwe ji bîr kiriye.

Me got wa ye mêrik xaliyê ji me re tîne. Ji kêfan hindik mabû em di cih de bifiriyana. Mêrik bi bez kaşikekî biçûk qulapt û xwe gihand me,

— Kuro ma we singê kerê ji bîr kiriye wî! Ka ma wî feqîrê Xwedê wê wî kerî bibe heta Amerîkayê, tu nabêjî wê rîşma kerê xwe bi çi ve girêde; wê çawa kerê bitewilîne? Binihêrin, xuya ye ku hûn di karê kirîna keran de ecemî ne ha...

Me singê kerê xwe ji destê gundî girt, amerîkî bi telaş ji min re got,

- A niha tam wextê wê ye. De a niha xaliyê jê bixwaze.

Min ji gundî re got,

- Ev ker ji sermana dilerize, wisa bimîne wê bimire. Heyfa we, ji kerema xwe re wî zîvarî disa bi ser piştê kerê wer ke bila piştê kerê hinekî germ bibe; xêra te ye.

- Naa, we tenê ker ji min kirî. Ev zîvar ne di bazarê de bû.

- Ê belê, me tenê ker kirî lê ker hinekî cemidiye. Jixwe tiştêkî kevnare ye û ji tu karê te re jî nabe. Tu yê a niha herî wî biavêjî ser sergo.

- Raste zîvarekî gemarî ye, kevn e lê ez nikarim wî bidim we.

- Çima?

- Ez nikarim bidim ezbenî, ew diyariya bav û kalan e ku maye di destê min de. Ma diyariya bav û kalan tê avêtin? Ez nikarim bidim.

Min ji amerîkî re got, "Nade, dibêje ew diyariya bav û kalan e." Amerîkî got, "Hela bîrse bê wî zîvarê kevn wê ji çi karê wî re bibe."

- Ma bi rastî jî wê ev zîvarê kevn ji çi karê te re bibe xalo?

Wechê gundî ji nişka ve cidî bû û got,

- Îcar ji çi karê te re bibe jî çi ye, ez ê a niha herim kerekî kurmî yê din bikirim û ez ê wê cilikê bavêjim ser piştê wî. Heger di qismetê min de hebe wê kesên din ên mîna we ku ji kerên kurmî hez dikin li min rast bîn û wê ew jî bixwazin ku kerê min bikin. Bi îzna Xwedê dibe ku ez wî kerî ji bifiroşim. Ev cilik

qismetê min vedike. Wa ye bi ser kerê de min singê tewlê jî belaş da we, ma tu me jî bo sing pere mere xwestin, na!

- Rast e hey te jî bo sing tu pere nexwestine, lê jî bo wî zîvarî tu pereyan nexwazî jî, heger bi zorê jî mabe em ê çend qurîşan bidin te. Bila him dilê me rihet be û him jî kerê me jî sermayê bê parastin.

- Heyran ê we hûn dixwazin ku ava ka niya min bimiçiqînin. Gava ku ev cilik ji destê min here ka piştê ez ê kerên xwe bi çi awayî bifiroşim, ev pênc sal in ku ez kerên qert û kurmî bi xêra wê cilikê difiroşim. Cilik ji min re sermiyanek e. Êdî hûn bi oxira xwe de herin û sed xêrî jî kerê xwe bibînin.

Van gotinên gundî yên dawîn serî li amerîkî geş kirin. Wê çaxê ez tirsîyam ku dil milê wî bisekine û li wan deran bi rehma Xwedê şa bibe. Hema min bi milê wî girt.

Gundî kera xwe firotibû, êdî jî bo wî wextê çûyinê bû. Piştî çend gavan sekinî û li me vegeyriya, bi wechekî devliken got,

- Bi baweriya min hûn ê kerê hinekî bi pêş ve bibin û hûn ê wî li wan deran bi çolê de berdin. Ê hema ne xwe bibetilînin û ne jî bila dûre ez bibetilim, ya çê ew e ku hûn kerê di cih de bihêlin.

Me eynî wisa kir û me kerê xwe yê kurmî di cihê cih de hişt û em ber bi jîpa xwe ve meşîyan.

Amerîkî bi dengêkî qels û bêhal diaxivî,

- Heta îro, berî ku em li wî gundiye hanê rast werin ez li hemû cihan tiştê mîna hevdu dihatin serê min. Ewil rewşê wek cihên din xuya dikir, lê li tu cihê din mîna îro bi dawî nebûbû. Li cihê din tiştêkî wisa tune bû.

Em li jîpê siwar bûn. Singê hesinî ku xe-lekek bi serî ve zeliqandibû hîna jî di destê wî de bû.

- Ka hûnê çi bikin jî wî singî, we çima ew neavêt?

- Ji bo bîranîna îro min ew neavêt. Ez ê bi xwe re bibim Amerîkayê û ez ê di koleksiyona xwe de bi cih bikim. Ma me duhezar û pêncsed lîre tê de daye. Ji avê jî erzantir e.

- Em hetikîn, li hemberî alemê em hetikîn!...

Gava ku digot "em hetikîn" di ber re jî bi tepan li serê xwe dixist.

Pênc helbest ji dîwana *Pelên Reş*

Kawa NEMIR

Goristana Henderan

Bi bahoz û baranên kesk hatiye şûştin,
Asît kun dikin kilox û hestiyên berxwedêr,
Ev in, pîrî wan ew, hêkên nederizî kuştin
Û niha ref bi ref rabûne dîwana mikurdêr.

Derewên kuj in ev kêliknameyên gewr tev,
Dadihelin bi ser kurmên ketî govendê de,
Kujên qelandî nûkên xaran, jehra maran her şev
Û niha bi kefa dev, dev vekirî pê de pê de.

Hatibin, hatine tevî heyvik, zengil û mezmûran,
Li cejn û şahiya Mirinê rûniştî, goşt-xurên çilek,
Termên erjeng, neşên geş bikin kulîlkan mîna ariyan
Û niha sef bi sef bûne xurê heriyê, hê didêrin lek bi lek.
Pêk ve sêwî mane nîfşên bextewar î şikencehez,
“Korahiya çavan, par van çaxan Bavo hebû!”
Kêr û qinareyên li malê betal disûn, dikine cihêz
Û niha bi reverev, kî bi ser siya min bikeve, ew berbû.

2 Adar 2009 Bahçelievler - Stenbol

Malavayî li Cegerxwîn

Lo Cegerxwîn, dîsa jî mala te ava,
Sedsalek bû, bi xîst û gopal, ro li ava;
Wê dûv biketa cemedê, neçûma “ode”yê,
Min ê çawa serkut bikira seyê ku direyê?

27 Rezber 2009 / B.evler - Stenbol

Requiem li ser Takarof

Kurdistana ku Hesarî bi saz û awaz kir,
Kevirno, kuçno, ev nexşeya qelişî di bextê we de,
Teyrên berate dikin alaz, ku Te bi baz û we’az bikin.

21 Rêbendan 2008 / B.evler - Stenbol

Jiyan û ziyan

Gerdûna seqemê; çiv dide xwe di nava darên adarê re,
Ew jinên ku kezî dane ber gûzanê, qijikekî kuj î rijî,
Li ser milekî nazenîn î çol, dide nikilê tûj pê re pê re,
Mirin straneke reşeqetran e, tijî dike vê dirêjepêdana bêjî.

Destgirtiya min e Mirin, tema ku xas û amê fehş kiriye,
Ez ê dêrisê zimanekî bê gelî û newal, qirdikê koçeran tim,
Ez ê qesasê serê bavê bêbabirek, xeniqandin bi binefş kiriye,
Destgirtiya min e Mirin, kezebê, kezebê, ecêb nefsek im.

Yek jî, ev hene, ev helbestkarên toraqa zer, ji ber çûne,
Goşturên bi bezê evînê sergêj, giran in, nikarin bifirin;
Yek jî, ev hene, ev tajiye ku ji Janyayê bê ber bûne,
Edilîne li goristaneke li qefayeke teng î tol, dikin bidirin.

Gerdûna seqemê; pê re digihîjin qijikên reş î birewer,
Ew mîrên ku bi bêhna erdhejê re ref bi ref difirin,
Lîs digirin li ser cendekê bîşenga kuştîya wan ên beter,
Pê re dadidin deriyê hişk radayî, destgirtiya min e Mirin.

29 Adar 2009 B.evler - Stenbol

Berhevdana baçermokan

Sortarî ye xwîna ku vedireşin ser kaxizên kêşsaz,
Dikin fir û ger li ser serê vê herasa meydanê ya aram;
Gelo çi ye van baçermokên badilhewa yên awirbaz
Li ser serê serfêza Bayîzdê dajo berhevdana xam?

7 Adar 2009 Bahçelievler - Stenbol

Werêameyîşê marê qolî

Mehmûd NÊŞITE

“Hetanî ke ez biewnî boça xo ya qole ra û hetanî ke ti biewnî qebra birê xo ra,
ma do senî bêre werê!”

Mêrdek şefeq ra amebi mîyanê erdê korekî, korek aw dêne. Erdê korekî pîl bi. Varozî (Varoz: Dewan de o ke programê dora awe virazeno û awdayîşê bexçan taqîp keno. Sucu.) tera vatibî “ewro dora to wa, ti eşkenê hetanî şan de sey zerriya xo korekê xo awe dê.” Awe zaf bî. Merdim zor dêne xo vatêne ha yela, ha yela ez awdayîşê xo leze biqedênî û nêkoy/kewî tarî. Pira leze kerd êre (yere) de awdayîşê xo qedêna û huyê xo eşt xo kiftî ser û da piro kewt rayirî keye yî.

Dewa ey, erdê ey ra bi lingî saetêke dûrî bî. Rayirê dewe, yew şiveray bî. Tay cayan de raşt, tay cayan de zî pal, kendal, û kaş bi. Nê saetêk ra pey waşt hem boya xo bido û hem zî yew cixara dekero û bianco. Senî serê yew qelbî ra qelebya û kewt yew raste, şî serê yew kerra de nişt ro û qutîya xo ya cixarî vet û yew cixara pişt. Cixara yan nême bibî yan nêbibî kema verê ey de marêko bejî vejîya û kewt rayirî ser.

Merdîm senî çim gina marî ro cixara destê xo eşt û bi dimê huyî ra û na dima. Mar senî famî merdimî kerd hinî xo şedêna û leze kerd. Mar nat û wetê rayirî ra, mîyanê kem û leman de remêne, merdim zî bi huyê destê xo nêne dima. Mar çendêke birêmo zî merdim dima ra nêvisyêne û fek tira vera nêdêne.

Marêko gewr û belek bi. Hema hema qasî dimê huyê derg bi. Mar kerdêne nêkerdene merdim fek tira veranêdaynê. Mar sera remêne merdim ey dima bi. Rey-rey ke merdim nêzdî ey bine serê huyê xo şanayne ci. La mar zî gingilê deyne xo ra û xo huye ra pawitêne.

Merdîm pa wa zeleyabi. Mar dişmen bi. We zî rastê dişmenê xo amebi, gereka îşê dişmenê xo bidîyêne. Mar zî leze leze xo nê-

dêne dest. Ruh şîrîn bi. Werîbinan demêko derg û dila çarnê-çepernê. Demêka ra pey, mar rastê yew qule ame. Senî çim gina qule keyfê xo ard xo xo va: “Ez xelesîya wa.” Verê xo da a qule û qule ra kerd war.

Merdîm ewnîya ke mar qule ra keno war şîno, hema huyê destê xo na hewa û pey ra şa ci. Îlama Homê rê serê huyê qey nêgina boça marî ro! Serê huye ke gina boça ê ro, qasî dî vincewî boçe, govdê ey ra visya. Govde tamam qulike ra şî bi vînî, boça ey zî teber de çend rey erziya hewa û çil da xo badî pey bi serdin û cay xo de bi sey qirşêke û mend.

Mabên de tay-zaf yew wext vêrt. Rojêke o merdim û birê xo pîya ameyê mîyanê erdê xo yê korekî. O roj hetanî a saeta ke merdim awdayîşê korêkî ra agêrabî dewe û raştê marî amebi, reyna o wext îşê înan qedeya û agêrê dewe. Reyna o qelbê rayirî ra qelebiyê. Reyna semêke yew cixara biancê niştê ro û qutîya cixarî vetê û cixara piştê. Hema nêwerîştêbî o maro qol înan de vejîya.

Xora badêke boça marî tera bibî, mar çend roj nêşka bi qule ra veju. Ê rojanê ke qule debi birîne ê zaf dejêne. Ne şew ne roj hewn nêkewtêne çimê ey. Wîîna serey ey ey sero bi û nalêne. Nêşkêne boça xo tado. Wextoke a boça xo nata-weta tadêne zî a birîne ginêne derûdorê qule ra reyna bine gonin û yew sancî ey girotêne vatêne qey erd û asmên yenê pêser. Her wextoke nê dej û sancî ey girotêne o huye û o merdim ameyne ey vîrî. Bi no dej û sancîyan rojî vêrtê. Birîna ê hêdî hêdî bine baş. Roj bi roj dorê birîne amêne pêser û peynî de çikêka birîne nêmend. La boçe êdî bibî qole. Henî (êdî) boça ey sey verû cû îş û kar nêdîne. Rey-rey sey verû cû waştêne werzo boça xo ser û keyf û

eqş bikero, la kerdêne nêkerdêne nêeqş-kayne. Yan zî waştêne boça xo seydê xo wa bilefêno û seydê xo bifetesêno nêeqşkayne. Ê zî famna ke bi na boçe êdî heqê çiyê newînan ra nêvejêno û bi na boça qole zî cu zor û zehmet a.

Hetêka cu bibi zor û zehmet û hetêka zî mar bibi maro qol. Hem marê/i bînî û hem zî kerm û kêzî ey ra vatêne maro qol. Rey rey zî pê xergêlê xo kerdêne. Raştê kamî bine bi o leqam vîndêne ey. No leqam zî zorê ey şîne. Hetêka o dej hetêka heqê werê xo ra nêvejîyayîş û hetêka zî xergêle kerm û kêzan ra kerdêne gêj bibo. Wexto nê gurê ameyne ey vîrî çimê ey bine surî û roj bi roj dindananê xo ê merdimî rê seqênêne.

O wextoke birîna marî bibî weşe û qule ra vejîyabi rî erdî ser o ê merdimî dima geyrêne. Semedêke ê merdimî bivîno û heyfê xo tira bigêro bibi murê gonî mendibi. A yew ra o çewre ra xo kiştê nêdêne. Tim û tim o rayir de bi û çimê ey şarê ke uja ra şînê-ameyne ser o bi.

Senî çimê ê gina o merdimî ra vernî keyfan ra kerd ke biperro. La belê peynî de o keyf û şayî ey bi hêrs û xem. Çimî ey bî surî yew hîdet ey girot derhal sey ke biperro înan ser o galê her dî biran kerd.

Her dî birê nêzanê se bikerê. Her yew cêka rema şî. Peynî de her dî kewtê rayirî ser o û ro dewe remê. O biro ke boça marî qol kerdibi vernî de, o bîn zî peynî de remêne. Mar zî înan dima bi. Qederêke bi no tewir


dê tê ver. Badê pê mar pil da xo ra û erzîya biro qijî ser û ê tepîşt. Senî ke ê tepîşt yew gaz da çaqê ey ro û çendêke jarê ê bibi hemine vera da canê ê. Capedayîşî ra pey mar bi keyf ageyra şî. Biro qij zî derhal gina war, war de mend û bi barabar û caracarê ey. Biro pîl ewnîya ke birê ey ho war de bareno û careno çend hebî kerrê girot û ro birê xo ame. Gava resa birê xo, mar şîbi bibi vinî, bira zî piştî ser war de bibi kolî. Reng te de nêmendibi, bibi zerd zerd sey şîma.

Bi çî zor û bi çî qeyame hetanî xo resnê dewe êdî ruh zî te de nêmend bi. Ne ax ne wax ne zî çîna ruhê ey nêçarnêne. Êdî bibi qurbanê birê xo. Mar birê qatilê boça xo ra heyfê xo girotbi. Şarê dewe sey urf û edetê xo meyîtî şitê û berdê qebristan de defin kerdê.

Êdî mar û o merdim bibî dişmenê yewbînan. Merdim heyfê birê xo dima geyrêne. Mar zî tay kelê ci ronîştbi la zerra xo rehet nêkerdbi û hema zî o merdimî dima bi. Mar çî wext çim ginêne a boça xoya qole ra o merdim kewtêne ey vîrî. Medim zî kamci roj çim ginêne qebra birê xo mar kewtêne ey vîrî. Mabên de zaf rojî vîrtî la dişmenetiya înan nêvêrt.

Merdim xebere şirawit marî rê va; “Ma na dişmenetî xo mîyan de wedarê û ma êdî kiştîşê yewbînan dima nêgêrê. Bêre ma bêre werê” Mar cewabê ê da;

“Hetanî ke ez biewnî boça xo ya qole ra û hetanî ke ti biewnî qebra birê xo ra, ma do senî bêre werê!”



Qenepe

Behlûl ZELAL

Bi kulman li pişta wan dixist û digot, “Belqîtîno, firfitîno, razin û qet nelivin. Pereyên me jî nîn in ku em we bibin ser textoran.”

Meha payîzê ya dawîn jî bihurîbû. Rojên zivistanê yên sar dest pê kiribûn. Li vî bajarî, havîn çiqas germ bûya, zivistan jî ew qas sar bû. Malên ku bi kalorîferan germ dibûn bi zivistanê re rû bi rû nediman pir. Lê li vê taxa ku li qiraxa bajêr û taxa herî xizan e, xanî bi sobeyan germ dibûn. Sobeyên ku pir rojan bi hesreta êzing û komirê bûn. Heta nedibû êvar, dû bi ser xaniyên yektebeqî nediket.

Berfa ku berê sibehê barîbû erd spî kiribû. Bayekî sivik lê weke qeşayê dihat. Jinek, ligel pênc zarokên xwe, dabûne pey mirîşkeke reş. Cîran li qerabalixa wan a girtina mirîşkê derketibûne ber deriyên xwe. Bi awirên mitale (meraqqdarî) û dexesî li wan temaşe dikirin. Êvarî, mêrê jinikê gotibû, “Wekî ku, mirîşka reş nema hêkan dike, sibê serê wê jêkin. Di vê zivistana hanê de, em jî tune em bidin mirîşkan.”

Ev çend roj bûn ku sobeya di mala Bi-harê de, ji hesinê li nav berfê jî sartir bû. Ne komir hebû û ne jî pere hebûn ji bo karibin çend kîs komir û milek êzing ji xwe re biki-rin. Ku zarok diketin hundir, Bi-harê ew di-kirin bin lihêf û betaniyan.

Bi-harê yeka sih salî, xwediyê bejneke zirav, çavreş û pordirêj bû. Lê mixabin ne li mala bavê xwe û ne jî di van dozdeh salên ku bi kurê xaltiya xwe re zewiciye, rojek di rihiyê de nedîtibû. Di zarokatiya xwe de, dema bapîra wê ji zarokan zivêr dibû nifir li wan dikirin. Digot, “Nan hebe, dewê we nebe, dew hebe, nan bi dest we nekeve Xwe-dêyo.” Ev dozdeh sal in, eyn wisan bû. Xwedê nifirên bapîra wê qebûl kiribûn.

Di serê vê sibeha sar û seqem de, zaro-kên xwe yên ku dixwestin ji bin lihêfê derk-evin û li girtina mirîşkê temaşe bikin bi zorê

kiribûn bin lihêfê û pêre pêre, bi kulman li pişta wan

dixist û digot, “Belqîtîno, firfitîno, razin û qet nelivin. Pereyên me jî nîn in ku em we bibin ser textoran.” Zarokan serê xwe dixis-tin bin lihêfê û dibû tiqetiqa kenê wan. Ku dayik ji hundir derdiket, ew bi yek livê ji bin lihêfê derdiketin û li hundir belav dibûn. Pi-ranî diçûn ber pencereyan, li tirimbêlên ku di riya li ber mala wan dibûrî re temaşe di-kirin. Li tevger û pevçûnên cîranan temaşe dikirin. Piranî jî dest bi listikê dikirin. Ti-rimbêlên ku di ber mala wan re derbas dibûn pêlistokên wan bûn. Her yek ji wan, tirimbêlên herî biha, nû û xweşik ji xwe re dibirin, yên kevin ji birayên xwe re dihiş-tin. Vê cara ku diya wan ji hundir derketibû, her çar zarok di cî de, li ber pencereyê rêz bûbûn. Çawa hatin ber pencereyê, her çar bi dengê qîriyan:

-Dayê, dayêêê, bavê min qenepeyek anî!.....

Bavê wan, li taxa dewlemendan karê ro-jane û barkêşiyê dikir. Qenepeyeke kevn li pişta xwe kiribû û nû ghiştibû ber deriyê apartmanê. Dayik û zarokan û bi bezekê xwe gihandin qenepeyê. Zarok li ser qene-peyê rûniştin û paldan. Piştî her çaran bi hev re li ser qenepeyê rabûn piyan û reqisîn. Diya wan rahişt şivekê û da pey wan. Qe-nepe ne pir kevn bû. Bi-harê bi her du des-tan mistda, li ser rûnişt. Pir caran qenepe, palde, kursiyên kevn anîbûn mêrê wê, lê hemû jî hatibûn şikandin û bûbûn ardû. Ku sermayê wisan dişwar dest pê nekira, dix-west vê carê qenepeyê neşkîne, bibe men-zela razanê. Dema ku xwe û hevserê xwe, li ser qenepeyê, li ber hev dirêjkirî xeyal dikir, laşê wê tavilê germ dibû.

Lê ji sermana hedan bi canê zarokan nediket. Kuxtekuxta wan bû, di nav lihêfê de direilîn. Loma dema mêrê wê çû bîvir ji hundir anî û kete ser qenepeyê, wê jî dengê xwe nekir.

Weke ku şeş heb şêr bikevine ser laşê çelekekê, ji xwe re û me re, di saetekê de, qenepe ji hev veçirand. Sê kîs tije êzing, sê kîs tije singer û kîsek jî tije caw kirin. Dema ku tariya êvarê hêdi hêdi daket mala Biharê, wê jî karê xwe qedandibû. Sobeya ji sacê sor bûbû. Roniya parangên dara qenepeyê di qula devê sobeyê re derdiket û li menzelê belav dibû. Biharê, hemû wasleyên cawê ku ji qenepeyê bi dest xistibû fesilandibû, bi hev dirûtibû. Singerên ku rûniştina qenepeyê xweş dikir, kiribûne hundirê cawê dirûtî. Bi raxistina nivîna singer re, her çar zarok xwe avêtine ser û teqlo teqlo bûn.

Zarokan piştî rojê xweş, şeveke xweş jî bûrandibûn. Sobe germ bû, diya wan şorbeyeke germ danibû ber wan. Têra xwe li ser nivîna singerî leyistibûn. Têr westiyabûn. Piştî nîmêja eşayê ne bi gelekî, her çar bi xeweke şîrîn ketibûn.

Îşev, weke sobeya germ, weke şorbeya nîskan, weke listik û xewa zarokan her tişt şîrîn bû. Biharê bi giranî li nivê çavên hevserê xwe nihêrî. Di heman katê de, bi heman hest û ramanan, hevserê wê jî bersiv dayê. Ji nişkê ve her du can bûne yek û xindirîne ser nivîna (doşeka) singerî. Zarok raketibûn, êdi dora wan bû. Dema her du destên qusi-

payî (nasir), her du memikên girover dişindandin, lêvan jî, hev û din dikiritandin. Çar paqên tazî li hev herbilîbûn, mîna du marên bi hev şadbûyî, li ser nivînê singerî diçûne vî aliyî û wî aliyî.

Dema her du laş sist bûn û ji hev qetiyar hevserê Biharê lê vegeyira û gotê:

-Delala min qenepeya me tune be jî nivînên me hene.


Bi vê gotinê re Biharê xwe zer kire destê hevserê xwe, bi şid girt, mistda. Devê xwe kir nav her du lêvên wî, heta ku henaseya wê têr kir, lêvên hevserê xwe, di devê xwe de cûtin. Û piştî got:

-Qet ne xem e, delalê dilê min, qet ne xem e. Bila her roja me wilo xweş be, ne qenepe, bila balgiha bin serê me jî nebe. Ez kêliyeke weke vê kêliyê nadim bi hemû qenepe û qarvoleyên dinyayê.

Di rex hev de li hev pêçayî ketin xeweke şîrîn. Bi banga meleyî re, Biharê çavên xwe bal kirin, laşê wê bûbû qeşa. Tavi lê çavên xwe miç kirin, zû hat ser hişê xwe. Ne êzing mabûn li malê û ne jî şorbe hebû. Bêcare deng li hevserê xwe kir. Hevserê xwe şiyar kir.

-Rabe heyran rabe, niha bazara karkeran tije bûye. Xwedêyo belkî, tu îro jî qenepeyekê bîni malê.

Kewçêr 2009-Amed



Em tî ne

Feratê DENGIZÎ

Tê zanîn ku roman bêhtir li ser xweseriya kes an jî çend kesan tê hûnandin. Li vir wek vegotineke gelemperî derketiye holê.

Masî bêav najîn, her kes bi vê dizane. Lê ruh, giyan tişteki wisa ye ku di her şert û mercî de dixwaze hebûna xwe, jiyana xwe bidomîne û rêyekê dibîne, bi şeweyeke vegurî be jî dijî. Dîsa tişteki zanistî ye ku masî dema bêav ma, veguherî û li gorî peresînê hemû candar; mirov, ajal, teba, teyrûtirûr û hwd. wiha ji vê veguherînê afirîn. Yanî teqez rêya jiyane, bi çi awayî be, heye.

Lê mirovê ku xwedêgiravî, candarê herî bîaqil e, her tiştî, dimezixîne, têk dibe, diqedîne. Ji bo kêfa çend hezaran, ji ber navnotî, navgenîtî, çavnebarî bi telaqreşî jiyane li hemcinsê xwe dike keratî. Ji ber hêrsa, “bila her tişt a/ê min be”, jiyane, cihanê, heta bibêjê feza û gerdûnê jî dixê xetereyê û ber bi tunebûnê ve dibe. Na, ez telaliya feleketê nakim, ne bangewarê reşbîniyê me.

Aşkera ye ku jiyana bêav nabe û av ji bo candaran hêmana sereke ye. Û şanseki herî mezin, girîng û pîroz e ku hebûn, daring bi xêra hêza pozîtîf, bi xêra aqilê gerdûnê yê abadîn, candariya ku ji hebûna zereyê, ji niqteya herî biçûk î di bîrihiyê de ber bi vê hebûna pîroz, yanî ber bi mirovahiyê hatiye û bûye mirov. Ev fersendeke jiyane, şenseki ji nizanîm ji çend milyaran yek e. Lê ka em mirov, vêya çawa dinirxînin, gelo!? Va ye zanyarî dibejê; li marsê, li heyvê şopa avê heye. Yanî candarî, teqez li wan deran hebûye û dibêtiyeke mezin e li gelek cihên gerdûnê ev wiha be. Yanî aqilê mezin û têgihiştî yê zêde peşveçûyî (!) her tişt serobin kiriye; mezaxtiye, têk biriye û qedandiye. Wek ku a niha em li ser rûyê cihanê dikin, li ser vê rojgera şîn î xweşik dikin. Em dixwazin dinyayê jî bikin mîna mars û heyvê. Em xwe ber bi qedandinê ve, bi lezûbez, dibin. Avê diqedînin... Em avê diqedînin, ji bo ku masî nemînin... Cihada pîroz, li me pîroz be...!!!

Romana nivîskarê hêja Helîm Yûsiv “Gava Ku Masî Tî Dibin” kir ku ev ramanên hûr û kûr bi ser hişê min de hilweşin, bibarin.

Roman bi hunera nûjen û xweş hatiye hûnandin. Heyber û tiştên aidî mirov (ên Masî) dipeyivin, ev şewê dibe sedema xweşherikîna vegotinê. Bandora surealiyê deriyekî nû ji pexşanê re vekiriye, wek ku nivîskar vêya di kurteçirokên xwe de jî pêktîne. Ev di wêjeyê de, di wêjeya Kurdî de hêza afirîna nû ye, bi ya min. Nivîskar bikêrhati vêya dişayesîne û dike ku xwendekar bimiraq bide pey vegotinê, mirov aciz nake. Masî dilê ku bûye çarparçe/pirparçe, bi evîna dilê xwe dicebirîne. Mirov -dîlbikeser be jî- li welatê agir û rojê digêrîne û dixê nav wê keda giranbûha ya ji bo jiyana azad. Ev, ligel zor û zehmetî û bêderfetiyên jiyane û radeya zilmê, hêviya evîne xurt dike. Masî naqedin û wê neqedin jî...

Min bi xwe, bi dilxweşî û kêfxweşî, bi jîdestêxwebêrnedanê da pey Masî; ez di wê şîverêka ku li ser avê vekiribû de meşiyam li welatê xwe, li welatê tofana dema nû /Nuh, li welatê derd û kedera mirovahiyê. Ev xaka wek ku dergûşa mirovahiyê ye îro dergûşa elem û zilmê ye ji bo her hebûna pîroz, ji bo ramana azad, ji bo mirovahiya bi wîjdan î xwezayî. Mirov bi gelek awayî xwe di vê jiyane de dibîne, lewra ev kurteçiroka jiyana me tevan e ku her kes newêre behsa wê bike û binivîse, ye.

Mijara romanê rojane ye, rojeva me ye. Ne xerîbê me ye.

Bi qasî têgihiştina xwe dixwazim hinek kêmasiyan jî binim ziman:

- Ziman herikbar e, lê hebekî hişk e. Hes-tiyarî û dilovaniya mirov dikaribû bi şewatî-

zeke nermgotinî bihata der.

- Roman hebekî dirêj e. Xwendekarên kurdî hindik û yên hene jî bêsêbr in .

- Mirov dibêje qey tevayê bûyerên têkoşînê tev hatine serê yekî. Ev baweriyê qels dike. Her bûyerek bixwe, yên ku hatine serê Masî, mijara romanekê ye. Mirov dibêje qey nivîskar xwestiye her tiştî bi carekê vebêje. Lê belê asoya şoreşê fireh e û derdê me kurdan û elemên birinên me dûvdirêj in.

- Şayesandina erdnîgariyê qels dimîne. Bi ya min, ji ber ku gera tevahiya welêt ne pêkan e, divê bîranîn zêde bîne nivîsîn û xwendin. Ev wê derfetê zêde bide nivîskar. Tê zanîn ku L. Tolstoy berî ku romana “Şer û Aşti” binivîse li qada şer gelekî geriyaye. Têkoşerên me divê bîranînên xwe ligel danasîna erdnîgariya ku ew lê geriyane, jiyane û têkoşiyane, ger bi rêya nivîs û dîtbariyê ger jî bi rêya vegotinê divê bigihînin wêjevan, nivîskar û hunermendan. Êdî, bi ya min, dem ji ya ajîteyê zêdetir a hunerê ye.

- Tê zanîn ku roman bêhtir li ser xweserîya kes an jî çend kesan tê hûnandin. Li vir wek vegotineke gelemperî derketiye holê.

Wêjeya kurdî ya nûjen, mirov dikare bi-bêje di heyama xwe ya ciwanîyê de ye. Û bi gelemperî her kes, her nivîskar, her hunermend, ji ber nakokiyên jiyane sererast berê xwe nade bingeha wê ya rast. Rastiyekek heye û li ber çavan e. Ma em nebêjin û nenivîsin dê kî birinên me veke û derdên me bîne ser zar û zimanan. Çem û rûbarên ku miçiqîne ne hindik in.

Lewra kevirên welatê me jî dilorînin ji bo azadiyê.

Av di gola de nemîne jî wê Masî bijîn...

Ne Masî tenê tî ye.

Em tev tî ne, tiyên azadiyê...

Ev berhema heja li benda xwendina wê-jehez, mirovhez û kurdîhezan e.

* *Gava Ku Masî Tî Dibin- Roman- Helîm Yûsiv- Weşanên Lîs- Çapa Yekem: Gulan; 2008- 239 rp.*

27.11.2009- Amed



Dotmam

Kendal MÎREK

Dem demeke pir xedar bû. Mirov giş guherîbûn. Dayika wê, bavê wê û birayê wê bi çavekî neyarî lê dinihêrîn. Her roj tenduristiya wê xera dibû. Gav bi gav goştê laşê wê diheliya, çalikên çavên wê kûrtir dibûn. Qevdikên destên wê ziravtir, çermê laşê wê zertir dibû.

Di nava cî û nivînan de hema hema mabû çil kilo. Porê wê yê zerîn diweşiya. Nexweşiyeke pir zalim û bêbext berstûka wê girtibû.

Cîranan her roj pirsar wê ji malbata wê dikirin. Dayika wê her tim digot; “Em hêviyên xwe ji Xwedê nabirin. Wê baş bibe...”

Mirovên ku ew nas dikirin jî jê re diayên li gor baweriyên xwe dikirin. Lê mixabin mirin her roj zêdetir nêzikî wê dibû. Di demeke kurt de ev bûyer hatibû serê wê û êşa mirinê ketibû bedena wê. Dema xwe ya mayî jî di nav biranînên kûr û dûr de derbas dikir. Ew qizikên serpeçayî yên ku hatibûn ber serê wê qet ne hişê wê de bûn. Li ber sîkratê jî pir zelal difikirî. Lê nikaribû biaxive. Ji ber vê sedemê bi tiliya xwe îşaretek kir û bangî birayê xwe kir. Ji birayê xwe qaxizekî spî û paqij û pênuşek xwest. Heft mixabin wê daxwaza xwe ya dawîn binivîsiya. Bi destê xwe yê çepê îşaretek ji dayika xwe re jî kir. Dikir ku bigota “odeyê vala bikin û min tenê bihêlin”. Heta birayê wê jê re alavên nivîsê anîn dayika wê û ew qizikên li ber serê wê Quran dixwendin jî derketin derve.

Piştî ku birayê wê jê re pênuş û qaxiz anîn, balifa ber serê wê hebekî bilind kir û hêdî hêdî ew kişand jor û pala wê da balifa rastkirî. Dûre sehpayeke biçûk anî danî ser zikê wê, pênuş û qaxizê wê jê re rast kir. Dema ku birayê wê dikir ku derkeve li çavê wî û li teyba wan a kevn nihêrî, birayê wê fehm kir ku ew muzîka ku herî jê hez dike dixwaze cara dawîn lê guhdar bike. Hêşiran hêdî hêdî xwe ji çavên birayê wê berdan

xwarê û çû ber teybê, muzîka Farîd Farjat a kemanê jê re vekir û bi lezgînî ji odeya wê derket.

Lambeya wan a zer a bi kêranê menzela wan ve daleqandî hema hema dora xwe ronî dikir. Tîrêjên lambeyê heta digihîştin ser sehpayê pir hindik dibûn.

Janar bû navê wê, roja jî dayika xwe bûyî heta vî temenê xwe jî pir qizikeke bi nav û deng bû. Porê wê yê zerîn heta ser kamaxên wê dihatin xwarê. Çavên wê yên şîn dişibîyan deryayeke bêbinî. Lamên wê yên sor wek sêvên bihuştê bûn. Tiliyên wê yên zirav, laşekî spî wek berfa Sîpanê Xelatê û kenekî bê emsal Xwedê Teala kiribû nesibê wê. Pir bi delalî mezin bûbû. Heta vê demê jî evdekî Xwedê negotibû ev keçik, keçikeke ne baş e û kesekî tu gili ji malbata wê re nekiribûn der heqê wê de.

Gelek camêran jî bavê wê re digot; tu yê Janarê bidî lawê min. Bavê wê jî digot “di qederê de hebe wê bibe û bi vî awayî ji ser guhê xwe diavêt. Dayika wê ya ku di navçeyê de wek qîza xwe bi nav û deng bû, bi navê xwe Asya bû, jinikeke pir delal û bi qedr bû. Çiqas civatek li dar biketa wê mesele bihata ser zewaca Janarê, dayika Asyayê jî wek mêrê xwe digot qismet.

Her şefeq wê bangî keça xwe bikira û li ba xwe bida rûniştandin. Dest biavêta şehik û porê wê yê zerîn, wê şeh bikira.

Janarê hêdî hêdî dest bi nivîsê kir. Dengê kemanê pir hindik dibihîst. Lê dîsa jî du sê hêşir ji çavên wê weşîyan. Çiqas tîpek binivîsiya wê bixwenda. Nedixwest ku di nîmeya wê ya dawîn de dilê kesî jê bimîne.

Dengê saeta wan û dengê kemanê tevlihev bûbûn, di navçeyê de her kes di nava xemgîniyekê de bû. Kesî nizanibû ka çima Janarê kete vî halî û ev nexweşî ji ku hat.

- Silav bavo, silav dayê, silav birayê min

ê çeleng û mêrxwas. Ez vê gavê ji nav we diçim ew Xwedayê mezin wê rojekê me bigihîne hev. Heta wê rojê bi xatirê we.

- Bavo, ez dizanim te her tim ji min hez dikir. Lê carekê jî te porê min bêhn nekir, te bi destên xwe yên nerm hêsirên çavên min paqij nekir. Lê dîsa jî ez keça te me û ez ji te pir hez dikim. Min bibexşîne.

- Dayê, ez wek îmana xwe dizanim ku te tu car nedixwest striyek jî bikeve piyê min. Lê dayê dema ez nexweş bûm tu jî ji min dûr ketî. Tiştê nabe dayê ez ne dilşikestî me. Ez qurbana te me dayê, bila di hişê te de ev halê min nemîne. Bila her tim kenê min were bîra te.

Birayê min ê şêrîn û bedew, tu her hebî û her tim dilê te şad be. Ez zanim tu gelek xemgîn î. Min mereq nekin ez ê li benda we bim heta bi hetayê.

-Bavo, dayê min bibexşînin, tu sûcê min tune bû. Min tu guneh nekiribû. Heta îro jî min nedixwest rastiye ji we re bibêjim. Lê belê pêwîst e hûn rastiye hîn bibin. Ji ber ku tu car bûyerên weke vê neqewimîn.

- Roja hûn çûn bajêr, lawê apê min Çekan dema ji ser kar hat, hat ber deriyê me. Li derî xist û got, "Janar ka avekê bîne ji min re." Min jî derî lê vekir û ew jî hat hindur. Li salonê li ber televizyonê rûnişt. Piştî

ku min av da wî got, "Janar qey di mala we de çay tune gelo, ka dotmam jî me re çayekê çêkê û em bi hev re vexwin. Min jî çaydanek çay çêkir û danî ber wî. Piştî ez derketim derve. Heta ez hatim malê her du îskanên çayê jî tijî kiribûn. Ez li quncikekê rûniştim, min îskana xwe da destê xwe û min vexwar. Dûre hişê min geriya û ez ji ser xwe çûm. Dilê min jî min boribû. Piştî çend saetên din ez rabûm. Wekî din dilê min nagire ku ez bi-domînim. Çekan bi awayekî hovane tecawizî min kiribû.

Ez tirsîyam ji we re bêjim. Hema min jî çiqas heb li malê hebûn min xwar û ez vêga di vî halî de me.

Min bibexşîne bavo, min bibexşîne dayê û birayê min ê delal, min bibexşînin.

Heta strana kewanê xelas bûbû Janarê jî nefesa xwe ya dawîn dabû. Nameya Janarê mabû li ser sehpayê û sehpa jî li ser dilê wê. Birayê wê piştî çendekî din hat menzela wê û kir qîr û hawar. Name girt û hîna ne xwendibû kir parçe parçe

Di bin bandora mirina Janarê de birayê wê rastiya jiyana wê jî parçe parçe kiribû.

Ruhê te şad be Janar

Ruhê we şad be JANARê din.

Li min negire

Sadedîn ÇIRA

Ku feqîriyê piştî min şikandibe
Tim westiyayî bim
Tim piştixûz.
Li min negire
ku nikaribim bi te re bazbidim.

Ku êşan nexşeya xwe di rûyê min de
nîgar kiribin
Tim rûtirş bim
Tim bê mehd
Li min negire
Ku nikaribim bi kenê te şa bibim.

Heqê min tune ye, te bi xemên xwe
bifetisînim
Li min negire
Heqê te jî tune ye, min bi henekên
xwe bifirînî
Jixwe basko me.

Ku dilê min ji nazan dibihure her roj
Tim birçiyê hezkirinan bim,
Tim ji evînan re tî.
Li min negire,
Ku nikaribim bi evîna te têr bibim.

Dosye: Romana kurdî -1-



Amadekar:
Elîxan LORAN

Bi romanûsan re guftûgo

*Edîp Polat
*Lokman Ayebe
*Menaf Osman
*Omer Dilsoz
*Şener Ozmen

Roman
Omer Dewran

Roman di nav cureyên nivîsê de dibe ku ya herî dawî peyda bûye ye. Li gor hin lêkolêrên dîroka wêjeyê yekemîn roman “Don Kîşot” a Cervantes e di sala 1605’an de hatiye çapkirin û li gor hin lêkolêrên din jî yekem roman di salên 1000’î de ji aliyê jineke japon ya bi navê Mûrasakî Şikîbû bi navê “Çiroka Genjî” ye. Û cerga ku vê derfeta bi navê xwe roman peyda bûye û heta îro her û her teqîl daye xwe, kok û rehên xwe kûr berdaye, rêveçûna gel û cîhanê guherandiye, di wêjeyê de li ser meseleya liberxistin û balbirina ser hemû rewş û barûdoxan xwe nedaye çivan, berevajî vê yekê mekanîzmayeke wisa ji xwe re afirandiye ku pêl û fikirên ku an agir berdane hin stûnên cîhanê an jî stûnên nû di binê konê cîhanê de çikandine jî ku ev pêl û fikirên çav ji hesin nakutin jî bûne destbirakê romanê. Gelo roman jî bo çi li gorî çîrok û helbestê dîstîplîneke nû ye jî lê gelekî di rewacê de bûye? Me jî xwest vê rewacbûn û derfeta “axaftin”ê ku li ba gelek neteweyan xatirekî wê yê giran heye li romana kurdî bisepînin. Me heşt pîrs amade kirin û jî romanûsan re şandin û dûre jî me ev pîrs yeko yeko ji hev veqetandin û di binê her pîrsê de bersivên ku romanûsan dabûn li gorî rêza alfabetîk ya romanûsan rêz kirin ku, me xwest em li ser pîrsîna pîrsekê hemû bersivan li ba hev bicivînin û ev bersivên hanê di hişê me de karibe xwe bêtir şênber bike.

Ji bo ku “Romana Kurdî” baş were nîqaşkirin me di kovargerîya kurdî ya Bakur de jî gaveke yekemîn avêt. Cara pêşîn dê dosyayek li du hejmaran bê dabêşkirin. Ango di hejmara bê de jî –hejmara Adar û Nîsana 2010’an- dê mijara dosyeya me Romana Kurdî be.

Romanûsê frenewî Stendhal dibêje ku, roman neynikeke ku di rêwitiyê de tê gerandin e. Fermo, neynikên di rêwitiyên bi kurdî de tên gerandin...

Bi romanûsan re guftûgo

Amadekar: Elîxan LORAN

Edîp Polat - Lokman Ayebe - Menaf Osman - Omer Dilsoz - Şener Ozmen

Bi raya te roman û romanûsî tê çi wateyê? Di nav evqas belawelabûn û parçebûna kesayet, derûnî, dilinî, hal û rewşan de roman alav û amûr an jî mebesteke çawa ye?

Edîp Polat: Bersiva vê pirsê bi nîrxên takekesî ve girêdayî ye û dikeve hundirê bersiva pîrsa “bo nivîskarekî armanca nivîsê çi ye?”



Eşqa peyvan, derbirînan, xweşikgotina bûyeran, nêrîna asoyên dût, ragihandina hîzrên kûr û bi tomarkirina hemûyan re, ev kar xweafîrandina nivîsê û giyanê nûser e. “Belawelabûn an parçebûna kesayet, hal û rewşan” nêrînek e şîrove ye, lê roman ne alav û amûreke rehabilitasyonê ye, ger ew têkeve rewşeke wiha dibe ku ji xwe dût bikeve.

Lokman Ayebe: Roman sîwanek e ku di bin xwe de tiştên bûyî, tiştên dikare bibin, tiştên tîn xwestin ku bibe, tiştên tu carî nebûye û ew ê nebe vedihewîne û romanûs jî ew hilgirê vê sîwanê li ser van “tiştan” e. Roman dişibe jiyanê, belkî jî jiyan bi xwe be lê belê ne mecbûr e ku ew weke jiyanê piştî xwe yekser bispêre têgeha rastiyê. Ku ya wê jî jiyanê xurtir û cudatir dike jî ev e. Roman li hev edilandina rastiyên jiyanê û hêmayên fîktîf in. Ji ber van taybetmendîyan heger heqê wê bê dayîn, -bi giştî wêje, bi taybetî jî roman- alav û amûreke ji bo têgihiştina hal û rewşan, tekûzkirina belawelabûyîna civakê, aşkirina perçebûna derûniya kesayetî, bi dilgermî nêzîkbûna dilnîyê û jî her teştî wêdetir rêyeke debirandin û pê bilandinê ye. Lê heger jî heqê wê neyê der ev

alav û amûra ku niha em pesnê wê didin weke çekeke bê gule wê bi kêrî tu tiştî neyê.

Menaf Osman: Di vê serdemê de roman, hunereke sereke ye ji hunerên wêjeyî. Heta mirov dikare bêje serkêş e. Romanûs jî wêjeyanekî xwedî hunereke wiha ye. Fikra wî çawa dibe bila bibe ew her dem mirovekî diltênîk, hesas û hişyar e jî hemû pîrsgirêkên civakê re. Ew bixwe jî çînekê be jî, sînoren çîn û qewmiyetê nas nake, di hestiyarî û nêzîkahiya xwe ya civakî de. Lewre dikare xwe têxe şûna her kesî/ê, empatiyê bike, her kesî/ê di dil û hînavên xwe de, di fikr û ramana xwe de bijî. Lewre dikare serwest bibe jî hemû detayên civakê û nîrxên hunerê û bi estetîkî jî biparzinîne. Çavên wî jî, guh û dilê wî jî ji yên her kesî/ê diwartir û hesastir in. Heger ne wilo be dikare dualîtiya jiyanê bibîne, ew ê mîna her kesî/ê ew jî rûyekî jiyanê tenê bibîne, bijî. Çawa zalim dûtî jiyanî mazlûman in, têr dûtî ya feqîran in, ew jî dê yekalî be, parsekbûna civakê û kesayetiyê, pêdiviya me bi romanê xurtir dike û roleke mezintir dispêrê. Roman, mîna beşên din î wêjeyê dibe amûreke sereke jî bo civakê. Jiyan tevî hemû parçebûna xwe jê tê famkirin û ev parçe bi hev re têkildar dibin, hemû parçe digihên hev. Dijmînen hev ên ku dixwazin koka hev bibirin jî, di romanê de tîn ba hev û perdeya hesînî ya di nava wan radibe, jî jiyanî hev haydar dibin û xweş dibînin ku kes jî wan ne lawir in û ne jî ew qasî jî hev cuda ne. Çawa ku di du kêzîkên hember hev de ew mirovên ku di şer de ye, hevdu jî dirîndeyan jî hovtir û nemirov dibînin. Lê ku roman bi zîmanekî hunerî di wê kêlika şer de tiştên di dilên her du aliyan de li ber çavan radixe, tîrs û xofa wan, hezkirin û berzîkirina zarok û hezkiriyên wan, dilêşî û dilxweşiyên wana vedibêje, wê çaxê dertê holê bê çiqasî nêzîkî hev in, çiqasî ku li hemberî hev bin jî. Roman hunereke pîr girîng e jî bo dîtina rastiyên civakî û destnîşankirina çareserîya hemû pîrsgirêkan.

Lê mixabin belavbûn û bikaranîna vê hunerê pir teng e, di civaka me de. Civakeke kêmxwende û ji sedî yek ji xwendevanên wê roman naxwînin, dihêle ku ev beşa wêjeyê ji bê bandor bimîne.

Omer Dilsoz: Ez romanê wek ‘avakirina dinyayekê’ dibînim. Ev دنیا jî bere bere li ser xwe kesayetekê –ruhiyeta miletekî– durist dike. Roman, ne tenê lêkanîna hin serhatî û çîrokan e, ez romanê hinekî jî wekî dahênana ‘ramana gelekî’ dibînim. Ku wate, tu bi dahênana romana xwe binhişînekê ji nîfşên pey xwe re çêdikî û bi raman û felsefeya wê jî, rê û



rêgehekê li ber nîfşên dahatûyê vedikî.

Bo nimûne, heke em bibêjin ‘roman h u n e r a mubalexe/nepixandinê ye’ û bi vî çavî tevna romana xwe raçînin û kesayet û bûyerê bi vî bir û boçûnê saz bikin, dê ‘nîfşekî arabesk’ li dû me bimîne. Lê,

heke perspektîfa me ya bo romanê raman be – ne tenê ramanekê xav û kavik- wê demê nîfşê (xwîner) ku em ê jêrhişekê jê re çêbikin, dê bêhtir mudaxil û têkildarê jiyan, civak û cîhanê be û dê vana bi ramanê hêlsengîne.

Şener Ozmen: Ne nîzanim mebest jî vî pîrsê çi ye!? Jî çibûna wateyê bêhtir –ku bi raya min ne wateya romanê û ne jî ya romanûsiyê têtê guhertin– ez li du wêjeyê me. Çi gotiye? Çi dibêje? Nîvîskar, her weha romanûs der heqê mirov û têkiliyên wî de agahiyên çawan dide me? Bo çi û bi çi teherî bang li me dike? Ê min xwe grafomanî ye, ango nexweşîya nivîsandinê ye. Bi raya min, bi her nivîseke xwe ya bi kurdî re, ez xwedî li mêjûya xwe ya kambax derdikevim. Romanûs, ne li dû wê belawelabûn û parçebûna kesayetê ye, heye ku ev yek metaforek be û ew ne li dû sedemên wê ye jî, ew li rêyeke din digere, rêyeke ku xwe ji mirinê xelas bike...

Dema mirov li kronolojiya romana cîhanê binihêre mirov dê bibîne ku, roman bi avabûn û sazûna bajar û bajarvaniyê bi pêş ketiye. Em jî vir jî dagerin ser “Romana Kurdî”, gelo tekane sedema virnîbûna romana kurdî saz-

nebûna dinamikên bajar û bajarvaniyê ye? Di heman katê de kelepore dengbêjî û çîrokbêjiyê û rewacbûna helbesta klasîk bandoreke çawa li ser romana kurdî kiriye?

Edîp Polat: Nêrîna li kronolojiya diroka nivîsîna romanê, karekî din e, lê romanên ew çend xweş û serkeftî hene ku tenê jiyanê gundîtiyê tînin zimên an tenê psikolojîk in, di nava çar diwaran de hatine nivîsîn. Li bajaran jî ber ku têkilî bêtir grift in, ji romanivîsînê re çêtirîn atmosfer heye. Dîtinêk din jî ev e, ev curenivîs weke çîrok an helbestê jî aliyê şeweyê ve ne bi sînore û jî ber ku dikare her du şeweyan jî bihundirîne, afirîner di nav de digevize bi dilê xwe. Romana kurdî çima virnî be, kî dibêje, bi kîjan aliyê xwe? Heke em bêjin kurd tenê gundî bûne (û wisa mane) tiştêkî din e, “saz-nebûna dinamikên bajarvaniyê” tiştêkî din e, hebûn û tunebûna nivîsîna li bajaran an mijarên şarevaniya modern tiştêkî din in. Dafik, qeyd û zincîrên li pêşîya romana kurdî hene, divê ew werin zimên. Bandora kelepore dengbêjî û çîrokbêjiyê ya li ser romana kurdî, bi serê xwe mijara nîqaşê ye, ev her du têgeh sebeba hebûna ziman in, lê dibe ku di demeke kurt de bibin bend li pêşîya nûjenîya wêjeya me. Heke em li “Dengbêj” birêz Uzun binihêrin, bandora wan a li ser romana me pêşiyê bi peyva “bingehînîyê” dihat şirovekirin, romanên mîna Bilican, Evdalê Zeynikê, Rîstemê Zal, Dewrêşê Evdî him bêtî çîrokbêjiyê û him jî bêtî dengbêjiyê dê nehatina nivîsîn. Ji ber ew panzehîrên asîmilasyonê bûn, niha û demeke dirêj dê bi hurmetkarî di nav vebêja me de cih bigirin. Lê mixabin li hember romanên dinyayê ew dê mêvan bin. Klasîkên kurdî di qada helbestê de rewac in, dibe ku ji bo xurtkirin û xemilîna romanên pêwîst bin, weke rîstên Şekspîr ku di ramanekê îngîlizî de cih bigirin an feyzê bidin hin pexşanên wan. Lê em jî bîr nekin ku Ulysses a Joyce ne jî ber xwespartina çîrvanok an rîstên qedîm ên îrlandî serek e ji romana sed sala bîstan re. Bîst û çar saetên komek heval li kuçe û kolanên, raman, hizr, hest, tevger û têkiliyên wan bi pîsporiyeke payebilind tenê dikare wiha were zimên! Mafir ku asta romanûsiya me bi hejmarê wergerên me yê li zimanên biyanî têtê pîvan (ku şibakeya li wêjeya dinyayê tenê ev e), divê êdî pîrsa “ji bo em bi romanên zimanên din yê pêşketî qayîşê bikşînin, çi jî me kêr

e?” bikin. Bersiva min a ewil ev e “çi di romanên me de zêde ye?” Me êdî ava klasikan der-nexist? Ne bes e romanên mijardîrok? Binêrin em îcar xwe dubare dikin û di bin navê lixwe-gerînê de çawa ku birêz Uzun Evdal, Memdûh Selîm, Celadet, Dengbêj Biro û kurdên dema Ninova kir mijar îcar li pey wî birêz Dost dest bi lixwegerîna neteweyî kir û li pey Uzun bi heman mijarî roman rêz kirin: Mîrname, 3 Gav û 3Darek, Mijabad û hwd. Ger nivîskarên li diasporayê hêj li pey hesta “xwewindakirinê” bin, helbet bersiva vê yekê “lixwegerîn” e, lê bi ya min ev merheleyek bû û divê van romanên jî bihatina nivisandin, lê bes! Em heta ji bend û qeydên van mijarên weke dirok, dengbêj, si-yaset û çirokê nefilitin, romana me bi yên nûjen re nikare bibeze.

Lokman Ayebe: Erê romana cihanê bi ava-bûna bajar û bajarvaniyê, bi awayekî din bi pêşketina bûrjûvaziyê zîl daye û qam girtiye, lê niha em rabin û bibêjin tekane sedema virnî-bûna romana kurdî saznebûna dinamikên bajar û bajarvaniyê ye wê derkeve holê ku haya me ne ji diroka me, ne ji çanda me, ne ji keft û leftên me, ne ji diyalektîka civaka me jê derbas bûye û ne ji ji nîrên ku bindestiya po-lîtîk li ser me ferz kirine tune ye. Saznebûna dinamikên bajarvaniyê di virnîbûna romana

kurdî de sedemek e lê bandora vê se-demê ji van sede-mên din ne bêtir e... Çawa ku li ci-hanê sedsala 19'an bûye sedsala bûrjû-vaziyê di heman demê de ev sedsal bûye sedsala ro-manê jî. Gelek roman û romanû-sên giranbuha di vê sedsalê de daye der. Sedsala 20'an çawa ku bi her tiştê xwe



bûye sedsala kaosê ji aliyê romanê ve ji bûye sedsala kaosê. Vê kaosê mantalîte û mîsyona romanê gorî xwe guheriye, gelek romanûs û romanên baş ji nava vê kaosê derketine lê ji vê kaosê ji bo romanê cihaneke nuh neafiriye... Niha jî salnameya xelk û alemê 2009'an nişan dide lê heger bîyî xwe xapandin em li salna-

me ya xwe binihêrin gelo em ê xwe jî di sala 2009'an de bibînin? Salnameya me ji weke di-roka me, weke kesayatiya me, weke erdnîga-riya me perçe perçeyî bûye û em kurd ne bi tenê wêjeya xwe -ji ber sedemên hundirîn û yên derveyîn- bi gelek tiştên xwe li dû alemê mane. Ya rast em li dû alemê hatine hiştin. Em ji vir vegerin ser romana xwe. Dema di sala 1935'an de romana me ya yekemîn hatiye weşandin em dibînin ku li cihanê hetanî wê demê romanê bi dehan pêl û lotik daye xwe û bi sedan romanûsên qerase hatine û çûne. Ji 1935'an û hetanî îro yekûna hejmara roma-nên me yên hatine weşandin li cem xelkê di mehekê de tîne weşandin. (Bêguman di wêjeyê de pîvana başbûnê ne pîrbûn û hindikbûn e) Perçebûna welêt, qedexeyên li ser zimên û ji ber hizra bindestiyê, ew benîkê divê wêjeya me ya klasîk û modern bi hev girêbida hatiye qe-tandin. Ji ber wê jî romana me sîudeke berbi-çav ji kelepura dengbêjiyê û çirokbêjiyê wernegirtiye. Dema mirov bi awayekî balkêş lê hûr bibe wê bibîne ku destan û çirokên bi rêya dengbêji û çirokbêjiye ghihiştine îro di eslê xwe de her yek ji wan romansek e. Di vir de ji bo me şansekî mezin heye ku heger em bikaribin piştî romana xwe bispêrin ser van romansan bi hêsanî em ê bikaribin romaneke bi taybet-mendiyên kurdewar biafirînin. Mixabin hetanî vê rojê me bi çavê xerîban û bi çavê biçûk li kelepura xwe ya çandî nihêriye, lê lixwevege-rek heye ku ez bawer im di demên pêş de wê romana me ji vê kelepore sîud werbigire.

Menaf Osman: Bêguman sedemeke sereke derengketina bajarvaniyê ye di Kurdistanê de. Belkî bajarên herî kevn di welatê me de hatine avakirin. Lê di rengê tîkiliyên civakî de û serx-webûna kesayetiye de ji nîrxên bendên civakê yên eşîretî û feodalî; bajarvanî pir dereng ha-tiye welat. Li gel vê jî bindestî, koledarî û ew bend û qedexeyên ku li ser ziman hatine danîn û heta niha jî berdewam dikin, li pêşiya me ke-lemên herî mezin in li pêşiya pêşketina wêjeyê, bi giştî û bi taybetî jî li pêşiya pêşketina ro-mana kurdî ya nûjen. Ya rast ew e ku ev ke-lepora dengbêji û helbestê jî ji mecbûrî mezin bûye û valahiya romanê jî dagirtine. Ji ber ku beşa çandê ya ku herî kêr ji qedexeyên dij-min û serdestan bandor dibûn ew bûn. Ne bi hewceyî nivîsê û ne ji çespendina rayedarên devkî bû û bê zehmetî digiha her kesî/ê jê fam

dikir. Û em bala xwe didinê niha çiqasî ku wêjeya nivîskî û bi piranî jî roman û çîrok bi pêş ve diçe, kelepore dengbêjî û çîrokbêjiyê jî ew qasî bi şûnde vedigere. An jî bi şeweyekî din mirov bibêje, vedigere sînore xwe yê asan. Lê belê her dem jî xurtî û hêzeke bingehîn dide romanê. Ya rastî romana kurdî, çiqas bi derengi ketibe jî, kurd di nivîsandina romanê de pir dereng neketine. Bi kêmanî jî cîranên xwe yên tirk û ereb û ecem, wan jî di heman wextê de dest bi nivîsîna romanê kirine. Lê mixabin bi zimanê serdestan nivîsîne. Ne bi kurdî. Ev jî êş û pîrsgirêkên hemû wêjevan û romanûsên kurd in ku heta niha xwe jê xelas nekirine. Romanûsên kurd ên ku niha tenê bi kurdî dinivîsin pir pir kêmanî in. An jî ez wilo dizanim. Belkî ez şaş bim jî, lê ji min ve wilo tê xuyakirin. Piraniya wan du zimanî, sê zimanî, heta çar zimanî ne. Di nêrîna pêşîn de ev yek mîna maldariyekê bê xuyakirin jî, di rastîya xwe de ne wilo ye. Ji ber ku vê yekê perçebûneke kûr di ruh û hişmendiya wî/ê de çêkiriye. Ya herî xerab jî ew e ku bi çend zimanan zanibe jî, kurdî li ba wan zimanê din ê herî qels e. Yê ku herî dawiyê di mezinahiya xwe de hîn bûye û bi helwesteke xwe ya şexsî û jî ber ku ew zane xwendevanên wî/ê jî ji wî/ê hîna xerabtir in di vê perçebûnê de, nikare têkiliyeke sererast û têr bide avakirin bi wan re û her dem hêleke xwe kêmanî dibîne, kulek di dilê wî de dimîne, li xwe baş ewle nabe ku nivîs wê bi zimanê kurdî derdên wî, fikr û hestên wî bi temamî bigihîne xwendevanên wî/ê. Bi kêmanî hestên min bi vî awayî ne. Her dem ez kêmaniyekê di xwe de, di nivîsa xwe de hîs dikim bêtir ez bizanim bê ev kêmanî çi ye. Û ev yek êşeke mezin dide min, min dehf dide ber bi zimanê serdestan ve ku ez pê binivîsim, jî ber ku ez baş dizanim bi wan zimanên ku min perwerde pê dîtiye ez ê derdên xwe, xewn û xeyalên xwe bi şeweyekî hîn xurtir bigihînim xwendevanên xwe.

Omer Dilsoz: Dînamîkên bajarvaniyê helbet ji bo bigewdebûn û qelewbûna raman - romana miletekî xwedan kartêkeriyeke bê payan e. Jixwe ev qebûleke giştî ye û jixwe gava em li zayîna romanê jî dinihêrin aşkera ye ku bi kawdana bajarvaniyê re hevtamen e. Helbet, jî bo kurdî jî ev qaîde -kêfa min gelek bi qaîdeyan nayê jî- lê mixabin lê ye. Lê, heke mebest jî bajarvaniyê dahênana çandêke homojen be,

dinavhevketi be roman mimkûn e wekî ber û berhema vê lihevketinê jî wekî pêleke nû ya ramanî jî xwe bide der.

Kelepore dengbêjiyê yan jî rewacbûna helbesta klasîk jî bo romana kurdî dibe ku di warê vegotinê de hinekî kartêker be, jê pê de, roman jî wekî her çejnê nivîsê bi demê re, bi bikarhênanê re wekî avekê cuha xwe vedike. Jixwe her çejn di cuha xwe re diherike. Nabe ku em bibêjin romana kurdî di cuha dengbêjî û helbesta klasîk re biherike, lê mimkûn e jî van cuhan av bête navê. Ev jî gelekî normal e. Jixwe kelepore dengbêjiyê di vî warî de jî bo hûnandin û xemilandina zimanê romanê di heman demê de mimkûn e avantejêke gelekî bikêrhatî be jî. Jixwe her ziman, jî bo dahênana ramana xwe dînamîkên xwe yên dêrîn û kevnare bi kar tîne û ayîndeyê li ser wê ava dike. Romana kurdî nabe ku bêtir tevî tevî nên civaka xwe bi bejn û bal bibe. Yanî, di vir de pirs ev e: Gelo, em ê hişmendiyeke ‘modern’ jî derve binin/ithal bikin, an em ê li ser dînamîkên xwe pêşeroja xwe ava bikin!?

Şener Ozmen: Nexêr, “tekane sedema vîrînbûna Romana Kurdî, sazînbûna dînamîkên bajar û bajarvaniyê” nîn e. Helbet, ev jî sedemek e, lê di baweriya min de ne sedemekê bingehîn e. Ne ez dikarim bi tenê vê yekê wekî sedemekê bipejirînim û ne jî mêtûya gelê kurd vê yekê dipeyitîne. Li wêjeyekê bifikirin ku bipêşveçûn an bipaşveketina wê, di destên Zeûsan de be; sizayên ku hatine birîn, jî sizaya Sysphosî ne kêmtir û ne jî siviktir in. Ango, rewşenbîr û wêjevanên me yên berê, ne jî kêfa xwe û ne jî ji bo ku egoyên xwe tetmîn bikin, rabûne û çûne tevî bizavên siyasî bûne, tim û dayîm hewl dane ku gelê xwe ji bindestiyê derînin. Armanca wan a sereke her ev bûye:



Pêşiyê têkoşîn, bi dû de jî, anga heke wext ma, kar û barên wêjeyî yan hunerî. Min hevoka “heke wext ma” jixweber bi kar neanî, bi vê yekê dixwazim bêjim ku; romanxwendin jî, romannivîsandin jî, bi wextê ve girêdayî ye, bi gotineke din, bi boşayiya wextê ve. Û nebêje tu

dê çi biki? Jixwe mêjûya wêjeya me baş rêyî me daye ku, gelek wêjevanên me, ji ber dijiwariya şert û mercên li welêt û her weha li derveyê welêt, ji rev û lez û bez û teqereq û şer û pevçûn û pirsgirêkên xwe yên siyasî, her weha ji ber pêkutî û zor û zep û tehdeyên polês û leşker û sîxuran, wê derfeta lêhûrbûnê yan bi dest nexistine yan jî, piştî navbereke dirêj bi dest xistine û ji me re çend berhemên bi nîrx hêlane.

Dixwazim li vir qala sê wêjevanên kurd bikim û di heman katê de balê bikişînim ser jiyan û qedera wan. Yek jê Hesên Qizilcî ye (1) ku me ew bi pirtûka wî ya çirokan “Kenê Parsek” nas kiribû. Qizilcî jî, fena gelek hevrêyên xwe, bi pirsgirêka gelê xwe ve mijûl bûye û di vê oxirê de jî çûye. Ji çirokên Qizilcî mirov têdigihiye ku, asta wî ya wêjeyî gelekî bilind e, bi gotinên Hêmin Mukriyanî ku di pêşgotina xwe de dibêje; “Xwendevan bi ciwanî têdigihe, Mamoste Qizilcî heya bi çi radeyê şarezayî, zanistî, rawanşînasî (psikolojî) ye û çawa giyanê pêlwanan nas kiriye û çûye kûriya dîl û hînavên wan.” (2) Çi pê kirine? Çi pê hatiye? Çu kes nizane! Lê tiştek heye ku ne dîrî civaka me ye, em pê dizanin ku ne bi tenê rê li ber siyaseta kurdewar hatiye girtin, di heman katê de mêtîngeran, rê nedane me ku em bi wêjeya xwe ve mijûl bibin. Her duyên dinê jî, ji nîfşê Hawarê ne; yek jê Osman Sebrî ye û yê din jî Nûredîn Zaza ye. Ango dîsan derbederî ye, mişextî ye, heps û zindan in. Û heke em bîr ser avabûn û sazûna bajar û bajarvaniyê, di vir de xeleta herî girîng, hest in, raman in, hîzr û bîr û boçûn in, her weha têkiliyên girift in. Bajar û bajarvanî, bi bilindbûn an zêdebûna zîreavahiyên nîzanim çend qat, peyarêkên ku bi ferşeberên şayik hatine lêkirin û hejmara otobûsan nayê pîvan. Bajarvanî, hiş û çandekê jî bi xwe re tine. Ew hiş û çand, awayê teyê jiyanê diafirîne. Tê de xwendin jî heye, nivîsandin jî û bêguman rexne jî. De tu were, wan kes û kesanên ku xwediyê xwe û vî hişê ronak in, biqewirîne û berê wan bide sînoran!? An na bikuje...

Lê her gava ku ev pirs ketiye holê, pirsin din jî jê zayîne. Aya roman, çima di nav kurdan de bi pêş neketiye? Ma rast e ku romana kurdî, li Sovyeta kevn û li Swêdê şîn bûye û îro li Bakurê welêt geş dibe? Danêrê romana kurdî ya modern Mehmed Uzun e yan na?

Mehmed Uzun gerdişperest bû yan avant gardê? Heke ku em bi argumanên E. Hobsbawm û T. Ranger (3) berê xwe bidin pîrsa gerdişê, em ê tûşî gelek pîrsên dinê jî bibin; wek têgiha “gerdişa dahênandî”, ji ber ku Hobsbawm û Ranger, bi me didin zanin ku, gerdiş tîndarîyan an jî bi gotineke din, “çêkirin”. Di vê çarçoveyê de jî, balê dikişînin ser wan gerdişên ku di asteke formel de bi dem û dezgeh bûne, hem jî, wan gerdişên ku di nav çend salan de (wek Mehmed Uzun û romanûsiya wî) derketine holê û bi lez û bezeke nedîtî jî di nava civakê de bi cî bûne. Û dîsan, her gava ku pîrs daketiye ser modern û pre-modernê, nîqaşên li ser bajar û bajarvaniyê jî ji nû ve rû dane. Remezan Alan, di lêkolîneke xwe ya di der barê romanivîsîna Mehmed Uzunî de weha dibêje; “Kurdan jî romanê, di nav wê çanda ku bi modernîzasyonê hatibû veguherînê de nasînin. Yanê romanê, bêirada xwe, rasterast nasînin.” (4) Ango, weke gelek tiştên ku di bin navê modernîzasyonê de bi me kurdan dabûn nasînin/qebûlînin [fena şoreşa zimên û kûmîk û cilûbergî] roman jî, bi heman teherî hatibû nasînin. Bi vê re, R. Alan xwestiye ku trajediya me destnîşan bike, wek “rewşa kevneşopê” û “çarenûsa çandê”; “Belkî îro sedemên romanivîsandina kurdan pragmatîst e; baneka temasa çandekê ye...” (5). Gengaz e, lê bi raya min romanûsên kurd yê îroyîn, ne bi tenê ji bo parastina ziman û çanda xwe dinivîsin, tew ez dikarim bêjim ku ne ji bo vê yekê têdikoşin, ji mêj ve ye ku pêşaniyên wan hatine guhertin. Di vî babetî de nêrînen ku pîr hindik nêzîkî hev in û piştigiriyê didin yek û du, derdikevin pêşîya me. Mînakeke mathêl e nivîsara Maruf Yilmazî, ku ew jî di heman kovarê de, ji bo heman romanûsî nivîsiye; “Îro (Sala 1998, Ş.Ö.) hejmara romanên ku bi Kurdî hatine nivîsîn, ji hejmara romanên destekî ne bêhtir in. Herçendî çend roman hatibin nivîsandin jî, romana Kurdî ya nûjen tune bû.” (6) Naxwe ne aferîn ji me re! Ne aferîn ji me re ku heya berî vê nivîs û nêrînê, me romaneke nûjen neafîrand. Sed heyf û mixabin! Û dîsan li wêjeyekê bifikirin ku yekem romana wê ya nûjen berî bi çend salan hatibe nivîsandin. Baş e em qala çi dikin? Kîjan kevneşopê?

Nexêr, “tekane sedema vîrnîbûna Romana Kurdî, sazûna dînamîkên bajar û bajarvaniyê” nîn e. Wekî ku min li jor got, ev ji sedem

mek e û îro çu kesî bi qirika me ne girtiye ji bilî me.

Û pirsar we ya duduyan. Gotinên Ebdurreqîb Yûsivî tîn bîra min. Di nivîsareke xwe de digot, “Miletê keleşor nebit wê bî binaxe ye, wek xaniyekê bî binaxe (esas) û yan wek Kak Hesenê Heme Sorê Dibaxçî li Silêmaniyê gotî, ‘Keleşor tapu we... Tapuwa miletî ye...’ “ (7). Helbesta klasîk, hem wekî form û hem jî – nexasîm – wekî hiş û bîr û boçûn, ji kawdana ku dengbêjî û çîrokbêjî lê peydabûye, gelekî bi dûre. Wekî ku ji navên wan jî diyar in, dengbêjî jî, çîrokbêjî jî, li ser çalakiya “bêjtînê, pev û gotinê” ava bûne, ango ne li ser çalakiya “nivîsandinê”. Lê ez dikarim bêjim ku, ew bandor bandoreke erênî bû. Bo minak, gelek berhemên Feqiyê Teyran henin ku, bi devê dengbêj û çîrokbêjan gihîştine ber destê me. Lê di demên modern de me ne dengbêj mane û ne jî çîrokbêj. Çendên mayîn jî, bûne dimenine turîstîk.

Di romana cihanê de gelek caran bo eşkerekirin, zexmkirin û zelalkirina fikreke hunerî û pêleke fikirdarî roman hatiye tercîhkirin. Ji ber ku kêr zêde roman berhemê veguherîna çand û hunerê ye. Romana kurdî çiqasî pal û pişt xwe dide fikreke hunerî, pêleke fikirdarî yan jî di kesayet û civakê de veguherîneke çand û hunerî? (Mebest ji fikir û pêlan ne ev e ku romanê bike xulamê xwe)

Edîp Polat: Jixwe fikrên min ên li jor, min anîn mijara vî pirsar we; eşkerekirin, zexmkirin û veçîrandina hîzreke hunerî, pêla hestekê. Çand û huner bi çi xweşik dibe? Me ev pîrs kîngê ji xwe kir, wê gavê em dî bibêjin çawa kesên ewropî ne hewce ne bi pêkenokên me bikenin, wisa jî pêdiviya wan tune ji wêjeya devkî, şoxa edebî bigirin an bi dengbêjên me re serê xwe biêşînin û “ahî, ahîîî” bikişînin. Ev kirû taybetiyên me tenê ne, lê ne ku tenê me bihîzîrin û me bidin girî. Piştî ku me dinya bi vî şerê sî salî neda girî, em dî kîngê coş û heycanekê bi dest bixin? Pozşewitîna nûser, gava serokê neteweyekê cih ji danîna balafira xwe re nedît, divê alav bide. Heke ne xema me be ku dinya li serê serokekî kurdan kirin tara bêjîngê, em dî herin wê çaxê çîroka pêncsed sal berê binivîsin! Yek dewsa yê din dadigire keko! Min jî çîroka Rîstem heşt sal berê nivîsî, ji ber ku xelkê ew dikir malê xwe, lê niha êdî

dîroka klasîk bes! Fîkr û pêlên hestan carna romanekê dikin xulam, bila be, lê ger huner hebe... Ragihandin, coş, pêkenok, êş û elem, qedernivîs, trajediyên nedîtî û nebînayî bi awayekî estetikî dikarin bi kurdî jî biherikin.

Lokman Ayebe: Ji bo vî pîrsê di romana cihanê de minak herî balkêş romana Jean Paul Sartreyî ya bi navê “La Nausee” (Dilxelin, bi tirkî Bulantî, Kovara W) ye. Sartre bi vî romanê û bi lehengê xwe Antoine Requentînî romana existentialîzmê gelekî xweşik tîne zimên. Lê me li jor -ji ber sedemên hundirîn û derveyîn- romana xwe weke “romaneke vîrnî” bi nav kir. Jixwe bi navê xwe kifş e, vîrnî! Em hîn li ser hebûn û tunebûn, rabûn û ketina wê nîqaşê dikin, di vî rewşê de romana me wê çawa bikaribe pişt xwe bîspêre fikreke hunerî û pêleke fikirdarî? Xwezî tişteki weha hebûya lê mixabin tune ye. Jixwe haya gelek romanûsên me jî ji vî mîsyona romanê tune ye. Ji wan heye roman celebekî nivîsandina bîranînan e. Hema çî bi serê wan de hatibe, beyî ku tevne tevle bikin, ramanekê tê de bi cih bikin û metodeke nivîsandinê bi kar binin hema yekser rû dikin ser kaxez...

Menaf Osman: Rast e, her pêleke fikrî, hunerî hewcebûna wê bi romanê heye da ku di civakê de belav bibe û di binyata wî ya çandî de cih bigire. Roman hewceyî pêleke fikrî ye ku bikaribe hilavêtineke hunerî nû bike, di civakê de çêbike. Romana kurdî di vî hêlê de sûdewar e. Ji hêla ramanî ve pêleke fikrî ya pîr xurt heye ku pala xwe bidê. Şoreşêke siyasî û çandî li dar ketiye û ev çil sal e tekoşîneke rizgariyê xurt tete meşandin. Gelek sazîyên siyasî, çandî, ekonomî, civakî û zimanî bi xwe re pêş



de xistiye û bi êş û kedeke mezin be jî, şoreşêke siyasî li ber encamdayînê ye. Di vir de ya rast ew bû ku bi giştî huner û bi taybetî jî roman roleke pêşevantiyê bike, di vî şoreşê de. Ango berî hemû sazîyên leşkerî, siyasî û civakî diviyabû ku romanûs vî nûbûnê bibîne û berî her kesê/i vî mîzgîniyê bide gel, bi riya romanên xwe. Di tevahiya cihanê de guhertinên

civakî wilo dibin. Despêkê romanûs û huner-mend agirê ewil pê dixin. Çirûska ewil ji wan derdikeve. Ji ber ku ew ji her kesî/ê bêhtir he-sastir in, dilên wan tenik in û xwedî pêşbîni-yeke kûr in. Lê mixabin romanivîsiya me pir dereng ket. Civaka me, çi ji hêla siyasî ve, çi ji hêla hunerî û çandî ve pir bi şûn ve maye. Ev pazdeh bist sal in ku di vî warî de xebat hene, lê pir kêr in. Roman jî yek ji van xebatên paş-demayî ye. Paşdemayî jî dezavantajeke mezin e ji bo romanivîsan. Ji ber ku ew jî mecbûr di-mînin ku li dû van pêşketinên siyasî û rêxis-tinî herin. Ku wer dibe jî, roman xweserî û rola xwe ya ronîkirinê winda dike. Şûna ku rê ronî bike, mîna tayê ku li dû derziyê diçe, di riyeke ronî de dimeşe, şûna ku pêleke fikrî hunerî ya nû rake ser milê xwe û pêşiya civakê û siya-setê veke, dibe amûreke basît ji amûrên pro-pagandayê, yan jî xweberî dikeve wî warî û haysiyetên xwe yên hunerî yên sereke winda dike. Bêbandormayîna wê jî ji vî ye, li gorî nê-rîna min. Em bala xwe bidin romanivîs, çiqasî jêhatî û afirandêrekî nû be jî, çiqasî nûbûnê bi kar bine jî, ji vî rewşa hanê dernakeve. De-rengmayîna wî/ê ew mehkûmî vî rolê kiriye û heta ku nekeve pêşiya temamî saziyên rêxis-tinî, siyasî û civakî û wan li dû xwe nehêle, dê her dem di vî rola 'alîkar' de bê xuyakirin, rola ronahîkirinê ji her dem dê xewneke nepêkhati be ji bo wî/ê. Di romana kurdî de û bi taybetî di van çend salên vî dawiyê de gelek romanên ku nûbûneke civakî û pêlên fikrên hunerî yên nû hildidin dest, hatin nivîsandin. Divê mirov heqê wan nexwe. Lê çawa ku min li jor da xu-yakirin jî, ev meşa kulek li dû qonaxê, wan bê-bandor dike. Çimkî tiştêkî ku di wextê xwe de nebe, çiqas baş be jî, 'derengketî ye' li ber çavan.

Omer Dilsoz: Romana kurdî ji civakeke ku di kaosê de ye dizê. Ji ber wê fikra romana kurdî ya îro –bi ya min- kaos bi xwe ye. Li xwe digere. Aliyekî bi temayên sembolîk û surea-lîzm, aliyekî realizmeke kavîk û xav, aliyekî postmodernîzm û di navê de jî çanda derwêşî –medrese- û ya sofîtiyê, heta bi mîrxasî û hebek jê romantîzma dengbêjiyê romana kurdî di nava babelîska xwe de vegirtiye û tîne û dibe. Ango, tam kaosek e. Romana ku jî deng û rengên civaka xwe bi gewde dibe, di vî ne-qeba kaosê de –bi ya min- bê nasname ye. Ez dibêjim, divê mirov romana bi kurdî di kate-

goriyeke nû de binirxîne.


Şener Ozmen: Û gelek caran, tenê ji ber vî nexweşiyê, wî/wê ew berhem tîk ji biriye. Ango, di wan demên ku felsefeyê tîra raveki-rinê nekiriye de –ma gelo pêkan e ku felsefe tîra ravekirinê neke!?– roman bûye amûrek, rêyek, derfetek, xwepêregihandinek. Gelo kîjan jê tamdar in? Romanên J.P. Sartre yan ramana wî ya felsefî? J. P. Sartre ramana ek-sîsyantalîzmê di hemû berhemên xwe yên wê-jeyî de (çi roman û çi jî şano) welê bi cih kiribû ku, mirov nema dikarî xwe ji bandora wê xelas bike. Her weha romanên Umberto Eco, diviya ku tu bi komeke ku ji semîyolojîstên herî zîrek pêkhatî, dest bi xwendina romanên wî bikiran, angone bi tena serê xwe. Dema em li çavkanî û jêderên ku tenê ji bo romanekê dane hev di-nihêrin, mebesta wî jî zelal dibe. Bê şik dika-rim bêjim ku di romanên Mehmed Uzunî de ew raman, humanîzm e. Mehmed Uzun, her mîna Yaşar Kemalî, xwe spartîye mirov û hez-kirina mirovî. Di vegotinên wî de zereya bîrdo-ziyê tune ye. Ne sext û ne jî dijwar e Mehmed Uzun. Modernîst e, ji lew, li hemberî hemû ve-gotinên ku xwe sipratine dihumanîzmê, hez nekiriye. Ne tenê wek romanûsekî, wek lêkolî-nerekî jî pûte bi dihumanîzmê nedaye. Min di nivîsareke xwe ya ku vî dawiyê di kovareke frensî de [La pensées de midi, Actes sud, Hej-mar: 29, 2009] bi frensî derçû de, qala vî tî-kiliya ramyarî kir.

Digel vî yekê, di berhemên romanûsê kurd Helîm Yûsivî de jî pal û pişt dayinê bêhtir, mirov pêrgî pal û piştîşkenandinê tî û bi ya min, ev ji ramana humanîzmê û jî mîjûya wê jî balkêştir e. Yûsiv, vegotineke dijî vegotina humanîzmê afirandiye, îronî, di berhemên wî de bûye gurzê Rîstemê Zal û qasî digere dadi-weşîne tepîka serê me. Zîmanê Yûsivî agresîf e, lew hemû lehengên wî obsesîf û sîrqûn in, li dijî pergale ne û naxwazin kedi bibin yan li ci-hekî bihewin. Her weha, di berhemên Hesenê Metê de hûn ê pêrgî ramanên mîstîk bî. He-senê Metê, ramana mîstîsîzmê bi îroniya xwe ya xweser şên kiriye. Bavê Nazê realîstekî dij-war e, lew hinde xurt û jixwebawer e. Firat Ce-werî septîk e, angone gumanber e. Romana Remezan Alan, "Saturn" romanek e binyatî, angone struktural e. "Leyla Figaro"ya Îbrahîm Seydo Aydoğan xwe bi eksîstansiyalîzm û nî-hîlîzmê dide der. Jan Dost jî gelek hêlan ve tî-

koşer e, di romanên wî de hesta kurdewariyê tevli ramana sosyalizmeke –ev hesta dadxwaziyê ye û bi ya min pir balkêş e– optimîst û utopîk bûye. Helbet ev xwendinên min in û ji bo xwendinekê jî ne qayîde ne. Bi kurt û kurmancî, romana kurdî ji ramanê dûr neketiye û îro jî hemû deman bêhtir ber bi ramanê ve diçe.

Roman tenê beşeke yan jî demeke jiyanê vedibêje û bi vê yekê re jî jiyanê bi sînorkirî û bi tiştê dixwaze bibêje jî re yekîtîyekê saz dike. Em bi çavlêgerîneke giştî li romana kurdî binihêrin, di romana kurdî de rewşa leheng û sendromên ku encamên vê sînorkirin û yekîtîyê ne çawan in?

Edip Polat: Ew gotin jî bo kurteçîrokê tête gotin, dibe ku çend dem an çend beşên jiyanê di romaneke de bin (romanên lehi). Lê bi piranî helbet tixûb jî jiyanê re çêdike, ev xwezayî ye. Yekîtîyekê, tiştêkî şênber, fikreke rêveber di encamê de tine der an na? Heke postmodern be dibe ku neyane jî. Rewşa hin lehengan û vê sînorkirinê (tu dibêji sendrom, lê ev peyvek tûj e, carna mistek jehrî jî dibe derman) li jor hat gotin. Çi asoyan dûr û kûr dike, gotinê diherikîne, xwendevên bi nivîskar re hêç û serxweş dike? Navên alavan, tişt, der, çol û çiya, ajal û nebat, cure bi cure rewş, tirsonekî û mîrxasî, hezkirin, eşqa bêbersiv, rewşên kedayîna evîndariyê, hezkirina welatekî (lê ne tenê ev), hal û mercên zehmet, birçîtî, tazîtî, gunehkarî, pîrozî, şerm, rûmet, xwebiçûkdîtî, serbilindî, xewn û xeyal, li benda serkeftinekê, dîlzîzî, dilkevirin, nazenînî û hwd. çi afat di pêncî salên dawîn de bi serê me hatine? Lê em çi qas xwe jê dûr bixin em dikarin romanên xweşik binivîsin. Belkî jî nîfşê me yê ku ji vana re bûye şahid, ji ber ku di bin bandorê de dimîne nikaribe serkeftî be. Mijar gelek in, xurt in, bihestiyar in, pîrsgirêka mijarneditîne bo nûserên me nîn e. Lê nêrîn û vegotina herêmi li pêş e, em dê çawa rizgar bibin jê? Peyva “sendrom” na, lê werin em çavekî li çend benden bigerin: Peyvên herêmi, dîroka kurdan bi terzê siyasî, tenê dengbêji, terzê çîrokbêjiyê, gotina derdê takekesî, pêkenokên herêmi, vegotina tilidîçavde,



ne xweşikbûna peyvê, lê bêtir balkişandina ser mijarê.

Lokman Ayebe: Di romana cîhanê de gelek leheng hene ku mirov dibêje qey ewana bi rastî jî jiyanê. Mînak navê Mr Bloomê Joyce, Oblomovê Gonçarov, Raskolnikovê Dostoyevski, Martin Edenê Jack London, Înce Memedê Yaşar Kemal jî tune de bi qasî navên nivîskarê xwe tînin û bi nivîskarê xwe re bûne yek. Ligel vêya em rêya xwe dagerînin ser romana me em dibînin ku “lehengên” romana me tev şerpeze û derbeder in. Na, ne ku ji ber romanûsan ew şerpeze û derbeder tewsîr kirine, ji ber ku weke “leheng” bi awayekî hatîne karakterîzekirin ku tîpolojî di wan de pere nake. Tu dibêji qey hemû “leheng” yek in û bi tenê navên wan cuda ne. “Lehengên” romana zimanekî giş bişibin hev ev jî bo wê wêjeyê hetkeke mezin e. Ji aliyê fîzyolojîk ve gelekî bedew in, jîr in, mîrxas in, kê di çav xwe re radîkin bi dest dixin, ji wan re “nabûn” tune ye, tev “tîpên îdeal” in lê belê bê psikolojî û bê giyan in. Nola peykerên mermer in. Pir xweşik in lê bê can, bê derûnî û bê liv in. Ev dûrî

rastiya xwezayê ye. Ji ber vêya jî mirov bi hêsanî dikare bibêje di romana me de hîn leheng û karakter neafirîne, ew li hêlekê, hîn xweşikî tîp jî tune ye. Li dewsa wan di romanên me de tîra xwe kûkla hene û benikê wan di destê me de, em gora dilê xwe wan kilo mîlo dikin. Ji ber vê pîrsgirîkê jî romanên me li hemberî vegotina sendrom, trajedî û tîkçûyînên jiyanê qels tînin û di bin vî barî de tînin xwarê. Di rêya bîdestxistina qodên yekîtîya rewş û kêliyên civakê de em bi ser nakevin...

Menaf Osman: Rast e, nêrîna min jî wisa ye. Mijara her romaneke jî hêla dever û demê ve bi sînorkirî ye. Ji hêla civakê ve jî pêdivî tenê bi beşeke biçûk ji civakê heye. Heta çawa ku di gelek mînakên dinyayê de hatiye xuyakirin jî, roman dikare tenê li ser çend saetên ji jiyanê merivekî bête avakirin. Lê belê çawa ku tête zanîn insanek bi tena serê xwe jî mîna dinyayekê ye, Bi kûrbûn û xurtbûna xwe jî hebûneke bê sînorkirî e. Lewre eger bikaranîna wê mijara bi sînorkirî jî hêla dahûrîna derûnî, ruhê, hestewarî, fikrî û ji hêla wateyên jiyanê ve pêk were, dê bêsînoriyeke mezin bide romanê û wê

ji qadeke herêmi, neteweyî teng derbixe qadeke cihanî ku her kes xwe tê de bibîne û ji hêla demê ve jî, dê sînoran derbas bike, bibe klasikeke ku li her derê û di her wextî de bête xwendin û sûd jê were girtin. “Perişanên” Viktor Hugo, “Sor û Reş” a Stendal, “Sûc û Cezaya” Dostoyevskî û “Înce Mehmed”ê Yaşar Kemal jî bêsînorîya xwe ji vê yekê digirin. Demî, deverî, jiyani, fikrî be, sînorên herî teng ên şivanekî berxikan e. Lê dişa jî bi mijareke wilo Paulo Coelho, jiyani û fikreke bêsînor vegotiye di “Sîmyavan”a xwe de. Hinek caran dibêjin ku heger mijara romana kurdî ji nîrxên xwe yên herêmi yên teng derkeve, dê kariye derkeve asteke ber jor û cihê xwe di nav romana cihanê de bigire, yanî li gorî wan, mijara jiyaneke gundiyekî Kurdistanê derfetê nade nivîskar ku romana xwe bi fikreke zexim û mezin biafirîne. Li gorî min ev nêrîneke pir şaş e. Helbet bandora mijarê li ser romanê heye. Heta gelek romanên dirokî ku şexsiyetên mezin hildane dest, bi xêra wan qehremanan hatine naskirin. Mîna “Keleha Alamûtê”, “Ramsês”, an jî “Pirtûkên Selahedîn” yên Tariq Alî. Lê belê di gelek romanên de mijar û qehremanên wê çiqasî mezin û navdar bin jî, kûrbûna nivîskar di jiyane de hiştiye ku hêza romanê rastiya wan qehremanan derbas bike û hêzeke nû tevli hêza wan bike, çawa ku Tolstoy di “Şer û Aştiyê” de pêk aniye û Eleksandrê xwe ji yê rastî çêtir daye xuyakirin û Napolyon jî ji rastiya wî xerabtir e. Yanî ez dixwazim bêjim ku mijar çiqasî bi sînor û lawaz bête xuyakirin jî, çiqasî herêmi be jî, nivîskarê/a xurt dikare berhemeke bêsînor jê biafirîne. Bi nêrîna min dikare ev şerê ku siha sal e tete meşandin di jiyani û nêrîna du zarokên Kurdistanê de bide diyarkirin. An jî gundiyeke, şivanekî, dayikeke me de. Bi ya min, hunera herî mezin jî di vir de ye. Û heger ku romana kurdî dê bibe xwedî xweserî û taybetmendiyeke balkêş, di vî warî de dê pêk bê. Ez di vê baweriyê de me

Omer Dilsoz: Roman tenê beşeke jiyane venabêje, ez wisa lê nanêrim; berevajiyê vê, roman jiyaneke ava dike. Romanivîsî, ne dengbêjiya li diwana mîr û axayekî ye ku hat û çû û dilê guhdaran xweş kir. Naxêr, roman dahê-

nana ramanê ye, bi xemekê radibe û bi wê xemê hewl dide temasê bi jêrhişê xwînerê xwe re bike. Pirsê lehengên romana kurdî jî ez bi kaosa ku ‘nivîsandina bi kurdî’ tê de digevize ve girêdidim.

Şener Ozmen: Têgiha “einfühlung”, têgiheke elmanî ye û bi kurtayî, tete wateya “wekhevîbûnê.” Di pêvajoya wekhevîbûnê de em xwîner an bîner, camidan, ango “obje”yan, ji hundir de kifş dikin û bi vî awayî serwest dibin. Lê, ev nayê wê wateyê ku tiştê ku em jê fehm dikin, camid bixwe ne, nexêr, em li dû hestên xwe ku me li wê camidê bar kiriye ne.



Ango, dema ku ez Sobarto dixwînim, xwe dixim şûna Silêmanî de, ê dişewite ez im êdî, ne Silêmanê lehengê romanê ye. Heman hest, di “Pêşmerge”ya Rehîmê Qazî de, her weha di “Jana Gel” a Îbrahîm Ehmed de jî li min peyda dibin. Û mînaekeke din, romana Mehmed Uzun, “Ronî Mîna Evîne, Tarî Mîna Mirîne”, belê di vê romanê de du lehengên serek e hene, Baz û Kevok, lê ji hêvîşikestinê pê ve tiştêki tecrûbe nakim. Tiştêki din jî heye ku min û Dilawer Zeraq qûş lê qetandibû, ew jî sendrom bû. Di romanê xwe de hîna jî me nekariye ku lehengên xwe, ji xwe xelas bikin. Pirsgerêk ev bû...

Best û fikra romaneke nû li ba te çawa peyda dibe? Bi derbirîneke giştî em bibêjin mijar; tenê derpêşkirina mijarê best û fikra te vedihewîne û dikewîne? Yan jî mijar dehîk û feqek e ku dixwazî te li atmosfer û newaya vegotina xwe bihesîne?

Edîp Polat: Tiştê ku peyvani dipijiqîne, jiyani bi xwe ye. Ne ku tenê mijar dibe sebebê bestrakirinê, lê ew jî sebebek e. Heta mijar tenê sebeba nivîsinê be, tete wateya romanûs li paş maye. Bûyereke ecêb tu dikarî bi vegotîneke nexweş, bi peyvên ji rêzê bilewitîni. Mirovek heye bi salan e nivîskar e, nikare jî nava bedena Diyarbekirê derkeve der! Kingê mirov newa û dorhêlê bi xwe biafirîne, ew gav mîna şewekarekî/ê ku ji niqteyekê berhemê biafirîne, mirov dîmenekî bi peyvani xêz dike. Stekana edebî ya di giyanê min de ewil tîji dibe beriya herikînê. Peyv û têgehên cihê û ecêb,

rewşên sosret carna dibin derzî û şûjin, min daf didin nav nivîsê. Ji bo kewandinê amadehî lazîm e, dosyayek heta çap nebe, ya duyem nikarim tekûz bikim. Romana min a dawîn ku hêj nehatiye çapkirin, ji wêneyekî dest pê kir. Tabloyeke sor ku xwîn jê dibariya! Ew gihişt sê hevalan sê dilsozan û çû salên 1988î yên Amedê û deh sal domiya.

Lokman Ayebe: Her çiqas di hundirê navê helbestê de “best” hebe jî, helbest jî te de ez di tu cureyên nivîsînê de jî rola bestê bawer nakim. Ew li hêlekê... Nivîsin bi jiyînê, bi rûbirûmayîna bûyeran, fantazyên mejî û bi xwendinên rekûpêk çêdibe. Divê aşê romanûsî bikaribe her tiştî bihêre. Divê haya wî/wê jî rojevê, jî siyaseta, jî dîrokê, jî civakê, jî felsefeyê, jî psikolojiyê û her çiqas ne bi pisporî be jî divê ji gelek beşên zanistê hebe. Erê tu roman bêmîjar nabe lê bi bawerîya min di romana nûjen de mîjar ne aktorê sereke ye. Tevî, şêwaz, bicihkirina ramanê, kronolojiya bûyeran, psikolojiya lehengan, teknîka nivîsînê, ziman û hwd. jî êdî di romanê de bi qasî mijarê cihekî girîng digirin. Mîjar, jî bo van xalan êdî bûye amûrek. Ez bi xwe berî ku îskeletê romanê di mejiyê xwe de neqedînim, dest bi nivîsandina wê nakim. Ew îskelet di kêliya nivîsandinê hêdî hêdî goşt digire û hîn nuh dikeve rû. Heger mîjar di vir de îskelet be, xalên din jî goştê ser vî îskeletî ne...

Menaf Osman: Bi Xwedê, ya rastî ez jî baş nizanim bê best û fikra romaneneke nû çawa çêdibe li ba min. Ji ber ku her car bi heman şêweyê ez nakevim rê. Carna mîjar bala min dikişîne û hêdî hêdî fikr û ramanên min komî ser hev dike, dimeyîne, dûre bi min dide vegotin. Carna jî xewn û xelayên min, fikr û ramanên min, min dorpêç dîkin û dihêlin ku ez jî xwe re li mijareke munasib bigerim da ku ez van hest û fikrên xwe tê de biteqînim, vebêjim. Carna jî bûyerek an jî çend bûyerên civakî bandoreke mezin li ser min dîkin, êşê yan jî şahiyê bi min didine nasandin û jiyîn. Ez jî nema xwe digirim, vê rewşa civakî ya ku pir tesîr li min kiriye û bang li min kiriye ez dawetî karekî, peywirekê kirime ku ez nikarim bi pratîkî bikim, mîna gunehkarekî ku bixwaze xwe bide efûkirin, ez radihêjim pê nûsa xwe û di şexsê vê bûyera bi sînora berteka xwe tînim ziman. Di çarçoveya hunera xwe de û bi alîkariya mijareke ku dikare li gor xewn û xeyal

lên min be rabe, ez dinivîsînim. Yanî ez dixwazim bêjim ku rîya min a ku ez tê re diçim ne yek e, çar e. Lê rêç û rêbaza min çî dibe bila bibe, encama ku ez digihîjimê yek e. Çi ye; gihiştina berhemeke hunerî ku berî kesî/ê min diguherîne, tiştên nû li min zêde dike, baldarî û hişyariya min a hunerî, estetîkî zêde dike û wateyeke jiyanî nû di nava kendavên dil û cegerên min de peyde dike. Jixwe ku nivîsa min, jî hêla derûnî û ramyarî ve min negihîne encameke wiha, ez dizanim û pê derdixim ku nivîsa min bê kêr e. Li gor bîr û bawerîya min hêmanên romanê jî hev nayên qetandin û girîngiya hîmekî carna derkeve pêş jî, nayê wê wateyê ku her car dê wilo be. Belkî careke din hîmekî din derkeve pêş û nivîsandin ew bikişîne, an jî wilo bê xuyakirin. Lê hîmên mayîn veşartî bin jî, rola wan ne kêmtir ya ew a ku sereke têtê xuyakirin e. Bi kêmanî dikarim bêjim ku ev rastiya nivîsa min e. Ango ez wilo dibînim. Belkî li ba nivîskarekî/e din bi awayekî din e. Ev ne tiştêkî şaş e. Jixwe pîvanên teknîkî di romanê de çî qasî yek bin jî, honandina her romanekê cuda ye û bi nîrxên hunerî yên cuda têtê avakirin. Ya rastî jî ev e. Ji ber ku girîng e her nivîskar xweserî û taybetmendiyên esas bigire heta ku huner û wêje derkeve holê. Yan na dê li şûna hunerê, teqlît û şopandina hevdu derkeve ku ev yek jî mirina wêjeyê ye. Û em tev dizanin ku huner û wêje her dem xweseriyê û taybetmendiyê dixwazin. Lewre romanûs bê xweserî û taybetmendi nikare wêjeyê biafirîne. Xweserî jî me re pir lazîm e. Ji aliyekî din ve ev jî heye; mîjar û best û ramanên mirov çî dibe bila bibe, ku mirov jî dil û can di nava dinyayeke wilo de hîs neke, atmosferê li gorî wê di kûrahiya dilê xwe de peyda neke, mirov nikare bigihîje armancên xwe di nivîsandinê de. Ku bû û mirov kete atmosferê wiha, êdî rîşma mirov dikeve destê wê atmosfera hestbar û mirov li gorî wê diçe. Hinek nivîskar vê yekê rast dibînin, hinek jî şaş dibînin ji ber ku serdestiya nivîskar jî serî heta dawiyê di hemû detayan de pêwîst dibînin. Ez jî vîna dûrî aqilan nabînim, lê car jî caran çûna xweberî li dû wê atmosferê jî ez şaş nabînim. Ji ber ku ew tişt e yê ku herikbariyê û taybetmendiyê dide romanê.

Omer Dilsoz: Hizra romaneke nû li nik min di gavekê de peyda dibe. Lê ev gav di heman demê de serencama lêkşilqiyana hiş û

xewna min e jî. Ez, di gavekê de li êşekê dialiqim. Belkî deh car e jî di ber wê re derbas bibim lê di gavekê de min digire nav pêlên xwe û bi xwe re dibe. Li hestên min dikeve, wana dihejîne, li hişê min dikeve, wî diarîne, di ruhê min dikeve wî diêşîne. Hingê derdekî min çêdibe, ez dinêrim ku ev derd bi civakê re jî peyda bûye. Lê ji bo min, serê pêşîn ez girîng im, vehejiyan û heriftina di ruh û giyana min periyayî girîng e. Spehîtî, dilzîzî, meraq, kelecane, xweşxeyalî, mendxeyalî, eşq û drama, lihevixistina bûyeran, avjeniya di nav hizr û bîr û boçûnan û lehengên bênav ên ez wan dibînim de, lê ew hay jî min nîn in, vana gişt bi min re besta romanê çêdikin û wekî çawa zarokek nû dinyaya derdora xwe keşf dike, bi wê kelecane li her tiştî dinêre, ez jî bi wê kelecane radihêjim kel û mercên xwe û dest bi rêwîtiya nav ruh û dilê insanan dikim û wana bi çavdêriyên xwe re tînim ba hev û bi xeyalên xwe re dişînim dinyaya wan û piştî jî bi kirasên nivîsê yên gerdûnî dinuxêvim.

Mijarê ez bi terazûya hizrên xwe diwezînim. Mijar, ji bo min bi qasî karakter û lehengan masûm nîn e, ew bi hûr û kûr tê bercesterkirin û bi xema min a civakê, jiyane û cihanê re teşe digire. Mijarên min, nêzî ruhê zimanê min in. Ez li ruhê zimanê xwe guhdarî dikim, kîjan êşan seh bikim ew jî bo romana min mijar in. Mijar bi ser ramanê ve ye, romanivîs gav bi gav, ta bi ta bi balkêşîyeke nedîda bi pey dikeve û li hemû çep û fetlên wê hişyariyê dike. Leheng, dibe ku hinekî bê kontrol be, dibe ku hinekî jî xwar û jî jor be, dibe ku leheng leng – di wateya manewî de – be jî lê mijar mecbûr e temsîla hizra nivîskarî bike. Heta ez dikarim bêjim ku gelek caran mijar lehengê xwe diafirîne, ji bo wê hevsenga çawanî û çilotiya lehengan rasterast girêdayî tekûzî û balkêşîya mijarê ye. Dîsa jî yê hem leheng û hem jî mijarê di bêjînga demê re derbas dike ‘vegotin û avasaziya’ roman/ramanê bi xwe ye.

Şener Ozmen: Min heta niha romanek nivîsand, ya duduyan jî qediya, bi xêr, dê ew jî çap bibe û bigihîje ber destê xwînerên kurd. Di destpêkê de belkî bi tenê peyvek, dîmenek, axaftinek, nûçeyek... Piştî dibe fikrek û xwe

li mejiyê min bi cî dike, lezê nakim, sakîn im, ew fikra ku bi cî bûye, heye ku ne fikreke zelal be jî, jixwe ne zelal e. Yekser dev jî wê fikrê berdidim û jî fikra romanivîsînê bi yek caran bi dûr dikevim. Çi dibe, aha di wê bidûrketinê de dibe. Hêdî hêdî wechê lehengê min diyar dibe, ew sistemêrek e yan jineke jêhatî ye. Û radihim, li ser deftera xwe ya nîgarê, portreyên wî/wê xêz dikim. Ji ber hizirîna xwe ya sînematomografîk, wech bi wech, dîmen bi dîmen diçim. Ew kî ye? Kî ne? Li ku diji/dijîn? Wê li ku bijî/bijîn? Bi vê jî bi ser nakevim, her tişt dişeqite, tê wer dibe û careke din dev jî vê fikra romanivîsandinê berdidim. Lê tiştêk heye, tiştêkî welê ye ku ew dev jî min bernade, wek psikanalîst jî dibêjin, mirov xwe spartîye nivîsandinê. Hemû mesele ziman e, ziman, ziman! Kurdî ye ew û têra her tiştî dike. Kurdî, hişê min li hev dixê, ez pê re sermest dibim û naxwazim jê derkevîm.

Di van demên dawîn de em dibînin ku li gorî demên berê bêtir roman têne nivîsandin. Bi raya te ev encam û nişaneyên çî ne?

Edîp Polat: Roman şeweya nivîsîna serdema me ya niha ye. Berê min helbest dinivîsî, lê ne serketî bûm, teng hat bo ravekirina hin hest û bûyeran. Guman dikim heta niha Nobel jî bi piranî ji romanûsan re çûye, ne-

xasim di van salên dawîn de. Belkî roman helbestê jî dihundirîne, dikare pê were nivîsîn jî. Roman dayika hemû cureyên nivîsê ye. Tu dikarî nûçeyekê, diyalogekê, hizrekê, fikreke felsefî, bûyereke sosret, buxtanekê, rastiyeke, rûreşîyekê, qehremanîyekê, serpêhatîyekê di nava romanekê de bîni cem hev. Lê ne di helbestekê yan çirokekê de. Mirovayetî li wateya hebûna xwe hêj digere, roman jî li pey bersiva pirsan e. Ev ger û mîraq her berdewam e. Mafir ku bajarvanî bi pêş dikeve, şeweya nivîsîna bajarvaniyê dibe ku winda bibe?

Lokman Ayebe: Di civaka me de jî bo afirandina romanên baş qod, potansiyel û dinamikên bêhempa û nivîskarên me yên dikarin van potansiyel û dinamikên baş bi kar binin jî hene. Ev, encama jî van dinamik û potansiyelan haybûn e û nişan dide ku wê jî vî erdî bîn-



derên baş bên hilanîn. Jixwe ev erdê romanê hetanî niha weha beyar mabû. Ev erda fireh e, bi hêviya ku yên tovê xwe li ser vî erdî bireşînin hîn pirtir bibin... Xisara pîrnivîsandîne tune ye, çiqasî pir bin ew qasî baş e. Jixwe dem wê weke gurekî har bi van romanên bikeve û bi rêya selectionê yên qels wê berbayî bibin û herin, ên xurt jî wê singê xwe hîn zexm di erdê de bikutin û navekî giran li dû xwe bihêlin...

Menaf Osman: Çand û wêjeya me pir hewceyê vê yekê ye. Qelsiya wêjeya me ya herî mezin di warê romanivîsiyê de ye. Romanên kurdî yên baş kêmin. Lê jixwe bi giştî jî pir kêmin in. Ez bi xwe aligirê nivîsandîneke pir im. Sedem û armanç çî dibe bila bibe, qalîteya wan jî çî dibe bila bibe, bila roman pir bêne nivîsandin. Çima? Ji ber ku nivîskariya kurdî bi giştî û roman, bi taybetî pir dereng ketiye û mîna zeviyeke ku bi salan şûv mabe, nehatibe çandin, hîna jî em nizanin ka kîjan hêla me berdar e, kîjan ne berdar e, kîjan nivîskar e kîjan ne nivîskar e, kîjan xwedî hunereke taybet e, kîjan jî rêzê ye. Ji bo ku ev tev ronî bibin û em baş xwe nas bikin, heta ku ji me bê em zeviya xwe tevî biçinin. Ji ku ve çiqas ber tê û kîjan ber baş e, bila derkeve holê. Heta ku dernekeve holê jî em nikarin bêjin dê berên wê halo bin yan jî ne halo bin, pêşdarazî jî ne rast e. Halbûkî ku mirov feqîr be, her derfet, her îmkân jî mirov re lazim e. Wêjeya kurdî hewceyê her teşeyê romanê ye. Mesela hînek cureyên romanê hene ku qet derbasî wêjeya kurdî nebûne. Bi wergerê jî em nikarin vê valahiyê dagirin. Pîrbûna romanên kêfxweşiyeke mezin bi min re çêdike. Lê kêmxwendin baskên min dişikîne. Tu raporên îstatîstîkî di destên min de tune ne, lê belê li gora jimara çapê tê xuyakirin ku xwendin pir kême e.

Pîrbûna nivîsandîna romanên bi piranî encama têkoşîneke civakî ya dûvdirêj e ku hêdî hêdî aj dide û kulilkên wê vedibin. Di warê çandê de, di vê qonaxê de, ya din jî, zimanê kurdî hin bi hin pîvanên rêzimanî digire û bi xêra amûrên ragihandinê (televîzyon, radyo û rojname) di nava civakê de bi şiklekî fireh belav dibe.

Li her çar hêlên welatê nivîskar jî, têkildarên wêjeyê tev jî ji hevdu, ji xebatên hevdu agahdar û serwest dibin, hêz û qewetê jî hev digirin û danûstendîneke fikrî di navbera xwe de pêktînin ku ev zengîniyekê jî bi xwe re tine.

Mirov dikare bibêje ku giranî û pirtirîn nivîsandîna romanên hişiyariyeke çandî û wêjeyî dide nîşandan. Weke em tev dizanin avaniya gelî û neteweyî tenê bi avakirina saziyên siyasî, rêxistinî û ekonomîk pêk nayê. Avakirin û pêşvebirina himên çandî, hunerî û wêjeyî, gelek caran jî himên dîtir hîn girîngtir in. Em tev baş dizanin ku hebûna me ya gelêrî ku bi sedsalan xwe li ser lingan girtiye li hember zilm û zor û înkara kedxwaran û heta niha em anîne, deyndarê wê çand û hunera mayî û gelêrî ku wenda nebûye û valahiya ku têkçûna siyasî û ekonomîya me çekiribû jî bi wê çanda me hat dagirtin û hebûna me parast. Loma niha jî girîng e ku himên xwe yên çandî û bi taybetî jî wêjeya xwe em pir xurt bikin. Romanivîsiyeke xurt hem pêdiviyeke civakî ya xurt e, hem jî hêzeke baş e ji bo nasnameya me ya çandî ya ku karibe xwe li ser lingan bigire di vê qonaxa ragihandinê de ku dinya tev kiriye weke gumalekî piçûk û bi riya vê yekê çand û wêjeya dewletên serdest ên mezin roj bi roj li hemû dinyayê belav dibe û çanda gelên şûndemayî mîna me dadîqurtînin, wan tune dîkin.

Omer Dilsoz: Ev encama pêşveçûnekê ye. Cesaret e. Kurd cesûr dibin, bi xwe bawerîya wan qewîtir dibe û êdî bi ramanan mijûl dibin. Helbet, ev dem û heyamên wisa yên navberê bi qasî ku ji bo pêşketinê û afirandina ber û berhemên heja tişteki baş be jî, di heman demê de dê bibe sedem ku gelek nivîsandînen bê kalîte jî li piyasaya kurdî zêde bibin. Lê qe nebe xwîner êdî bê alternatîf nîn in, dikarin a baş bigirin û ya nebaş rexne bikin û bihêlin ku qonax bi qonax ava aşê vî zimanî bigere. A girîng jî ev e.

Şener Ozmen: Nizanim!

Ziman, leheng, mekan, sêwirîn, pevgirêdan, şîrovekirin, dekor, diyalog, monolog, çespendina fikrekê, peyamên real û hwd... di romanên xwe de tu li ser kîjanî/kîjanan xebateke taybet dikî?

Edîp Polat: Ez bi gerîna li terzê xwe heta niha li ser lehengan û bûyeran kûr bûme, lê cih û dem bo min girîng in, mijara romanê jî xwendevên re dihêlim, di nava gotinan de vedîşêrim û di honandinê de li diyalogan bar dikim. Ne monolog, bêtir nakokiyên çêbûwar yên dialogan dibijêrim. Realîzm di serpêhatîyan de, di bûyerên li Kurdistanê diqewimin de heye û peyam di wan de noqbûyî ye jixwe. Xe-

batek taybet li ser yekê ji vana nakim, ne pêwîst e jî, lê belkî li ser van hemûyan. Bihevgerêdan kakilê romanê ye, minak deh sal berê min romana xwe ya bi tirkî der heqê gerîlayekî de nivîsibû, deh sal bi şûnde îtirafkarek (A.Aygan) derket, got bûyera “kujerên wan nediyar” ya ewil bi kuştina wî gerîlayî dest pê kir. Di sala 2003’yan de dewletê û qoriciyên xwe ji ber nivîsina wê pirtûkê bi qesta kuştinê êrişî min kirin. Jiyana wî gerîlayî û serpêhatiyên wî heta wê sûîqastê, bi hev ve girêdayî ye. Ew jî û ya Ristemê Zal ji otobiyografîk in, lê gelek bûyeran di hewînîn.

Lokman Ayebe: Ji bo romaneke baş derkeve holê ji van kirûyan yek jî kêm be nabe. Jixwe heger formula romanê hebe, ew jî ev e; bi hosteyî li hev sazîkirin û edîlandina van xalan e. Ku ji van xalan yek jê tune be yan jî yek lê nebaş hatibe sazîkirin wê di romanê de beloq bibe û wê romanê bikulîne. Ji bo akorta romanê xera nebe divê vana tev bi awayekî rekûpêk hebin. Ji ber wê jî ez çiqasî bi ser dikevim ez nizamim lê hetanî ji destê min tê, ez guh didim van xalan tevan.

Menaf Osman: Ya rastî ev tiştên te gotin, tev jî pir girîng in ji bo romaneke serkeftî. Kijan ji wana kêm be qelsiyekê dixwe romanê. Bi ya min bi xwe, ku qeweta min bigihîjê ez li ser van mijaran tevan disekînim. Lê qewata min gelek caran têr nake û bi piranî li ser hûnandina romana xwe disekînim û xebateke taybet ji bo wê dikim. Gelek caran ez dixwazim ji girekê dest pê bikim û hîna ji serî de gelek pirs-nîşan û baneşanan di serê xwendevanên xwe de çêbikim. Gelek caran pêdebûna yan jî peydekirina pirsên esasî di hişê mirov de jî bersivdayîna pirsan çêtir dibe. Bi piranî jî ez dixwazim ku xwendevan bi xwe bersivê bidin xwe, ne ku ez tişteki jê re bêjim. Ku ez bikaribim der heqê jiyanê de pirseke rast di hişê wî/ê de çêbikim pir girîng e li gorî min. Loma rengê hûnandina xwe û pêvgirêdana rûdanan li gorî vê yekê çêdikim. Ji hêla din ve jî ez pir li ser tîpên lehengên xwe disekînim. Çi erênî, çi neyînî her dem ez xwe dixim şûna wan. Û ez li xwe dinêrim ka gelo ez di şûna wan de bûma min dê çawa bikira? Ku mirov ne xwediyê tecrûbeyekê jiyanê ya dewlemend be, mirov di vê yekê de bi ser nakeve û mirov mecbûr dimîne ku li gorî texmîna xwe û zanebûna xwe ya esorîk binivîsîne ku; ev jî gelek caran lehengê

mirov dûrî rastiya jiyanê dixwe û şiklê tevgera wan pir sûnî û beloq di hêla. Carekê lehengekî min diviyabû ku bera kurîkê xwe yê sêzdeh salî bide ji malê, ji bo ku vê yekê bike, ez gelekî fikirim, min xwe xist şûna lehengê xwe û li gorî wê min sedemek ava kir ji bo berdana kurîk. Dûre ez çûm cem nasekî xwe yê xwedî zarok, min jê re got “filankes, kurîkê te halo halo kir tu dê çi bikî? Gelek tişt gotin lê negot ez ê wî ji malê biqewirînim. Lê min ji dostekî din jî pirsî, wî negot ez ê bera wî bidim, min ji yekî ditir pirsî ew jî wilo. Dûre min fam kir ku ez ne li gorî rastiya bavekî ku bera kurê xwe de fikirîme. Ji ber ku ne kurê min hene û ne jî ez bav im. Di rewşeke ku bavek bera kurê xwe bide hestiyariyê çawa pê re çêdibe jî ez nizamim, ji ber ku ez nejiyame. Vêca ne tenê ev, gelek tiştên din î ku min nejiyaye, ez nizamim li gorî rastiya civakî û rastiya lehengên xwe têkilî û bûyerên romana xwe bidime honandin. Mesela ku lehengên min jin bin, ez pir zoriyê tê de dikeşînim. Ji ber ku li hember her bûyer û rûdanekê berteka jinê ji ya zilaman cudatir e. Loma jî ku ez xwe dixim şûna wê, ez dikim nakim nêzikahiyê li gorî rastiya jinê zeft nakim. Loma min got tecrûbeyekê jiyanê ya kûr û fireh divê heta ku nivîskar bikaribe empatiyê rast bi lehengên xwe re bike. Yên min bi piranî beşa ku ez xwe tê de qels dibînim, ez xwe dûrî wê digirim, qehremanên min her dem nêzî min in, nasên min û jiyana min in û ew pir nêzî hev in. Dever û cihên ku bûyer lê diqewimin jî bi giştî deverên ku ez wan nas dikim heta ku girêdaneke min a taybet bi wan deveran re hebe, hîn çêtir e. Ji diyalogan bêhtir ji monologan hez dikim. Car caran şîrovekirin û verişandina cîhana hundirîn di nava lehengan de nakokiyê di dilê min de sinorên bêbiryariyê û aloziyekê baş dide ramanê û xwendevan bi xwe ve girêdide û nahêla bala wî/ê here ber bi cihêkî din ve.

Li ser meseleya ziman jî ez pir disekînim, lê ez baş dizanim ku qelsiya min a herî mezin jî di wî warî de ye. Heta ku ji min tê, ez bi zimanekî xwerû, sivik û jirêzê dinivîsim. Teşbîh, îstîtare û kinayeyan zêde pêk naynim. Axaftina ku ji devê lehengên min derdikeve, hîn bêhtir sivik e û zimanekî jî rêzê ye. Heta gelek gotinên ne kurdî yên ku di nava gel de tên gotin ez wan jî bi kar tînim. Li ser vê yekê rexneyan jî ez digirim. Bi bir û bawerîya min ev tişt ne şaş e û

zerareke wê nagihîje ziman. Armanca min ew e ku zimanê min jî ji her hêlê ve bête berfirehkirin.

Omer Dilsoz: Ez qet fikran naçespînim û jê hez jî nakim, peyamên real jî belkî ne karê romanên min be. Lê ziman, leheng, mekan, diyalog û monolog bi taybetî jî monolog jî bo min xwedan heyecanekê ne û serê xwe gelek pê diêşînim

Şener Ozmen: Hema bêje li ser hemûyan...

Di wêneyê giştî yê romana kurdî de bi raya te qelsî û kêmanî çi ne? Û di romana kurdî de çi êdî rûniştiye?

Edîp Polat: Heke em di rojen edebiyatê de çil nivîskar an ronakbîrî jî bo rûpelên romanê ku nêzikî 80 sal berê hatiye nivîsandin bicivînin û ew roman bêtî taybetmendiyê xwe hebe were fetîşîzekirin, jixwe dê pêşîya romanûsiya kurdî ya nûjen venebe. Ew roman ne pirtûkeke qedexekirî ye, nîrxekî xwe yê navnetewî jî tune, heke hebûya dê bo zimanên ewropî yan biyanî yê din bihata wergerandin. Tenê dibe ku li ber dilê me şêrîn be, em jî vê rewşa “stiriyê çêliya jûjî bi diya wê mîna pembo dixuyê” xelas nabin. Di dewsa wê de, rojnâmeya “Kurdistan” an “Hawar” bihata xwendin, dê watedartir bûya. Dibe ku Mele Mahmûdê Beyazîdî çîroknûsê yekem be, yan Şivanê Kurmanca romana yekem be, lê di warê wêjeyî de ew qels bin, tu nikarî wan jî rastiya wan mezintir bikî. Bi taybetî mînaka duyem sî salan berî niha gava hat çapkirin, kesekî/ê ev heyecan nedît û tu maneya wê tune ku niha him bi tipên kirilî û him bi yê latîni hatiye çapkirin. Em bi kê, çi didin îspatkirin? Qey wergera berê çewt e? Kî li vir bi alfabe ya kirilî dizane ku karibe bide ber hev? Ji bo rûpelên wê pir bibin? Ji bo ku romanên xweşik û giranbuha werin nivîsîn, divê em hemû xwedî wîjdan bin û bi nêrîneke rast li berheman û nûserên wan binihêrin, ditirsim ku hesûdî û berjewendî wîjdan didin windakirin. Hin kêmasî û qelsî min li jor gotin, tiştê rûniştî di romana kurdî de hene, yan aliyên xurt ên romana kurdî hene, ew jî honandina bi peyvên helbestî ye ku bingeha xwe ji helbestên klasîk digire.

Pirsek: Çima romanûsên navdar ên kurdî jî dîasporayê derketin, em yê welêt, digel kişandina ew çend êş û azaran, di astekê de rawestiyane û xwe dubare dikin?

Tevşîka bo romanûsiyê tune ye, divê li ser

navê Mehmed Uzun pêşbirkeke romana kurdî were organîzekirin û her sal di salvegera wêfata wî de bête dayîn. Kêmasiyêke din jî rexnegirî ye ku ew weke disîplinekê hêj rûneniştîye.

Lokman Ayebe: Gavê mirov nikare bibêje di romana me de tiştêk rûniştîye. Tu tişt hîn rûneniştîye jî ber ku hîn av ne zelal e. Ew qas sal e li ser hev gewimibû û jî nişka ve ev av der bûye. Jî ber wê jî gelek qirş û qal li ber vê avê tên. Lê ev “derbûyîn” jî dilê mirovî pir û pir xweş dike ku ji tune de rêyek vebûye û diherike. Heger kurd dev jî xulamtiya zimanên serdestan berdin û li ziman û pê re jî li wêjeya xwe poşman bibin û lê xwedî derbikevin û em nivîskar, êdî dikaribin rastî û şaşiyên wêjeyê jî hev derxin, îro nebe sibê, sibê nebe dusib wê wêjeya me danisile, jî vî halê şolî derkeve û zelal bibe. Wê çaxê ez bawer im em ê bikaribin bi berhemên wêjeya xwe qayîşê bi wêjeyên zimanên din re bikişînin û em ê bikaribin kaban di qadên navneteweyî de bavêjin.

Menaf Osman: Romana kurdî di qonaxê wêjeyî ya girîng de ye. Heta demeke nêzik mîna zarokêkî bi çarlepkan bi rê ve diçû lê êdî rabûye ser piyan, bi tirs be jî bi rêve diçe. Lê ji bo ku karibe bi ciranên xwe re û bi romanên cihanê re têkeve pêşbazîyan niha hewceyî mezinbûnê ye. Bi raya min divê em xwe nexapînin. Divê neyê jibîrkirin ku jimara romanên ku ji nav me sih milyon kurdî derdikevin hîna jî bi qasî yê ku ji nava du milyon lubnaniyan an jî yê ku ji nav milyonek luksemburgiyan derdikevin kêmtir in. Lê ev jî nayê wî wateyê ku pêşketinên ku bi romana kurdî re çêbûne hindik in. Na, tevî ew qas qedexeyên li ser ziman û tevî ew qas problemên hundirîn ên kurdî, dîsa jî kedeke baş û pêşketinên baş li holê hene. Gelek romanên ku hêviyê didin mirovan jî hatine nivîsandin vê dawiyê. Lê divê em jî bîr nekin ku zimanê kurdî û bi taybetî jî kurmancî hîna nebûye zimanê perwerdehiyê û zimanê ku nebûye yê perwerdehiyê her tim kêmtir dimîne. Bê piştgirî dimîne, lawaz dimîne, di jiyana rojane de çiqasî bête xebitandin jî, di jiyana wêjeyî û romanê de nayê bikaranîn, bête nivîsandin jî xwendevanên wî/ê zêde nabin. Ku pêşketina ziman li ser keda çend nivîskar û zimanzanan bimîne dê her dem qels û bêkêr bimîne. Mirov bi kîjan zimanî perwerde bibe, jiyanê jî bi têgihên wî zimanî

nas dike û razber dike. Ne hewce ye dev bavêjin kesên din. Ez bi xwe di rewşeke wilo de me. Ji bo xwendina pirtûkeke bi zimanê erebî yan jî tirkî çar saet ji min re lazim in. Heman pirtûk bi kurdî be ez ê rojekê duduyan pê de dakevim heta ku ez biqedinim. Ji ber hişmendiya me wisa çewt û li gorî zimanê serdestan hatiye kodkirin û programkirin. Gava ku em vedigerin ser zimanê xwe û bi têgihên zimanê xwe diramin em zoriyeke mezin dikişînin. Ev rewşa hanê bandoreke mezin li ser belavbûna romana kurdî dike û nahêle ku li gorî têtê xwestin belav bibe. Niha li vir, li cem me gelek romanên Mehmed Uzun ên bi tirkî û di heman demê e bi kurdî hene. Hevalên min jî diçin ên tirkî digirin destên xwe û dixwînin. Ez ji wan re dibêjim. "Çima hûn ji eslê wan ê kurdî naxwînin, hûn diçin ji wergera wan a tirkî dixwînin". Dibêjin "a bi tirkî tama wê bi me xweştir tê. Hem jî em zû dixwînin, wexta xwe ya zêde ji xwe re dihêlin". Ez bi wan de diqehirim lê ez baş dizanim ku ne tiştin şaş dibêjin. Yanî bi kurtahî ez dikarim bêjim ku pirsgerêkên zimanî yên li pêşiya romana kurdî pir in. Zimanekî me yê standart jî hîna baş rûneniştîye. Her nivîskar zimanê nivîsê hinekî ber bi xwe ve dikişîne. Belkî ev tiştêkî normal be, lê probleman bi xwe re tine.

Ji hêla binyatê û teknîka nivîsandinê ve, romana kurdî qalibekî baş girtiye û ji amatoriye xelas dibe hin bi hin. Pîvanên wêjeyî di hûnakê de, di şeweya nivîsê de û di avakirina hêmanên romanê de hêdî hêdî cihê xwe digirin. Ji hêla mijar û fikrê ve jî, piralîbûn û dewlemendiyeke nû derdikeve holê. Lê belê di vî warî de jî hîna negihiştîye asteke ku taybetmendiyên xwe deyne holê û ji teqlîdê xelas bibe. Hîna jî xweseriya xwe ya neteweyî û civakî berz nekiriye û cudabûna xwe ya ji romana tirkî û erebî dernaniye holê. Li Başûr bandora romana erebî, li Bakur jî ya tirkî pir li ser romana kurdî heye. Hevûna bandorê tiştêkî xwezayî ye. Lê ev bandor divê ne yekalî be, divê ne li ser hesabê dîrketina ji nîrxên xwe yê civakî û neteweyî be. Belkî qelsiya romana kurdî ya herî xeternak jî, di vî hêlê de ye. Nivîsandina romanekê bi zimanê kurdî nayê wê wateyê ku ew roman dibe romana kurdî. Na, ziman tenê ne bes e. Bi ya min, divê ew roman bi hişmendiyeke kurdî, bi xewnên kurdî, bi hestiyariyeke kurdî, bi me-

telok û gotinên pêşiyên kurdan û her wiha bi atmosfereke kurdevar bête nivîsandin. Ku bi vî haweyî were nivîsandin, wê gavê mijara romanê çî dibe bila bibe, bi cewherê xwe dê romaneke kurdî be. Taybetmendiyên romana kurdî jî bi vî haweyî dê derkevin holê. Bîr û baweriya min ev e.

Omer Dilsoz: Di wêneyê giştî yê romana kurdî de ez li pey kêmanî û qelsiyên nakevim. Ez dibêjim qey ji bo vî bila rexnegir û edebiyatzan perspektîfan bidin û tezên zanistî amade bikin. Ez aligirê hindê me ku mirov 'nanî bide nanpêjan' dê çêtir be. Ez tenê vî dibêjim: Çî nivîskarê kurd rahişt pênûsê û roman jî xwe re kir xem bila -ez jî bila û diviyên hez nakim jî- karê xwe pir û pir cidî bigire û xemê lê bixwe. Romana ku zimanê wê ko be, an tevna wê sist be, an lehengên wê beravêti bin, romana ku ramanên mirovî nehejîne, tamêke xweş li ser bîr û hişê mirovî nehêle, yan jî rondikên mirovî neyne xwarê, her piçekî kulek e, her piçekî leng e.

Şener Ozmen: Wekî ku min li jor got, di romanên xwe de hîna jî me nekariye ku lehengên xwe, ji xwe xelas bikin. Em nikarin ji xwe, ji kawdana ku em lê dijîn û bîrdoziya ku em bi hestiyarî lê nêzik dibin, xelas bikin. Bi ya min, dê ev jî çareser bibe.

Jêrenotên Şener Ozmen:

1. Li gorî agahiyan Qizilcî, di sala 1914'an de li gundekî di navbera Bokan û Mehabadê de ji dayikî bûye. Piştî avakirina PDK'ê bûye endam. Semîvîskariya kovara Helaleyê jî kiriye. Piştî hilweşîna komarê, Qizilcî derbasî Başûrê Kurdistanê bûye. Bi têkçûna rejîma şahî re, di 1979'an de vegeyariya Îranê. Di sibata 1984'an de hatiye girtin û jî hingê ve kesî xeber jê nestendiye. Pirtûka wî ya çîrokan, bi navê "Kenê Parsek", bi pêşgotina Hêmin Mukriyanî, di sala 2001'an de ji Weşanxaneyê Avestayê derçûye.
2. Ji pêşgotina Hêmin Mukriyanî, Kenê Parsek, Hesen Qizilcî, r. 12, Avesta, 2001.
3. Geleneşîna Îcadî, Eric Hobsbawm & Terence Ranger, Weşanên Agora, Çapa Tirkî: Îlon 2006.
4. "Romanivîsîna Mehmed Uzun", Remezan Alan, Kovara War, Hejmar: 5*6, Havîn-Payîz 1998, r. 135-154.
5. Heman nivîsar, r. 136.
6. "Serbilindî û Serkeftina Romana Kurdî", Maruf Yilmaz, Kovara War, Havîn-Payîz 1998, r. 155.
7. "Hinek Bîr û Babetên Nû / Derbara Kelepura Bajarvaniya Kurdî de, Xirvekirina Kelepûrî û Rizgarkirina Wî Ji Nemanê-1", Ebdurreqîb Yûsiw, Werger: M. Xalid Sadîni, Kovara War, Zivistan 1998, Hejmar: 3

Roman

Omer DEWRAN

Ev haletê havîbûnê, du aliyên xwe hene: Ji layekî ve berxwedan e ji bo rizgar kirina ji rewşê û ji layê din ve qêrînek û şiyarbûnek e ji bo civakê. Û bi hawar û gazî dibêje û dipirse “ma çêdibe ku mirov wekî heywanan kayîna xwe bike?!”

Pirê caran axaftin tê ser “romana kurdî” ku bi çavên diyardeyê di edeba me de lê têtê nêrîn. Lê mixabin, diyardeyeke wiha bi têtê geha romanê li cem me hîn peyda nebûye. Çawa gulek nikare biharê bi xwe re bîne, wiha jî çend roman di edeba kurdî de nikarin vê diyardeya aloz bi cî bikin. Ji bo ku em vê rastiye binasin, pêdivî ye em bizanibin ka roman çi ye.

Ez ê li vir wê nivîsa ku min ji bo pîrtûka xwe amade kiribû ya li ser romanê pêşkêşî xwendevanên we bikim:

Roman çi ye?

Di demekê, ji deman de, çi berhemên edeba destanî ku bi zimanên koma romanî (zimanê firensî wekî nimûne) dihatin nivîsandin, jê re roman dihat gotin. Lê dûre, wateyeke tengtir stend ku evro bi navê janerekî (rengêkî) êposî (edeba destanî) dihête nîmandin. Û di piraniya zimanên cihanê de, ev rengê edebê, di bin navê romanê de derbas dibe. Di zimanê kurdî de jî vê termê cihê xwe girtiye. Lê belê, dema yek dipirse: roman çi ye? Heta dawiyê kesî bersiva vê pirsê nedaye. Û li gora gotina zanyarê edebnasiyê M. M. Bextîn: “Wê tu carî, kes nikaribe formuleke (hawkêşek) temambûyî ji bo romanê, wekî janer deyne “. Û ji ber vê çendê, çi danasîna li ser romanê hebe, dê hoyî (mercî) be. Sedema vê yekê ev e, çimkî destnîşanên rûniştî ji bo danîna sistemê ji romanê re nîn in.

Ligel ku roman wekî rengêkî edeba destanî, di hundirê dused salî de, cihê pêşîn nedaye çi rengên edebî yên din, lê her ew, li dev nivîser û edebnasan dimîne cihê hizirê û nehênîyên wê heta dawiyê nehatin naskirin. Ne dûr e, ji ber van nehênîyên nedîtî, nêrî-

nên cur be cur û heta dijber, li ser romanê têtê gotin.

Di sala 1936'an de, nivîserê bi nav û deng Tomas Man, li ser romanê weha nivîsibû: “Taybetiya romanê ya destanî û dewlemen-diya wesileyên wê yên azad ku dişên hemû waran bidin ber xwe (zanîn, mîtolojî û firehiya giyanê mirovî), dihêle ku ew cihê pêşîn, di nav rengên edebî de bigire.”

Lê hîn berî vê gotinê (di sala 1922'yan de) Mandêlştman nivîsibû ku dawîya romanê hat. Ewî digot ku ev jî, ji ber lewaziya şeweyê wê yê ji der ve, ji bûyeran re. Û nika ji dihête gotin ku roman, ne li gora demê ye.

Lê belê ku em hîn bêtir vegerin ser dîroka edeb, em ê bibînin ku di qonaxa klasîzmê de, (di sedsala 17'an de) jî dihat gotin: “Qehremanên romanê ji asta nîzm in û çî li gora vê rêjeyê (miqam) be, ji romanê re guncayî ye”.

Lê berevajîya vê bîr û boçûnê, di qonaxa romansiyê de, hate gotin û ji bo romanê cîgehekî bilind hat veqetandin. Di dema xwe de, rexnegirê rûs Bîlînskî, di sala 1840'î de, li ser romanê weha nivîsibû: “Roman destana jiyana taybet e ku li ser qedera mirovekî taybet e”. Û ji ber vê çendê ewî destnîşan kir ku ji hemû rengên edebî roman cihê pêşîn digire.”

Piştî sed salî, ji vê bîr û boçûnê, ravekirina zanyar Bextîn jê re, balkêşîyeke xwe heye, ew dibêje: “Mirovê taybet ku xwedî qedera taybet e qehremanê romanê ye û pêwîst e ew ne wek kesê ku bi her tiştê xwe baş e yan jî xerab e”. An ku, ew amadekirî gerek derbasî romanê nebe û cihê xwe seranserê tê de negire. Gerek qehreman, gav bi gav ber bi cihê xwe ve biçe û heta cihê xwe

bigire, pêdivî ye ew hêdî hêdî bête guhertin. Û jixwe, ji ber vê çendê, qehremanê romanê, çi rewîştên xerab, weha jî yên baş, di xwe de gewde dike (bercest dike). Ev qehreman wekî mirov, bi pêwendiyên xwe bi hawirdorê re, çawa dişê bi giyanê xwe mezin û bilind be, weha jî sade û biçûk be. Ji ber ku roman ji hemû rengên edebî yên din, bêtir nêzî jiyanê ye û neynika wê ye”.

Li gora Bextîn, tiştê ku dihêle, qehreman jiyanî be, ne lihevguncana şîyanên wî bi rewşa (kewdana) wî ya qederî re. Bi rastî jî, gotina Bextîn, di cihê xwe de ye. Gelek caran em dibînin ku şîyanên mirovî yên hişmendi û giyanî zor kê in, lê rewşa wî ya jiyanî, ji yê zane û xwedî giyanekî mirovayî, çêtir û xweştir e. Ev dijberiya di navbera şîyanên mirovî û rewşa jiyanê de, dihêle ku qehreman bête guhertin. Û ev guhertin dişê ber bi başîyê ve be û dibe jî, ber bi xerabiyê ve be.

Ev nêrinên rexnegir, edebnas û feylesofan, li ser romanê, bineretiyeke (cewhereke) xwe heye, ew jî, ew e ku roman rengê ji jiyana taybet, ku pêwîst e, di dînamîkê de be (di livînê de). Ev jiyana taybet, çawa di rawestandî de, weha jî di werariyê de, ku di rewşeke dijwar û dijber de çêdibe, dihêle ku qeder jî taybet be. Li vir tiştêkî êşkere ye ku pîvera mezinahiya mirovî, di dijwarî û têkçûnê de, ne ketin e û di serkeftinê de, ne xwewendakirin e. Zemîn ji bo rûniştin û hêzkirina romanê, ew cihê ku her dem, ji bo mirovî balkêşiyek jê re peydabûyî be. Ev balkêşî dişê, ji navê romanê dest pê bibe heta rista dawîn bidome. Ev jî, hûnandina bi hostayî dixwaze. Alavê vê hûnandina bi hostayî, zimanekî têgihîştî û stîleke (şêwazeke) taybet e ku ciwaniyê di xwe de diparêze.

Li vir, hêjayî amaje pê kirinê ye ku çawa rengên edebî, di hundirê cureyekî edebî de, bi babetê ji hev cuda dibin, weha jî, roman bi babetê xwe, ji hev tên nasîn ku taybetiyên xwe hene. Babeta taybet û naveroka li gora babetê, şop û kartêkirina xwe, di ref-tarî û karakterê kesan de jî, dihêlin. Em bi hêsanî dişên, vê kartêkirinê li ser kesên berhemên ku babetên wan derûnî ne, bibînin.

Ev yek baş, di berhemên nivîserên mezin de, diyar dibin. Qehremanê babetê derûnî ku havîbûyek xwe ji hawirdorê heye, li dev van nivîseran dibe cihê rawestandî. Qehremanê weha, bi tenahiyê re dibe heval, çawa civak di çavên wî de biyanî ye û jê dûr e, weha jî ew, di nêrîna civakê de, mirovekî/e dûrî rabûn û rûniştinan e.

Nas e ku haletê xwe, bi xwe mayîn, bi piranî ji ber qeyrana derûnî û giyanî li dev mirovî ye. Bi taybetî, ev rewş ji ber şikênandina baweriyê li dev kesan peyda dibe. Ne dûr e, ev nebûna baweriyê, ji ber tênggihîştina di navbera qehremanî û civakê de ye. Dema qehreman, rûniştinên civakî şaş dibîne û şîyanên wî ji bo rakirina van kêmasiyan nîn in, dibin sedema ku ew bikeve rewşa bi xwe mayînê. Û di rewşeke weha de, hevriki û nakokî di hundirê wî de çêdibin. Û li vir, du rêk dikevin pêşîya wî: Nêrîna bi xemsarî li hemberî van diyardeyên negatîf di civakê de, yan jî xebata ji bo rakirina wan e. Haletê pêşîn mirina ruhî ye û haletê duyemîn ku bi encam nebe, peydabûna qeyrana derûnî ye.

Helbet, ev kêmbawerî û qeyran di rojekê de, çênabin. Ew bi salan dikişînin û dibin parçeyek ji jiyana van qehremanan. Ji ber vê çendê, bûyerên romanên weha bê êş naçin serî. Û em vê yekê, dişên di romana “Sor û Reş” ya Stendal de û di romana Dostoyevskî ya bi navê “Karamazovên Bira” de bibînin.

Di nêrîna Bextîn de, di berhemên weha de, ne tenê qehreman dûrî cîhana ji derve dikeve, her weha ji nivîser bi xwe. Dema em dibêjin derketina ji derveyî dinyayê, mebest ew e ku nepesendina normên (rûniştinên) civakî yên ku hene û pêk ve wendabûna îdealê li dev mirovî. Di vê şêweyê romanê de, realîteyek dibe cîhaneke ku bêjeya pêşîn (destpêka îdealê û armancê) nîn e û gotina dawîn hîn nehatiye gotin. Ev rewşa hanê, erê rewşeke qeyranî ye, lê ne bê aşop e. Jixwe, di vê rewşa dijwar de, qehremanê romanê, şêweyê xwe yê temambûyî û aloz distîne. Û ne bi derewan edebnasê navdar Lûkas, ji vî rengê edebî re dibêje ku ew destana cîhaneke ku dest li ser tune û giyanekê

însanî ye ku di realîteyêke vala û neçar de, çêdibe.

Ev haletê havîbûnê, du aliyên xwe hene: Ji layekî ve berxwedan e ji bo rizgarkirina ji rewşê û ji layê din ve qêrînek û şiyarbûnek e ji bo civakê. Û bi hawar û gazî dibêje û dipirse “ma çêdibe ku mirov wekî heywanan kayîna xwe bike?!” Û li vir, piştî vê axaftinê çîroka ku li ser Silêman Elhekîm û berxikê ku di nav kurdan de cihê xwe girtiye dihête bîra mirovî: “Tête gotin ku carekê ji caran, mêvanên Silêman Elhekîm hatine û ewî berx anî da ku wî ser jê ke. Û dema kêr danî ser qirikê, berx bi gazin axivî: “Xweda çima weha, hîn min xêr ji temenê xwe nedîtiye û bêtî ku ez baş dinyayê bibînim, ez ê jê bar bikim!” ji ber ku Silêman Elhekîm ji zimanê heywanan têdigihîşt, ewî berx berda û got: “Here bi jiyana xwe şa bibe!” Lê piştî salekê, berx bi xwe hate dev Silêman Elhekîm û jê xwest, wî ser jê ke. Dema Elhekîm jê pirsî: “Te bi xwe xwest tu dinyayê bibînî û bi xwe ji niha doza mirina xwe dikî, bo çi?” Ewî berxikê got: “Min payîz, zivistan, bihar û havîn dît, ez naxwazim jiyana min dubare bibe”.

Ew qehremanê ku vê çîrokê bi bîra xwe bîne, li ser temam dike: “Heger berx ji celebên heywanên ku kayîna (cutina) xwe dikin, lê naxwazim jiyana xwe bicûn, ez ê çawa vê yekê bikim?” Û piştî vê axaftinê heger guhertin di jiyana wî de çênebin, eseh ew ê xwe bikuje.

Û kî ji me jiyana xwe nacû?

Heger ji min bipirsî: Tu çawa romanê dibînî? Ez ê bêjim: “Ew berhema ku piştî xwendinê nahêle tu cih ji xwe re bibînî û bihêle tu bi xwe re biaxivî, jê re dihête gotin: “Roman”.

Bi xwe, heta niha xweş tê bîra min, dema min romana Şoloxov “Donê Bêpêjn (Aram)” bire serî, berê elindê bû. Ez rabûm ser xwe û min berê xwe da daristanê û di hundirê çend demjimêran de, ez bi tena xwe mam û ketim mitalan. Ligel ku ev haleta piştî xwendina vê romanê sî sal di ser re derbas bûne, hîn êş û xweşiya wê bi min re maye.

Mirov vê yekê, dişê bi çi rave bike? Ez dibêjim: Ew cihana bêtî stûn, di romanê de,

cihana kê dibe, bila bibe, ew ê bihêle ku xwendevan, xwe di qehremanê wê de bibîne û ev jî têr dike ku heta bi hetayê ew pê re bimîne. Jixwe, ev jî sedema nemirina berhemê vî rengê edebî ye.

Çawa danasîna romanê, ne hêsan e, weha jî nenasîna destpêka hebûna wê jî ne hêsan e. Û ji bo ku em vê yekê bizanibin, gerek em hunera romanê wekî berhem bizanibin. Ji bo naskirina qonaxên dîrokî ku roman tê re derbas bûye, pêwîst e em qehremanan, di ber çavan re, derbas bikin. Wan çawa kirinên xwe dikirin, çawa dihatin guhertin û ev guhertin çi kartêkirin li reftariya wan çêdikir. Ev warek e. Lê warê duyê çawa bûyer di berhemên edebî de, bi pêş de diçin û çawa tîn hûnandin û pêk ve tîne girêdan û li gora demê ye yan na? Ev danîna bûyeran û belavkirina wan, di hundirê berhemekê de, çawa her qonaxek sistemek xwe ji bo vê avakirinê hebû, her weha jî her rêbazek, di vî warî de, taybetiyên xwe hebûn.

Û warê sêyemîn ku bi stîlê (şêwazê) nivîsandina berhemê ve girêdayiye, dişiya hindêk destnîşanan ku bi vê berhemê ve girêdayiye yan jî bi yê din ve, şanî me bide. Ev destnîşan, ji bo hebûn û cudabûna berhemekê ji yên din, merc be.

Wekî em dibînin, ev pîvan bi hemû hoyên (mercên) xwe, ji bo hellsengandina romanên serdemî ye. Lê tevî weha jî, destanên Homeros ku gelek caran wekî roman tîn dîtin, di bin van pîvanan re derbas dibin. Û nirxdayîna wan, li gora dem û qonaxê ye. Û ez dibêjim, heta di bin pîvanên serdema me de jî, li wan bête nêrîn, her wê elementên pêşîn ji romanê, di wan de bînin dîtin. Ji ber ku çawa destanê destpêka xwe ji folklorê (çîrokê) wergirtiye, weha jî romanê destpêka hebûna xwe ji destanê stendiye. De em ê binêrin çi taybetiyên destanên Homeros hebûn û çi hişt ku em hizir bikin ku ew gava pêşîn ji romanê bûn.

Yek ji wan elementên pêşîn ên romanê, di destanên Homeros de, em bi awayekî durist, bikarînana hejmara kesan, di cihên xwe de, dibînin. Jixwe, ev jî, ji bo hunera berhemê merc e. Di vî warî de, em dibînin

ku cudabûna pêşîn, di navbera destanên Homeros û çîrokên folklorî de, di pîrbûn û hindikbûna kesan de bû, wekî dab, di çîrokên folklorî de, hejmara beşdarên bûyeran kêm in, lê di destanên Homeros de, hejmareke pîr ji kesan cihên xwe, di wan de, girtine. Erê, qehremanên Homeros yekalî ne û bi karakterên xwe nayên guhertin, lê her cudabûn di navbera kesekî û kesekî de heye. Em di Odîs de, mirovê fenek û aqilmend dibînin, di Axememnûn de deshelatî û fermandarî û di Axîl de, kesaniya bi hest û bi dostaniyê ve pêgirêdan û di Parîs de aqilsivikî û di Hektor de mêrxasî. Jixwe, pîrbûna kesan û cudabûna wan ji hev, di paşerojê de, bûne yek ji rewîştên romanê.

Edebnas, sedema yekaliya qehremanên destanên Homeros û neguherîna di reftariyê de, bi vî tiştî ve girêdidin: “Wênekêşîya qehremanan di rewşekê de (di ceng û şer de)”. Lê belê, gerek em bêjin ku werarî bi qehremanan re, di edeba destanî de, piştî sedsala pêncan çêbû. Ev jî, ji ber mercên jiyanê yên nû bûn. Û ne dîr e, ji ber vê werariyê, hindêk jî edebnasan destpêka peydabûna romanê vedigerînin û qonaxa dirokî, an ku sedsala 3 û 5’emîn a zayînî. Û berî ku em bînin li ser vê qonaxê rawestin, gerek em bêjin ku elementekî din jî yên romanê di destanên Homeros de hebûn, ew jî ev bû: Qisekirina li ser bûyeran di “Odîs” de ji nivî dest pê dibe û bûyerên ku bi qehreman re diqewimin, li ser zimanê wî têne gotin. Ev rêka bikarîna bûyeran, cara pêşîn, di edeb de, bi kar hat û jê re dihête gotin: “transpozîtsiyon”. An ku li ser bûyerên derbasbûyî, qehreman bi xwe dibêje, ne ku nivîser. Ev rêka nivîsê di romanê de, bûye diyardeke normal.

Wekî me gotibû ev hemû jî bo romanê destnîşanên pêşîn bûn. Heta ku romanê şeweyê xwe yê pêşkeftî stend, di gelek qonax û pîrosesên dirokî de, derbas bû. Yek ji wan qonaxan ku jê re dihête gotin: Qonaxa romana entîk.

Romana entîk ya qonaxa zayînê, wekî dab li ser bingeheşê sujête hezkirina xort û keçekê jî hev re, dihête avakirin. Her dem, li ser rêka vê hezkirinê, gelek kelem û asteng

peyda dibûn, lê dawîya dawîn bi xweşî jî bo her du qehremanan diçû serî. Bi giştî romana entîk, di vê çarçoveya bidestxistina jiyanê kesayetî ya xweş cihê xwe digirt. Nimûneya romana vê qonaxê ku gelekî dihat xwendin û belavbûyî bû, romana Long a bi navê “Davis û Hiloya” û romana “Kerê Zêrînî” ya Apolî. Û ev roman heta qonaxeke dirêj balkêşiyên xwe hebûn. Di dema xwe de, şairê rûs yê sedsala nozdehemîn ê herî bi nav û deng Pûşkîn nivîsibû: “Min bi xweşhalî romana “Kerê zêrînî” xwend”. Ji xwe ev roman bi janera perwerdekirina exlaqî (sincî) bû. Romana “Davis û Hiloya” romana îdilî bû. (bêjeya îdilî yewnanî ye û mebest pê ew berhema edebî ye ku tê de wênekêşîya jiyanê rojane û giwlên wan kesên ku nêzî siruştê dijîn. Û wekî dab, tabloyên jiyanê gelêrî têne bercestekirin). Û ev hîn di wê demê de, nivîser berê xwe dida cihana mirovî ya hindekirina sincî û prensîpên reftarî û pêwendiyên wî ligel cihana hawîrdora xwe.

Lê gerek em bêjin ku kartêkirina romana entîk li ser pêşketina romanê, di paşerojê de, ne pîr mezin bû. Ji ber ku di van romanên de, qehreman hîn ne bûbûn xwedî rewîşt û karakterên taybet ku kûrbûnê dide cihana hinava mirovî, lê tevî weha jî, ev rengê edebî cihê xwe, di fonda edeb de girt.

Di civaka derebegî de, hîn bêtir roman ber bi tekûzî û dewlemendiya xwe ve diçe û jiyanê kes a taybet jî bêtir balê, di romanê de, dikişîne ser xwe.

Di sedsalên navîn de, xelekek jî çîrok û destanên ku qehremanên wan mirovên siwar bûn û jî ber vê yekê romana bi navê romana siwarî hate holê. Wekî dab keresata van romanên, li ser qehremaniya hindêk egîdên siwar ku bi mêrxasiya xwe, nav jî xwe re çêdikirin, an jî li ser hezkirina wan ku hemû jiyanê xwe jî bo vê hezkirinê terxan dikirin.

Di dema xwe de, romana siwarî roleke pêşengî di nav rengên edebî yên din de dilîst. Bi xwe, vê şeweya romanê, bi keresta xwe hemû layên jiyanê neferî da ber xwe. Lê belê tenê jiyanê kes bîyî layên jiyanê yên civakî. Û kengî arîşeyên civakî û yên ferdî pêk

ve têkel bûn, romana siwarî zemîna xwe ji bo hebûna xwe wenda kir. Û bi vê romana real (ku ji civakê re bûbû neynik) cihê xwe girt. Nimûneya vê romana nû “Donkîşot” ya Cervantes (sedsala 17’an de) û romana “Robinson Crusoe” ya Daniel Defo bû (sedsala 18’an de).

Jixwe, pirê caran rexnegir û edebnas dibêjin ku romanê wekî janr, hebûna xwe ji romana Cervantes “Donkîşot”ê dest pê kiriye. Diyar e, nuhbûn û cudabûna vê romanê ji yên berî xwe, ji ber wê qonaxa ku tê de hatibû rengvedan bû. (Qonaxa vejînê bi xwe ji qonaxên dirokî yên berî xwe cuda bû).

Erê “Donkîşot” qehremanê siwarî bû, lê karîkaturî bû, ji wan pêwendiyên civakî yên ku gerek ji civakê rabûna. Bi xwe realîzma ku tê de hatibû gewdekirin, ev tirana bi pêwendiyên civakî yên kevin re, dibin elementên pêşîn ji romana rexnekirî re ku di sedsala nozdehan de, rola sereke di nav cûr û rengên edebî de list. Hîn berî ku roman bigihê vê geşbûna xwe, di sedsala hejdehan de ku pêwendiyên civakî yên sermayedariyê cihê xwe girtibûn û rola ferd (takekes) hîn fi-rehtir dibe, dibin kerest ji romanên vê qonaxa dirokî re. Bi taybet, berxwedana kes hemberî siruştê, di romana Dêfo ya bi navê “Robinson Crusoe” dihête ditin.

Lê roman, geşbûn û werariya xwe, di sedsalên 19 û 20’an de dibîne. Di vê qonaxê de,

roman digihê pelpelûka (pila) xwe ya herî bilind. Bi taybetî, em nimûneya asta bilind di romana Stendhal “Sor û Reş” û “Komediya Mirovahiyê” ya Balzac, her weha jî, em vê yekê di romanên Dickens, Hugo, Tolstoy, Dostoyevski, Alan Firens, Rolan Folkin, Hemingway û Şoloxov de dibînin. Û romanên van nivîserên mezin, çawa civakî bûn û weha jî derûnî bûn.

Heger em piştî vê geriyane, pirsiyara xwe dubare bikin: Aya roman çi ye? Û çi taybetiyên xwe hene? Ji bilî wan danasîn û taybetiyên ku me berî niha destnîşan kiribûn, em dişên danasîn û taybetiyên din ji wekî nimûne pêşkêş bikin. Ji ber ku roman mîna îsfencê ye û dişê hemû reng û cureyên edebî yên din di xwe de gewde bike. Ji novelê bigire heta bigihê komediya û trajediya. Û dê xweş xuya bibe ku roman bi hêsanî û bi awayekî azad rengên din yên edebî bi xwe ve girêdide. Ji ber ku azadiya romanê ji bo nasîn û ji hev derxistina cihanê, bê sînor e û nivîserên hemû welatan û hemû qonaxan, vê azadiyê bi şeweyên cûr be cûr, ji xwe re bikar anîne.

Piştî vê danasîna giştî, li ser romanê, aya ev rewîşt û mercên ku li ser romanê hatine diyarkirin, di romana kurdî de peyda dibin!?

5 berhemên gelêrî ji bo zarokên kurdan

Enstîtuya Kurdî ya Amedê

Navnîşan:

Huzurevleri Mh. Kalem Sk.

No: 32 Kat: 4

Kayapınar / DIYARBAKIR

Tlf/Faks: 0412 237 43 16

E-mail: enstituamed@hotmail.com



Mirin, berî her tiştî

Yûnûs EROGLÛ

Belê, piştî ku pîra min a herî dawîn mir, ne tenê tozîkek şekir lê şîraniya gelek bîranînên di liv, tevger, alav û tîkberên ku her ku diçe di gavek berê, duh, pêr û hemû kêliyên dema borî de dimînin jî hişt.

Na, temenê wê bi qandî slav an kurdên ku Nabokov dibêjê baş bi ser sed û pêncî salî diket ne dirêj bû. Jixwe, ji bo kurdekî/ê temen ne xêzikeke dirêjbûnê, lê xelegeke firehbûnê ye ku dorbera wê bi dirêjbûna demî ya temên re firehtir û firehtir dibe. Lewra dema ku pîra min vê heftiyê mir, di nod saliya xwe de, ji hejmarê kesên ku di mējûya dused sal zêdetir de tevli malbata Nabokovî bûbûn bêhtir kes gihandibû rûyê vê erdê û tevli xelegeke jiyane kiribû, ligel mêrê xwe yî ji diya xwe takê bi tenê bû. Mirov derbarê vî hevparê herî nêzik ê jiyana wê de, ku berî wê bi salan xatir ji me gişan xwest û ji ronahiya çiraya dinyayê dûr ket de jî tişteki nebêje nabe; Kalikê min î ku tu carî dê û bavê xwe nedîta, hînê di zikê diya xwe ya ku wê hemû malbat êdî bi navê wê bihata naskirin de bû, dema ku bavê wî çû herba ku wê hew jê vegeriya.

Her çiqas min xistibû bala xwe ku ez ê ji bo vê hejmarê li ser mirinê binivîsim jî, qet nedihat hişê min ku xencera sersot a ruhistin ji pênûsa min lezgîntir derê. Spêdeya pêncşemeke payîzê ya bi ewr û baran, gava ku xweha min ya ku serê sibê zû diçe dibistanê ez di nav ciyan de niquçandim û li ber guhên min xeber gihande min, ez weke xewnekê jî ne amade bûm ji wê nûçeya ku di wê gavê de digihaşt sed û hivdeh kesan, çi zarok, çi nevî û çi neviçirkên wê, yên her yekê wan li dereke welêt û xerîbiyê, bi awayekî ku diviya pêşwazî bikim. Ez di jiyana xwe de herî pir dema ku ez ê têkevîm xew pêjna mirinê dikim; di şiyarbûna berwest de ji pêjna bêewlehî û aramiyê ya tevlihevbiyî. Mikurhatin ji min divê ku ragihînim ku wê sibehê gava bi

dengekî çî ji bo şingirtinê û giramgiriya miriyê, çî jî ji ber nebehetandin û neacizkirina min î di nav lepên xewa germik de, melûlbûyî hatim şiyarkirin, nava min bi ajotina rojane ya dinyayê dimilmili. Dêrûniya min bi qasî ku reng û teşe û his û hesta guncaw a li hemberî bûyereke wisa nikaribe bi hêsanî di xwe de dawerivîne di tariyeke bêdeng de dihênijî. Ez rabûm, derketim sênderê û ji bo ku hinekî west bidim xwe, min bi çavên şolî li diya xwe temaşe kir.

Diya min xwe girêdabû, di hundir de diçû û dihat. Dema bavê min, bi pîjemayê xwe yê gewrik li dû wê diçû û dibirbirand ji bo ku ew jî bi wê re were û pirs jê dikirin; gelo wê bi erebeyê herin, xaltika min ew jî çûne yan na, haya yên gund pê xistine û hwd, bêtî ku berê xwe bide wî di ber xwe de bi gotinên ku hingî hêdika û bêpûtepêdan hatibûn gotin nayên bîra min bersiv didan. Bala wê bêhtir li ser tişteki ku me nedidît bû. Rastî jî, weke ku tiştên ku me nedidîtin lê ji wê ve xuya bûn, di nava hundir de hebûn û wê jî ew tişt li hev rast dikirin diçû û dihat, diçû mitbexê, bi heman hêminiyê derdiket dihat kêsekî, tejekê yan potekî li filan derê radikir datanî dereke din, şimikeke li ber lingê xwe datanî qiraxekê, cihê firaqekê diguhert, diçû odeyeke din di nav selik û dolaban de tiştin dikişî, li kulînê, li serşokê, li hêwan û odeyan bi bêdengiyê gumre û giran kod û şifreyên tîkber û alavên malê tekûz û bikeys dikişî.

Ez a niha dikarim bibêjime we ku tiştên ku sal salewest her roj dike piştî diya min şikandiye û ew jî hêz û mecal de xistiye û roj bi roj dîtvanê vê yekê me jî; lê tenê ro-

jekê, rojeke ku timî berî me gişan radibe û piştî me gişan radizê û ji westana carinan tê qasikekê li ser mîndera ber televizyonê xwe dirêj dike, çi kiriye, çi kar û suxreyan dike nikarim vebêjim. Lewra tiştên ku dayikek dike, wexta ku tînin kirin na, wexta ku nayên kirin tînin dîtî. Belkî loma, çaxa wê sibê diya wê êdî –berî her kesî- ji xew ranebûbû, diya min bêhtir bi nebûna wê ya li vê cihanê hesiyabû û careke dawîn bi çavên diya xwe yê ku ji bo wê hîna vekiribûn, bi tîkberên navmalê re da û stend, bi gramera jinan a nepen ku bi tîkberan re saz kirine derûniya xwe guvaşt. Lewra di jîyanê de hew carekê, serê sibehekê, berî her tiştî, diya mirov dimire.

Wexta, destên min di berîka pijemayê min ê pemboyî de, bi awayekî bêpergal berê min ji pencereya mitbexê li derve û guhên min li ser kurtepista diya min a bi rêzimana tîkberan di navmalê de ayîneke hêmin pêk dianî bû. Li derve baraneke hûrik didayê. Ewrên tarîgewrî yê weke dûmana ji kulekan dikişê bi kujên avahiyên bilind ve gîhabûn, dilopên tînegerm dinîqutandin dilê min û digotin “ji bo mirinê rojeke xweş e!” bi zimanê xwe yê milmilîn. Di şîna wê de ji jixwe her hat gotin: Di rojeke xweş de mir, êvara îne çû, ma ka jê xweştir çi hebû?

Mirina diya wê ji bo diya min zar û zimanên tişt, tîkber, bûjen û bûneweran ên ku ji devger ketibûn heta piştê dabûn vekirin, bi her hal. Ajo û kelebêstên xwe yê dayikîyê, baldan û pergaldana li ser “hundiro” ji liv û tevgerên diya xwe yê di nava salan de rû bi rûyî bobelatan seridibûn wergirtibûn. Ez di dengê wê yê ku gotinan dinermijîne û bi tîneke germ dilefîne de hîni pêjna wî dengê pîrika min a ku di nav xeleta temenekî fireh û dirêj de derz û şeqtên ji serhatiyên bi eş û kul lê ketibûn dikim. Wê sibê, dema ku bi tevgereke ew çend giran û hêdi ku dengê minemînî yê barana hûrik a li derve dihat ji neditepisand li hundiro digeriya, ez pê hisiyam ku tiştê herî domdar ku jinek ji diya xwe hîn dibe bîdengîyeke di zarê alav û tîkberan de ye.

Pîrika min, li mala ku herî pir wê tîne bîra min nemir. Li wî xaniyê kevir ê li bi-

niya bedenê ku kalê min ew tim dişiband Xana Hesen Paşa, hîna weke qîzeke ciwan li ser xwe bû. Di salên xwe yê lîseyê de ku ez li Erxenyê li dibistaneke leyli bûm û mala me ji li Bismilê bû, di betlaneyan de carinan li Amedê min serî dida wê û dûre bi riya xwe de diçûm. Weke qonaxekê bû di navbera çûn û hatinên min ên ji bo her du navçeyan de, di wan salên ku jiyana min rengên xwe yê dawî tir dikir. Tiştên ku herî pir wê tînin bîra min, her wekî li mala wê ya li Bismilê, li vîya li bîniya bedenê ji hebûn; buxur, berîkên ku tiştên wekî ta, morik, qumçik, derzî, şewk, mûçing, hin derman û der di wan de hiltînin û bi dîwaran ve kirî, sedira li hewşê ya balîfên hişk li ber, nîgarên pezkoviyekê, şahmaranê yan Kabeyê yê şîfonî û bi dîwarên bi axê seyandî ve hilawistî, qewlikê kesk ê bi çembilê Quranê, tîldolabeke textî ku bîhna mastê eyar û avbacanê tîne min, hin ji wan tiştan in ku bîguman niha bêhtir û bêhtirên wan, bi awayekî zelaltir, di hişê diya min ya ku bi gramera wan stirandî de hene.

Tiştêk ji tiştên neditbar ên wê, berxaneya wê bû. Her û her tiştêk, xurekek hebû di berxaneya wê de ji bo me zarokan. Tozîkek nok, şekirên eydê, nanîk, mewij, loqim û hwd. “Ev ji para te ye,” digot, dema bi çavên xwe yê girover dibişirî û xurekek nîzanim ji kurê derdixist û dixist nav destên me yê ji şerman diricifin, “wan xwarîye.” Min di jiyana xwe de cara ewil tûyên hişk ji yê ku wê ji me re şand, xwar. Dibe ku yê ter ji cara ewil min ji dara hewşa wê ya li ber Çemê Bismilê xwaribe. Lewra piştî ku diya min ji neditî ve mal ji gundê me yê bêdar bar kir û em anîn bajêr, em di xaniyekî li qiraxa yê wê, ku tûyên hewşa wê hîna di bîra min de ne, bi cî bûn.

Girêdana wê çu carî neguherî. Di demên wê yê dawîn de, ku ziman û heşê wê nemabû de ji her cara ku ez diçûm fistanekî wê yê malê perçeyan ê gulguli û rengtarî lê, çarîk û kofîya spî li serî û hibriyeke sor li dorê pêçandî; weke xwe bû. Pîreke reşîkên çavên wê tim bi ken bînin ber çavên xwe. Dilpak, henûn û beşervekirî bû. Bi bedena xwe yî zirav î kinik, yeke sivik bû.

Mîna ronahiya çavên wê, deng û wezna zîmanê wê jî nerm û şêrîn bû:

*Lawikê min xeyidiye naxwe şivê,
Xencer vekir avêt pişt balivê,
Têm li mehdê lawikê mala xwe dinêrim
Wek sîwanka dora hîvê.*

Wexta dûrikên ku zemanekî keç û qîzên dil digirtin çî li bêriyê, çî li cilşoyê, çî jî di şikeftan de dema li ber dolaban pembo diristin davêtin ser hezkiriyên xwe, digotin, jî teql û wezna dengê wê bêhn û buxza wan şîraniyên ku pê kêfa me dianî dihat.

Piştî demeke dirêj ku her û her qîzîk jî diya min re dibin, dema ku birayê wê yê takê bi tenê diçe Hecê, pîrika min bang dikê: “Munîr,” dibêjê, “wexta tu derketî serê Girê Erefê eseh tu Saliheyê (diya min) jî bir nekî.” Çaxa dertê serê Girê Erefê, karê ewil ê birayê wê duakirina jî bo diya min e. Û piştîre bûyîna min a jî diya min...

Ji bilî berxaneya wê ya jî bo zarokan, wekî din herî zêde di wan sindoqên kevn de çî jî xwe re hilanî nizanim, lê, dema ku ew jî vê dinyayê bi rê kirin tiştêk bi xwe re bir ku wê ew tişt demeke gelekî dirêj hilanibû. Cawê kefenê ku beriya niha bi salan li ser pîrsa xweha xwe ya axretê ya ku dê biçûya Hecê daxwaz kiribû ku jê re jî wî diyarê pîroz bîne.

Û zanista li gorî min herî delal ku pê dizanibû; dermankirina nexweşîyan e. Ez her heyran û hijmetkar bûme jî vê nasyariya jin û pîrejinan a di serada hezar salan re seridiye û gihaye heta niha. Çî bi dermanên kurmancî, çî bi ked û hînkariya destên xwe bûya, gelek kes rihet dikirin. Ji vê bijîşkiya wê çend terhik mane jî diya min û xweha min a mezin re jî. Ez bi xwe jî, çiqas fêde û çareya wê li min nebe jî, jî şewirîna bi diya xwe re, jî guhdarîkirina dixtorekî bêhtir dilrihet dibim. Yek jî tayên herî xurt ê di navbera dê û zarok de jî, bi dîtina min, vê baweriya zarok a bi tecrûbe û pêzanîna dayê ye.

Min gotibû ku temen jî xêzîkekê bêhtir dişibe xelekekê. Bêguman civandina vê xeleka fireh a ku pîrika min li dû xwe hişt, ango sed û huvdeh kesên jî wê bûyî, mixabin, pêkan nebû di şîna wê de. (Carinan

cihê mixabiniyê ye, carinan jî cihê kêfxweşiyê ku şert û merc rê nadin ku hemû mirovên, tayên, jî rehekê bigihên hev û têkevin kareyeke fotografan.) Lê yek jî kesên ku hatibû, jinxaleke min a jî bajarêkî dûr hatibû, di roja dawîn a sersaxiya wê de nerihet bû. Çavê wê wek balonekê werimibûn. Diya min bi zanîna ku jî diya xwe girtibû hebeka çavê wê, wê gavê sax kir.

Û tesadûfa hîn balkêştir; îro dema ku ez rûniştîm vê nivîsê binivîsim, zîmanê min kul bû. Ez jê diinitîm. Di lêgeriyana nîşeyên derbarê wê ya di nav lînûskekê de, di pelekî zer û peritî de leqayî vê danzanîna tomarkirî hatim :

1. Şekirê nebat
2. Şekirê spî
3. Lêmûndizî (xwêya limonê)
4. Mazî
5. Qurnefîl
6. Behîv

Pêkhatiya tiştên jî bo dermankirina zîmanên kul bû, ku beriya niha bi salan min jî wê girtibû û di nav pelên lînûskê de star kiribû. Vana di hawanê de tîr hûrkin, dûre tîr mijîtin û li ser dev û zîman dihelin û hingê zîmanê kul baş dibe. Dema ku ez çûm min li metbexê, li ciyê ku hefteyek berê destên min di berikên pîjemayê min de, berê min li barana derve ya ku dilopên hûrik bi ser nûçeya mirinekê de dişijikand diya xwe dît û pîrsa êşa zîmanê kul jê kir, wê jî, weke ku vê nîşeyê rast der bixe, got “tozîkek şekir bavêje devê xwe, bila bihele, wê paqij bike”. “Diya min berê tiştêk pê de dikir, nizanim çî bû.”

Belê, piştî ku pîra min a herî dawîn mir, ne tenê tozîkek şekir lê şîraniya gelek bîranînên di liv, tevger, alav û tîkberên ku her ku diçe di gavek berê, duh, pêr û hemû kêliyên dema borî de dimînin jî hişt.

* * *

Min nedît ew çûn, lewra wexta erebe hat ku diya min û bavê min bibe Amedê, ez çûbûm nav ciyan û ketibûm xewa ku ne bi hilatina rojê lê bi avaçûna temenekî nîvçe mabû. Emir siya darê ye, yadê heyran!

Helbest û sembol

Kamran Simo HEDILÎ

Helbestvanê simbolîst ne rêzik, tevahiya helbestê girîng dibîne. Bi rêzikên azad pêşkêşkirin, ne li dijî armanca raman û zimanê helbestê ye. Helbestvan, ne rêzikeke bi tenê, hemû rêzan bi hev re pêşkêşî xwendevanan dike.

zimanê sembolan ji

zimanê peyvê kevntir e

Di helbestê de cihê sembolan çi ye? Bi çi mebestê sembol û îşaret tîn bikaranîn? Vê mijarê jî, bal kişandiye ser xwe û di nav dîroka danasîna helbestê de cihekî girîng girtiye.

Eger mirov bala xwe bide mirovên ku diaxivin, dê bibîne bi axaftina peyvan re, pirê caran dest, çav, birû û rû li kêleka peyvan, para xwe dixin axaftinê. Li kêleka ziman zimanekî din dixebitînin. Mirov dikare vî zimanê jest û mîmîkan bi zimanê nîşan û sembolan bi nav bike. Ev wisa dide xuyakirin ku ziman pirê caran li hember hilgirtina hestên mirov lawaz dikeve. Ji bo vê jî mirov xwe neçar dibîne ku zimanê îşaret û sembolan bi kar bîne. Ev bingeha hunera Sembolîzmê ye.

Mirovan di serdema pêşîn de ji bo ku debara xwe bikin û xwe ji tirsan rizgar bikin, îşaret û wêne ji ziman pirtir bi kar dianîn. Ev dibistana herî kevn ji zimanê helbestê re bû bingeş. Mirovên berê, dema li ser zinaran wêne çêdikirin ew wêne sembol bûn. Bi wan wêneyan diçûn nêçirê, bi wan wêneyan xwe ji metirsiyan rizgar dikirin û bi wan wêneyan baweriya xwe dianîn ziman. Zimanê nîşan û sembolan girîng e, ev ziman dibe alîkarê zimanê ku mirov bi kar tîne.

Tiştên ku li ser dil û mêjiyê mirov hêdî hêdî dimeşin, lê mirov nikare wan bigire, bi zimanê duyem tîn girtin.

Nivîsîn di destên mirov de amûra derbirînê ye, lê hinek caran li hember hilgirtina hest û ramanan qels dimîne. Ji bo vê mirov bi zimanê nivîsê re, zimanê sembol û nîşanan bi kar tîne û derbirîna xwe ya hunerî pê dixemilîne. Ev jî hunermendiya herî bilind e ku helbestvan bi kar tînin.

Nietzsche wisa dinivîse, "ji vir û pê ve he-

nasa xwezayê bi sembolan, pêwîst e were gotin û were şirovekirin. Ku wisa be, pêwîstiya cîhanê bi sembolên nû heye."

Sembolên ku di helbestê de cih digirin, li rêwîtiya têgihîştina jiyanê, nîgarên xweş ên di hişê mirov de dimînin dihêlin. Baweriyeke helbestvan bi tenê heye. Ew jî bi sembolan destpêkirina tevgera xweşikiya helbestê ye. Ev destpêka xweşikirina helbestê li meydana cenga xeyalên helbestvan, xweşikiyan di reng û dangan de çêdike. Ev xweşikirinên ku helbestê nemir dikin û bi vê re helbestvan digihên armanca xweşikirina helbestê. Helbestvan, helbesta xwe bi hêviya hestan ve nahêle. Hemû hêza xwe ji bo xweşikiya helbestê bi kar tîne. Ji bo wê pêşiyê li rêş û formê hûnandinê dinihêre. Çiqas kar li ser were kirin û bi zehmetî hatibe hûnandin, ew qasî helbest spehîtir dibe.

Leandr dibêje, "helbest henasa spehîtiyê ye" Ev jî bi xweşikirina sembolan dibe. Helbestvan li riyên rihet nagere û şeweyên riyên rihet ji ba xwe dûr dixê. Her sembolê bi dillerzeke zehmet di helbesta xwe de bi cih dike. Ji bo ku helbest bikeve riya hemdem û çaxê ronî bi sembolan diaxive.

Helbestvan berê xwe dide çaxên derbasbûyî, balê dikişîne ser efsane, çîrok, sêr, xewn, fal, zikir û xwenîşandanên olî û yezdanên di jiyana mirovên pêşîn de xwedî rol bûn. Ji demên bihurî ber bi roja xwe ve tê. Bi vê şeweyê dê bigihên riya zanînê û riya ku xwe dibînin. Ji bo wê rêzê jî zanîna mirovên beriya xwe re digire.

Êdî ne tenê sembolkirina reng, cih û çaxên çûyî, bi alîkariya teknîkên nû, nîgarên nû, bûyerên nû, jiyan, hebûn, raman û bawerî (çi olî, çi felsefî) van amûrên tevgera jiyanê yên dema derbasbûyî hemûyan bi sembolan ji nû ve tîne jiyane.

Bi riya sembolkirina van amûrên tevgera ji-yana mirovan, helbestvan dikare jihev cuda-bûna helbest û zanistê ji nû ve bigihîne hev û di nav hev de bihûne.

sembol meqyajkirina rengan

û xweşikirina dengan e

Helbestvan ji xweşikiyên nepenî (sergirtî) hez dike. Li paş akvaryûmê (masîdankê) li xwezayê, li tiştan û li bûyeran dinihêre. Ji wateyên ku bi gelek wêneyan têne ber çavên mirov hez dike. Ji destnîşankirinên li nav mijê, yên bi xurtî mirov wana ji hev cuda dike û her kes tiştên li wan digerin dibînin hez dike. Ji wateyên ku gelek wate tê de xuya dikin hez dike. Helbestvan rastiye bi xwe jî rast, tazî û rût nîşan nade. Wê meqyaj dike, reng û giyanê wê xweşik dike û bi muzîkê re pêşkêş dike.

Paul Valery, dibêje, "Mirov li hevpariya gelek aliyên helbestvanên ku xwe sembolîst dibînin binihêre, mirov dikare bibêje, dewlemendiya helbesta sembolîst, têkilkirina muzîkê ye." Kirineke din a ku helbestvan dike ew e, di navbera xwendevan û afirîner de pêwendiyên çêdike. Helbestvan xwendevanên xwe vedixwîne leyistika roleke afirîner û dixwaze fehmkirina tiştên ku xwendevan dixwînin ew bi têgihîştina xwe, wana binirxînin. Helbestvan mafê nirxandin û têgihîştina wateyêdide xwendevan. Kesên ku helbestekê dixwînin, an li helbestekê guhdarîdikin, ne weke hev jê fehm dikin? Sembol ji bo xwendevan ji xwe re wateyan hîlbijêrê mecalê fireh dike û bêsînoriyeke hîlbijartina wateyan dide xwendevanan.

Di peyvekê de gelek wateyan didin ber têgihîştina xwendevanên xwe.

Stephan Mallarmé, di nivîseke xwe de vê rastiya sembolê wisa tîne ziman. "helbestvan mijarê hemûyî digire destê xwe û wisa nîşan dide. Ji bo wê ya di helbestê de, her tim tişteki ku mirov lê bigere û bibîne divê hebe."

Sembol dihêle ku xwendevan bi pêhesîna xwe, bi binhişê xwe, bi zanîna xwe ji helbestê fehm bike. Helbestvan bi peyvên ku çend sembol di nav xwe de kom kirine, dikeve nav cîhana mijarê û mijarê bi pêş ve dibe. Bi şêweyeke fireh ramana xwe pêşkêşî xwendevanê helbestê dike. Pêhesîn (reng, deng, bêhn) bi van nîşanên pêhesînê helbestvan singê hûnandina helbesta xwe dikutin û bi rêsa helbesta xwe diwarê di navbera pêhesînan de

radikin. Bi sembolan, bi peyvên û bi xeyalan wana di nav hev de di nîgarekî de nîşan didin û digihên rastiya giyanê helbestê. Helbestvanên ku vêya bikin, ew in yên ku rewşa xwezayê diafirînin û giyanê wî/wê, wê rewşa xwezayê tînin ber çavên me. Em li van rêzikên Henri de Regnier binihêrin. "Pêtiya barana çavên te, şev xewa xwe diraze. Gulên kennîsan, şanaziya tebaxê ne" Helbestvan bi sembolan giyanê sirûştê dinivîse. Ji bo bidestxistina nehênîyên xwezayê û têgihîştina tiştên ku di bûyeran de veşartîne ji bo wana ji tariyê derxe roniyê kar dike.

sembol ji merc û rewşa helbestvan, ji têgihîştina dîrok û çanda wî/wê tê

Helbest; strana dil e. Ev stran di dilê helbestvan de tê gotin û di dilê helbestvan de dimeye. Dema stranê ji dilê xwe dirijîne ser kaxiz, taybetmendiyên xwe nîşan didin. Şeweyê gotinê, bi giştî ne veşartî ye, lê ser tiştan digire û vekirî nabêje. Bi hostati wana destnîşan dike. Danasîneke baştir Rodenbach dike, "helbesta sembolîst xewn e, kitekit kirine. Hûnera bi ewran re rêwîti ye. Ev huner ji bo bibe nuqtaya rabûna rastiye bi tenê ji sîtavan sûd werdigire. Ji kaxizê li bin pênuşa helbestvan nehênîyên xwe berdidin bêbîniya kendalan." Helbestvan, ziman dike kilita vekirina deriyê binhiş û xeyalê. Vê kilitê dide destê xwendevanê xwe.

Helbestvanê sembolîst ne rêzik, tevahiya helbestê giring dibîne. Bi rêzikên azad pêşkêşkirin, ne li dijî armanca raman û zimanê helbestê ye. Helbestvan, ne rêzikeke bi tenê, hemû rêzan bi hev re pêşkêşî xwendevanan dike. Naxwaze ku xwendevan bi tenê helbesta wî/wê di hin rêzikan de binirxînin. Dibêjin dema ku xwendevan li daristanê binihêre, pêwîst e hemû darên di daristanê de û tiştên din bi hev re bibînin. Wana bi hev re binirxînin. Ne dareke bi tenê, dar, giya, çûk, ajal, kulîlk, gol û çêmên ku hene, wan hemûyan bi hev re bibînin. Bi ahenga dengê çûkan re, firîna pirpirikan bibînin û wisa nirxandina xwe bikin. Helbestvanên ku rêzikên azad baş bi kar binin, hestên xwendevan yên kûr û dûr ji xewa giran hişyar dikin û wana tînin coşê. Ev rêzik dikin ku xwendevan xwe bi xwe bipeyvin. Guftûgoyan di nava wan de didin destpêkirin. Lê mixabin piraniya guh û çavên xwendevanan hê jî di bin bandora helbesta

kevn de ne. Helbestên kêş û qafiye wan yek e. Helbesta kevn aliyekî wê yê rihetiyê heye. Dengê wê li guhan xweş tê û mirov zû dikare ji ber bike. Lê helbesta bi sembolan tê nivîsandin ev mafê rihetkirinê ji destên xwendevan girtiye. Helbestvanên simbolîst bi rêzîkên azad û kêşa wan ne yek helbestê dinivîsin. Tiştên dixwazin bêjin, fehmkirinê ji xwendevan re dihêlin. Li gorî hin pêşengên simbolîst, danaşîna helbestê bi şeweyeke nehênî nêzîkbûna pêhesînên xwezayê yên nehênî ye. Ev pêşeng ne weke yên pêşîn hatine û çûne li qaşûla helbestê dinihêrin, ji qaşûlê pirtir li giyanê helbestê dinihêrin. Li dijî hemû form û rêbazên helbestê yên din, li xisûsiyet, rês û tevna helbestwarî dinihêrin. Dibêjin, "helbest nayê derbirin, derbirin bixwe ye." Lê nayê wê wateyê ku helbesta simbolîst, helbesta berê hatiye nivîsin red dike. Ew deyndarê form û rêbazên beriya xwe ye. Ji wana sûd werdigire û bi sembolan xwe bi pêş ve dibe. Ev şeweyê simbolîst ji bo rizgarkirina helbestê ji hin çarçoveyên teng, gava pêşîn e.

helbestvan ne ew kes e ku

peyama rastiye dide

Helbestvan; pêhesîn, xewn, bûyerên jiyanê û yên difikirin bibin, bi formê sergirti ji xwendevanan re pêşkêş dike.

Andre Beaunier, ji bo helbesta nû danasîneke wisa dike. "Hunera simbolîst li ber çavên çavdêran hunera boyaxkirina rastiye ye. Hunera simbolîst, hemû nehênîyên ku di rastiye de dixuyin, di nav rastiye de anîna meydanê ye"

Helbestvan ne peyambarê rastiye ye. Ne ew kes e ku qanûnan dinivîse û qanûnan bi rê ve dibe. Lê ne propagandistekî/e ku xweş dipeyve ye jî. Li gorî hostayên helbestê, helbesta ku her kes wê fehm bike, ew helbest karê helbestvanê ku hê jî kamil nebûye ye. Helbesta herî xweş ya ku xeyalên xwendevan wateyê jê digire ye. Ne fehmkirina hin sembolan û ne diyarkirina hin cihê helbestê ji bo estetîkê gaweke ku helbestvan nikare jê bireve ye. Peyvên helbestvan mîna peyvên pêxemberan, bi şeweyekî berfireh, curecure nîrxandin û wateyan di wan de heye.

Helbesta herî dewlemend, a herî kûr û herî bi bandor, ew helbest e ku her kes wek dixwaze ji xwe re wateyê jê digire û dinîrxîne ye. Têgihîştina helbestê jî weke jiyan me ye.

Hin ji me di konan de, hin ji me di berqefkan de, hin ji me di xaniyan de, hin ji me di avayiyên 20, 30 tebeqeyî de, hin ji me di vilayan de û hin ji me jî li kolan û parkan dijîn.

Em hemû dikarin li van wargehên jiyanê binihêrin. Lê em hemû nikarin di wan de bijîn û ji me nayê ku em di wan de rûnin. Yan aboriya me têrê nake, yan mercên ku em tê de dijîn nahêlin ku em bikevin nav xweşiya wan. Helbest jî wisa ye, her kes dikare bixwîne lê her kes jî helbestê weke hev fehm nake. Ji ber ku helbest di nav avahiyên nivîsê de vila ye. Bê çawa em hemû nikarin di vilayan de bijîn, em wisa jî nikarin weke hev ji helbestê fehm bikin. Têgihîştina helbestê, bi qasî jiyan vîlayê zehmet e. Bê çawa aboriyeke madî ji bo jiyan vîlayê pêwîst e, jî têgihîştina helbestê re ji aboriyeke têgihîştina giştî pêwîst e. Zanîna hemû amûrên jiyan iro û jiyan çûyî pêwîst e.

Simbol û wêneyên helbestê wisa fireh û dewlemend in. Di wan de evîn, dilêşî, xweşî, derd û kul, şadimanî, felsefe, realîteya civakî û neteweyî, fikir û raman, xeyal, hest û wekî din gelek tişt di nav hev de tînin hûnandin. Ji bo ku helbest hunereke pir wate ye, têgihîştina wê jî wisa bi hêsanî nabe.

Bi giştî tiştê jê re helbest tê gotin ji pêhesînekê pirtir ji pêhesînên tevlihev tê girtin. Lê tiştên ji pêhesînê girtine çavdêriya pêhesînê bixwe ne. Helbestvan bi saya çavdêriya pêhesînê, wê jî nav mij û morana binhiş dertîne û bi zimanê wê, wê pêşkêşî jiyanê dike.

Nivîskarên dirokê, felsefeyê, olê, birdoziyê, romanê, çirokê, gotaran, rojnamageriyê û wekî din, wateya têgihîştina nivîsên xwe didin.

Lê wateya têgihîştina nivîsên helbestê, helbestvan ji xwendevanên helbestê re dihêlin. Şeweyên têgihîştina xwendevanên helbestê li gorî nîgarên di serê wan de li helbestê dinihêrin û wisa têdigihên. Helbestvan rasterast nakevin nav mijarê. Bi wêneyan mijara xwe nîşanî xwendevanan didin û bûyerê weke heyî nadin. Bi peyvên ciwankirî, sergirti û bi destnîşankirina simbolên ku gelek wateyan di xwe vedihewînin, bûyerê didin û datînin ber xwendevanên helbestê. Tagor dibêje: "Cureyên wateyên peyvên helbestvan ên ku ji bo mirovan bi kar tîne hene, her kes peyvên li xweşa wan diçin ji xwe re dineqîne"

Dilberê eman

Omer FÎDAN

Sibe bibûya wê guh neda pêşniyazên doxtorê xwe û bedena xwe ya ku salan wek darên şivaka ku tê de li derve dinihêrt rizandibû wê bavêta derve û bi hêviyên ku dê wê rojê dilbera xwe bibîne bigeriya

Dildar careke dinê dev ji xew û xewnan berdabû, di nav xeyalan de avjenî dikir û xemên xwe difetisand di xemzeyên Dilberê de. Heyva çardeşevî ya li asûman dişiband şivakeke ku li ronahiya ebedî vedibe û destê wî di destê wê de diherikîn ber bi riya xelasiya ji taristanê, jîna derewîn ve.

Xeyalkirin tu caran nediguherand bi xewê û xewnan; dibû kulîlkeke kor li pey bêhna wê, pelekî hişk û xwe diavêt ber bayê porê wê, çoleke ji xwê li ber şilekiya lêvên wê, sêwiyekî stûxwar li ber germa-hiya destên wê, taveheyveke biriqokî di reşbelekiyên çavên wê de û nedixwest raweste û rakeve...

Tevlî ku ew qas difikirî jî nizanibû ka gelo wê pêşiyê çi bikira. Milên xwe lê bipêça û ew bikira girtiyê evîndariya xwe? Pozê xwe bi şanên li gerdena wê ve bişidanda û kezeba xwe binivanda di bêhna wê de? Çavên xwe li çavên wê biedilanda û avjenî bikira di hêsrên wê de? Tenê lê guhdarî bikira û bibûya bûkeke bi xêlî li ber govendgêriya dengê wê? Çi bikira? Çawa bikira?... Çi bikira, çawa jî bikira, wê Dildar ji delaliya dilê xwe hez bikira. Dildar wê wisa pir ji xwînşîrîna xwe hez bikira ku tu 'pir'an nikaribûya çiqasiya evîndariya wî vegota.

Her ku diçû şev dirêj dibû. Bêhnfişkê li Dildar xistibû, nav û dilê wî bi hev ketibûn. Dil nedihewiya, li şinahiya asûmanan digeriya. Nizanibû çima lê her û her di nav rengêkî şîn de evîn û evîndariya

xwe xwedî dikir. Wê sibe bibûya? Wê roj bihilata?... Bila sibe bibûya Dildar xwe biavêta derve lo dixwaze bila ne ji rojhilat; ji rojava roj bihilata; bila dawî li dinê bihata, axret û qiyamet li jiyanê bihebîlîna. Bila asûman bihatina xwarê, zerya derketina qeraxan, deşt li serê çiyayan bigeriya, stêrkan jî roj bi çavên serê xwe bidîtina. Çi dibû bila bibûya lê êdî bila sibe bibûya.

Sibe bibûya wê guh neda pêşniyazên doxtorê xwe û bedena xwe ya ku salan wek darên şivaka ku tê de li derve dinihêrt rizandibû wê bavêta derve û bi hêviyên ku dê wê rojê dilbera xwe bibîne bigeriya. Wê bigeriya. Sebra wî nemabû. Ne wî dikaribû li benda jiyanêke din bisekine û ne jî pençeşêra ku dest kiribû qirikê, mirinê dikaribû li benda hatina dilbera wî û wî bisekine.

Mirin li devê derê wî bû. Hêviyên wî ji wî ciwantir bûn lê tirs ketibû nava dilên wan jî. Gelo wê dilbereke ku dildariya wî di dilê xwe de bihewîne bidîta? Evîna wî zor dida nav û dilên wî. Ciwaniya bedena wî cîhangîriya dilê wî hilnedigirt, wê pîriyê çi ray lê bikira? Na! Nikaribû li benda rojê jî bisekine. Şivaka xwe vekir, li ser nivînên xwe çarmêrkî rûnişt, destê xwe avêt pişt guhê xwe û dengê dengbêjiya xwe bi ser şevê xist. Kilama ku ji çardeh saliya xwe heta heştê û yek saliya xwe gotibû disa got; Dilberê eman, eman, eman...

Min ji te hez kir

Berfo BARÎ

Ji bo min
Pineyên xizaniyên xwe
Û derbên şivên ter
Yên bedena min
Reşbelek kiribûn
Bi lorînên te dinixumand

Û kînorên giran
Yên di laşê xwe de
Bi germahiya tiliyên te aş dikir
Ji bo min di firehiya dilê te de
Xeyalên bêtixûb dibezand
Gava ku li hezkirinekê digeriyam...

Min ji te hez kir
Ji çîrok, ji çavên te
Lehengên çîrokên te ez bûm
Û te ez bi çavên xwe vedigotim

Wextê ku
Hemû av dimiçiqîn
Ji bo min
Pineyên xizaniyên xwe
Û derbên şivên ter
Yên bedena min
Reşbelek kiribûn
Bi lorînên te dinixumand

Û kînorên giran
Yên di laşê xwe de
Bi germahiya tiliyên te aş dikir
Ji bo min di firehiya dilê te de
Xeyalên bêtixûb dibezand
Gava ku li hezkirinekê digeriyam...

Min ji te hez kir
Ji çîrok, ji çavên te
Lehengên çîrokên te ez bûm
Û te ez bi çavên xwe vedigotim

Wextê ku
Hemû av dimiçiqîn
Û hemû derî
Li zarokekî dihatin girtin
Tu dibûyî kaniyek
Tu dibûyî deriyek
Vedibûyî, vedibûyî, vedibûyî
Min tu bi ser xwe ve wer dikirî
Û di sivdera te de şîn dibûm

Bi rengên biharê bûn fistanên te
Berîkên wan bi destên xêşimekê
Bi kêlên gir li ser bejna te hatibûn dirûtin
Ji bişkêfê wan de xar
Diketin nav kuçeyan
Bi lez û bez neşîtek gendir mêndir
Li pey wan

Min ji te hez kir
Gava ku di şevteriya pîrebokî de
Çiraya kurdî
Erdnîgariya welatekî
Di hineya porên te de dibiriqîn
Û min di xilmaşiya şevê de
Lava ji Yezdanan dikir
Ku şev neqede ku çira netefe
Ji bo erdnîgarî
Çar
Çarpar
Çarpar nebe.

Şahmaran

Hogir **BERBIR**

Vê carê qet sond nexwe, ji ber ku ez dizanim ne ku nêz be, ne ku dûr be tê xiyane-
yanetê bi min bikî. Madem ku tu naxwazî li cem min bî û te bêriya jiyana xwe a
berê kiriye, kerem bike bide pêşiya min, ez ê te bibim cihê te.

Rojek ji rojan, dibên sê hevalên hev derketi-
bûn gerê û di nava rêla mezin de ji xwe re de vir de wir de çeng dibûn. Bi gerê re bîrekê di nava daran de dibînin. Dara ku li ber bîrê ji serê wê nedixuya, ya hewrê, girover bû. Çangîr ji hevalên xwe vediqete û dihere ser bîrê. Di hundirê bîrê de kêstekên hungiv dibîne. Bangî hevalên xwe dike û dibê:

- Hevalno, di hundirê bîrê de hungiv heye, werin ez ê derxim û em ê bixwin.

Hevalê wî li ber bîrê disekine û Çangîr xwe bera binî dide. Bi ketina hundirê bîrê re dihere û dihere, dawîya binê bîrê nayê û di nava kêstekê hungivan de disekine. Hevalên wî ji li jor, li ber devê bîrê li benda Çangîr in, disekinin nasekinin deng jê dernayê, ditirsin û ji wir direvin. Xwediyê Çangîr pê dihesînin ku ketiye hundirê bîrê û xwedî bi hewarê de tîn, lê mixabîn di hundirê bîrê de tu tiştî nabînin û bi dilên şikestî û stûxwar vedigerin.

Lê Çangîr, di hundirê bîrê de, li ser kêstekên hungiv, li qozîyekê weke serê derziyê ronahiyekê jê dida der û dida serçavê wî, dît. Çangîr ber bi ronahiyê ve diçe û bi destan wê qula serê derziyê fireh dike û çî dibîne çî nabîne; xasbaxçeyekî ji her mêwe û tahmîşê dinê di nav de, xuşîna aveke zêlal ku melûl melûl lê dilorîne û pê re dengê çûk û beytikan, bi yek carê bala wî kişand, xwe bera hundirê qulikê da û ket nava xasbaxçe. Çawa ber bi serê kaniyê ve çû, çav li marekî



ket ku serê mar serê mirovan bû, bi taç û zêr û gerdenan xemilandî, gewdeyê wê ji gewdeyê maran bû, bi her dozdeh lingên xwe ku her serê lingekî marek; werê xweşik bû, hew bi ser de dibû, mîna tav û hîvê, agir û avê, şev û rojê bû. Çangîr tirsîya û xwest

bi paş de vegere, lê wê qula wenda bûbû û li cihê xwe asê mabû. Kete bédengiyekê û çavên xwe ji tirsan xist çavên mar. Mar xwe bera ber da û jê re got:

- Metirse, tu li vir mêvanê me yî û tu bi xêr hatiyî! Li vê şox û şemala min nenêre, tu zêrê nadim te... Niha em ê te derxin hem-ber şahê şahan, şahê me, Şahmaranê. Şahê me, Şahmaran ew qas ji mirovan kişandiye û zêrê diye, bawer im wê zêrê û kîna ku pê re ava bûye, nabe kîn û li te venagere. Qet metirse!..

Çangîr bi tirs lê veğerand û got:

- Mîn çî bi we daye kişandin û çî zirara min gihîştîye we?

Û xwe bi paş de kişand. Mar lê nêrî ku çî-qasî bi bendê keve, ew qasî ditirse, gotin zêde dirêj nekir, da pêşiya Çangîr û berê wî da cem şahê xwe, Şahmaranê. Çangîr çawa çav li Şahmaran ket, bi xweşikbûna wê dîlmest bû û çavên wî weke pîzotê agirê sor ji hev vebûn. Şahmaran jî çawa Çangîr dît, dil lê avêt û di nava hest û ajoyan de çû û hat, dil berdayê û pê evîndar bû. Milekî ji kêfan, milê din jî ji qehran, kete nava dudiliyê. Çangîr bi vê rewşa Şahmaranê hîn bêhtir

tirsiya û xwest bi derekê ve bireve, lê cihekî ku biçûya nedît û weke kevirekî li cihê xwe asê ma û bi tirsekê kete ricifîneke bêwate. Şahmaran bi ber de çû û got:

- Weha nabe, min berê ji we mirovan pir kişandibû û soz dabû ku careke din dernekevim hemberî beşeriyên.

Çangîr rabû serboriya xwe ku çawa kete hundirê bîrê jê re rave kir û domand:

- Min bêriya mala xwe, dê û bavê xwe kiriye. Min tu zerar nedaye we, ka min berde ku ez herim mala xwe...

Şahmaranê lê vegerand û got:

- Na, tu naçî!

Çangîr li ber xwe da û got:

- Çima naçim, sebab çi ye?

Şahmaranê got:

- Min ava jiyane ji nava xwîna xwe dilop bi dilop da der û da Nebî Silêman da ku hêz û qûweta hişmendiye pê re ava bibe û hukmê li ser her celebê beşerî û ajalan bide avakirin. Min ev soz jî jê stend ku li hember min nede xebitandin. Lê, Nebî Silêman rojekê Belqizayê da pêşiya xwe û bi hev re derketin nava rêla mezin û bîbînî. Gava ku kete nava rêlê, xwest ku tevahî celebên ajalan li ber xweşikbûna Belqizayê têxe tev, dêlindêzekê ava bike û tevahî celebên li ber xweşikbûna wê serî bitewînin. Ez tenê neçûm neketim nava wan. Nebî Silêman rabû qasidê xwe teyrê hudhud şand pey min ku ez bêm tevî wan bibim û teyrê hudhud ji min re got:

- Ya celebê ji ajal û beşerî; nêvî mar û nêvî mirov, Şahmarana çavbirqok û giyan xweşkok! Tu çima nehati seyra Belqizayê û li ber xweşikbûna wê mest nebûyî?

Min rabû lê vegerand û got:

- Li ber xweşikbûna Belqizayê, xweşikbûna min dîkuje ne wer? A din, xweşik li xweşikbûnê digere, xweşik li xweşikbûnê tê! Ji nebiyê xwe re bêje, ez xweşik û ew xweşik, du xweşik li ba hev dibin, na?

Teyrê hudhud ji cem min çû û çend gav neavêt careke din li min vegeriya û got:

- Nebî dibê bila bê, her xweşika ku heye

ji xwe re xweşik e!

Nebû, mecbûr mam û min da pey teyrê hudhud û çûm nava wan. Çawa ez û Belqizayê çav li hev ketin, ji ber xweşikbûna min wê ji xwe fedî kir û ji ber xweşikbûna wê min fedî kir. Me her duyan xwe li ber hev û du dirêj kir û serî tewand. Tevahî celebên ajalan û beşeriyên jî serî li ber me tewandin. Belqizayê hew xwe girt û berê xwe da Nebî Silêman got:

- Ya Nebî, ya ez û ya ew?

Nebî Silêman lê vegerand û got:

- Ev terciha min e! Terciha min jî tu yî, ne ew e. Sebeb, ez beşerî me û tu beşerî yî. Lê ew, ew jî nêvî û berjortir mirov e û jî nêvî berjêrtir jî ajal e, ji ber vê ne ew!

Wê çaxê di nava ew qas celebên beşerî û ajalan de ez biçûk xistim. Rabûm ku ji cem wan biçim, Nebî Silêman li min vegeriya û got:

- Bi celebê xwe re cim bibî, bi celebê din re cim nebî! Ajal û beşerî bi hev re dibe?

Min lê vegerand û got:

- Ne te digot ez û ne kesekî din, lê çima ji ber xweşikbûna Belqizayê tu guherî?.. Madem kî wanî ye, ji nuha û pê de di şêwr û dîwanên te de cî nagirim. Marê qol û tirba spî? Û xwediyê wê sozê me ku heta ku vê xweşikbûna min û xweşikbûna Belqizayê hebe, bi şermî tim qala te û vê rojê bibe!

Nebî Silêman li min vegarand û got:

- “Heta hetayê ku heya dinya hebe wê qala xweşikbûna te bibe lê tê tim bi ser zik biminî, cezayê vê rojê bikişinî.”

Û berê xwe da Çangîr û got:

- Wê hêz û quweta hişmendî ku min dabûyê, her weha li hember min da xebitandin û li soza xwe xwedî derneket. Ji wê rojê pêve vê xweşikbûna min bi min re ma, bi ser zik im û bi vê xayintiya ku beşeriyên bi min re kiribûn mam.

Çangîr çav li xwe sor kir û got:

- Nebiyê Xwedê tiştê ku aniye serê te, tu çima dixwazî bi serê min derxî? Nexwe çima min bernadî? Ez ne weke nebî me, tiştê ku wî anî serê te naynim serê te, bawer bikî û

soz didim te. Ez ê vê bi te bidim qebûl kirin ku mirov xiyaneî bi te û xweşîkbûna te nekin.

Şahmaranê got:

- Na!.. Tê jî xiyaneî li min û xweşîkbûna min bikî. Ji ber ku tu jî beşerî yî. Beşerî jî koka celebên xwe ve qels û lewaz in. Mihe-qeq cihêkî te ê lewaz heye û cûreyên xiyaneî jî cûr bi cûr in. Li ser rûyê erdê evîn mirina dostan dide ber xwe. Milê lewaz mirin e. Lewaziya min, evîndariya li hember te ye.

Bi vî awayî gelek roj ketin navberê û Çangîr hew debar dîkir, ne tiştek dixwar û ne tiştek vedixwar, jî hal de ketibû. Çangîr çiqasî diqeherî, ew qasî Şahmaran jî pê re diqeherî, reş û şîn dibû. Hew xwe zêft kir û bangî Çangîr kir û got:

- Belê, ji ber ku jî navê berjortir ez beşerî me, dilberketina min a li hember te xwe dide der. Vê carê qet sond nexwe, ji ber ku ez dizanim ne ku nêz be, ne ku dûr be tê xiyaneî bi min bikî. Madem ku tu naxwazî li cem min bî û te bêriya jiyana xwe a berê kiriye, kerem bike bide pêşîya min, ez ê te bibim cihê te. Lê jî te daxwaz dikim ku tu qet neçî şerşokê û giyana xwe rê tu kesî nedî!

Şahmaranê weha got şûn ve, çend pûlên rengên cûr be cûr û birqok jî giyana xwe kir, bi giyana Çangîr ve zeliqand û jî ber çavê wî wenda bû. Marên dinê dan pêşîyê, ew heta devê birê birin û bi paş de vegehiyan. Çangîr jî ber ku soz dabû Şahmaranê, neçû bajarê xwe û jî bajarê xwe gelekî dûr, li bajarekî din bi cî dibe.

Li cihê ku lê bi cî bû, Şahê wî bajarî bi nexweşîyekê dikeve, dermanê nexweşîya wî jî ava heyatê, jî dilopên xwîna Şahmaranê ye. Şah dizane dermanê wî li cem Şahmaranê ye lê newêre xwe têxe torê. Wezîrê şahê wî welatî çî hekîm hene tîne ser, eynî bersivê jî devê wan dibihîze û hew debar dike, diçe cem şah û dibêje:

- Şahê min, tevahiya hekîman dibêjin derman li cem Şahmaranê ye. Ka destûrê bide min ku ez Şahmaranê bibînim.

Ji ber nexweşîyê şah hew debar dike û di-

bêje:

- Temam bine, zû ji min re bine!..

Wezîr tevahiya beşeriyên nava bajêr dixist şerşokê, li canê wan dinihêrt ku pûla Şahmaranê bi canê kê ve heye tune ye bi-bîne, da ku Şahmaranê bi vî awayî zêft bike. Çawa Çangîr dibin şerşokê, pûla Şahmaranê bi canê wî ve dibinin, digirin û dibin cem şah. Şah berê xwe dide Çangîr û dibêje:

- Çangîr, dermanê min li cem Şahmaranê ye. Ka Şahmaranê ji min re bine, ez ê te bikim wezîrê xwe û keça xwe Şahbanûyê jî bi te dim.

Çangîr pêşî qebûl nake û li ber xwe dide. Şah dibîne ku tiştek jî Çangîr dernakeve, keça xwe Şahbanûyê dişîne cem û Şahbanû bi fen û fita li ber digere, bi şîrê teyr û tilûra xwedî dike, wî jî rê derdixe û pê re radikeve. Çangîr li ber vê dîlnizmbûna Şahbanûyê jî xwe diçe û daxwaza şah qebûl dike. Dihere ber devê birê, bangî Şahmaranê dike ku çawa Şahmaran bi kêf derdikeve devê derî; leşkerên ku li nava rêlê xwe veşartibûn bi yek carê dora Şahmaranê digirin û zêft dîkin. Şahmaranê dixin sêniyeke zêrîn û dibin ber Şah. Çawa Şahmaran li ser sêniyê çav li Çangîr dikeve, qederekê bi bédengî li çavên wî dimeyzîne û paşê jê re dibêje:

- Mîn ji te re gotibû li ser rûyê erdê evîn mirina dostan dide ber xwe. Milê lewaz mirin e. Lewaziya min evîna min a ji bo te bû. Te xayîntî bi min re kir, min jî xayîntî bi celebên xwe, bi maran re kir. Aqil di serê we û jehr jî di dilê we de ye. Ê min jî aqil di dawîya teriya min serê zîlê, jehr jî di serê min de ye.

Şah rabû xwîn jî teriya Şahmaranê mêt û vexwar, çend deqe neket navberê mir. Çangîr jî rabû jî xwîna di serî de bû mêt û vexwar û ew jî mir. Ji wê rojê pêve Şahmaran di nava gel de mîna hekîm û loqman hat bibîranîn û di nava rûpelên dirokê de li cihê xwe ê efsanewî cî girt.

Çîroka me çû diyaran xweşî li hazir û guhdaran.

Ji devê **Xedîce DAŞÇI**
Herêm: **Dêrika Çiyayê Mazî**



Berçema MIŞRÎTAN

1.

Kortalan vedide destê min î
li ber rûyê min î jibîrbûyî
(Ax! Her tişt wek tiştên jibîrbûyî
di hişê me de bima)
dawiya dawîn tu yê nebî kesekî
ku li zanîngehan bi zorê
bi zarokan didin hînkirin jî.
wek helbestvanekî/e ku
hê nû karê xwe selimandiye
û bera bera berê xwe dide Xwedê
jî ber ku qeweta wî/wê
tenê digihîje Xwedê
- Bi Xwedê! Bi Xwedê!
Yekî kuştinê hebe ew jî Xwedê ye-
Dibê û serî li hevokên fortdar hildide-

2.

Teew!!! Ez...
vêga bi qasî zanistekî nezan im
bi qasî wêneyê Munch qarîn
bi qasî çîrokên Bilge dîn im, serhildan im
jî xeynî fikrên min ên xwekuştinê
qeşmereke dera han im

tu xêra vî seriyî li kesî nabe
tu xêra vî seriyî li kesî nabe

3.

Hundir mişt bi hêmayên sansûrkirî
wiha bi qehr û coş
û tu
tu dibê qey bi xwe re ketiye angaştê
wiha radihêjî kêfa karkirinê
û îmanê li nefamkirinê diçikînî dibînî

peyv bêhnçikiyayî mane
kurmên kovî di hundirê min de
radipelikin devê te
ez li vî bajarê ku îlhamê dide min
bi cinabet
di ber serê sujdeya diya xwe de
diçim û tēm
gunehkar im

masî jî çûn ber golikan
cangorî me
êdî goristana jî bejna xwe re difesilînim
gunehkar im
û goristan jî nema min diezimînî

2007 Agirî

Rûspiyê edebiyata me

Mikaîlê REŞÎD

Di sala 1955'an de li Êrîvanê dîsa rojnameya "Rya Teze" tê çapkirin. Li dora wê lawên kurdan ên ku xwendina bilind kiribûn berhev dibin. Di nava wan de, wisa jî Eliyê Evdirehman wek serwêrê parê dixebite

Eliyê Evdirehman di nav edebiyata kurdên Sovyetê da navekî teze nîn e. Ew xudanê çend kitêban e. Ewî gelek mîqale, serhatî, roman, helbest, destan nivîsiye, afirandinên bedewîtiyê wergerandîye.

Eliyê Evdirehman di sala 1920'î li welatê Romê ji diya xwe bûye, di wan salan de halê kurdan di wî welatî de giran bû. Elî şeş salî bû, wexta mala bavê wî tevî qebîla kurdan ya Birûkan ji zilma diwana Romê direve, tê welatê Şewrê (Sovyet) dihêwire. Hema li vir jî lawê kurd xwendinê distîne. Xeyn jî zanistgeha kurdan a li Êrîvanê, Eliyê Evdirehman wisa jî Enstîtuya Bakûyê ya pedagojiyê xelas dike. Salên berî Şerê Weteniyê (Şerê cihanê yê duyemîn) yê mezin û pey şêr re ew wek dersdar, serwêrê mektebê, serwêrê para xwendinê di nehiya Basargêçarê de mamosteyan mekteban bûye ya girêdayî wezaretê Ermenîstanê ya Ronkahiyê de. Eliyê Evdirehman tevî şerê weteniyê yê mezin dibe û wek partîzan wexteke dirêj di pişt dijmin de şer kiriye.

Di sala 1955'an de li Êrîvanê dîsa rojnameya "Rya Teze" tê çapkirin. Li dora wê lawên kurdan ên ku xwendina bilind kiribûn berhev dibin. Di nava wan de, wisa jî Eliyê Evdirehman wek serwêrê parê dixebite. Hema li vira jî, xeyn jî mîqaleyên pirsên bi rojevê ve girêdayî, ew dest bi nivîsandina afirandinên bedewîtiyê dike. Riya Eliyê Evdirehman a edebiyatê jî bi vê rojnameyê dest pê dike. Paşê afirandinên nivîskarên kurd ên sovyetê, kitêbên dersan dertên.

Eliyê Evdirehman kitêba xwe ya pêşîn di sala 1959'an de çap dike. Di berhevoka "Xatê Xanim" de çar afirandinên cihê hene. Ew qala jiyana gelê me ya zemanê berê û ya îroyîn gili dike.

Di nava edebiyata kurdên Sovyetê de des-

tana cimaetê ji bona dasekinandina tarîxê, nîşandayîna şerê gel, seba serbestiyê cara pêşîn Eliyê Evdirehman bi kar aniye. Paşê wê destana gel seba Erebe Şemo dibe qinyat. Ew di romana xwe ya eyan "Dimdim"ê dinivîse. Helbet, li cem wan her du nivîskaran ruhê zargotina cimaetê hatiye parastin, a ku xwe bi salixên tarîxê yê berk ve bend nake. Di hîmê wan afirandinan de qewimînên wisa hatine danîn, yê ku bi rastî jî nava jiyana gel de qewimîne û ji bona mitalan qinyat dane wê.

Di bingeha serhatiya Eliyê Evdirehman de afirandina zargotina me "Xatê Xanim" hatiye danîn. Nivîskar serencema zargotina gel fireh kiriye û ji hidûdên teng derxistiye. Ew xebitiye ku hîmekî bêtir real bide qewimînên, lê li cem wî dîsa reng û awazên gel ên hikayeyî hatine parastin. Afirandina Eliyê Evdirehman pesinandina jina kurd e, ya ku di rojên oxirmeyên giran de dewsa mîrê xwe digire. Bi alikariya nîgara jina kurd û siltanê romê nivîskar şerê diwana zêrandinê û gelê zêrandî nîşan dide.

Wextê Eliyê Evdirehman pê kire meydana edebiyatê, ewî jî xwe re tîmaya xwe anî. Ew tîma halê kurdan e di şertên diwana Tîrkiye û Îranê de, li ku derê xweserî bê hed û hesab be. Li vira gumana kurdan her tenê sîleh e û dilê şêran e, ku defa di singê ewladên cimaetê de dikute. Serhatiya mezin "Morof" û romana "Gundê Mîrxasan" der heqê halê kurdayî bê çawa extiyar di bin qolê siltan û şah de gili dikin. Kurd xweyê ocax û malên xwe nîn in di wan welatan de zordarî û neheqî serdest in. Eliyê Evdirehman xwediyê romana "Şer Di Çiyana De" ye jî.

Eliyê Evdirehman her wiha helbest û destan jî nivîsîne. Afirandinên helbestkî di berhevokên "Dê", "Hesreta Min" û "Gulistan" de hatine çapkirin. Kurd û Kurdistan di nav hel-

bestên wî de mîna tèleke sor derbas dibin.

Romana wî ya bi sernavê “Xatê Xanim” van dawîyan li Kurdistana Bakur, ji aliyê Weşan-xaneyê “Belkî”yê ve hate çapkirin.

Eliyê Evdirehman di sala 1999’an de li Almaateya Qazaxistanê jî vê dinyayê bar kir.

Beşek ji berhema Eliyê Evdirehman “Morof”ê

Şev e. Li ezmanê sût steyrk ketine govendê. Li dor û bera her tişt siteqirîye, ketiye xewa şîrin. Şemo û hevalêd wî texmîn kirin, ku wext hatiye pêz jî guhêrê rakine şevînê. Çiqas xweş e berbanga havînê li Bitlîsê... Bîna pêjekê, rîdêse, beybûnan, gul û sosinan merivan dihin-gêve. Hewa temîz tijî qefesa merivan dibe û xewê jî çevan direvîne. Qiraviya nazik duhlê çarixê hişk dikeve, wana nerm dike û teze meriv xwe dihesê, ku pêçî û gûzekê wî jî qalibê hişkolekî hêsa bûn. Xirmîniya keriyê pêz e, diçêre...

Wexta pez ghiştê geliyê piş malan, nişkêva nalenalek kete guhê Şemo. Berê wî hew zanibû, ku ew bûmê şevê ne, derketine nêçîrê û gazî hev dîkin. Paşê Şemo tê derxist, ku ew ne nalîna bûman e, lê ew intîn û ofîna meriyan e.

Şemo gazî hevalên xwe kir, pez hîviya wan hişt û dakete gêlî. Ew çiqas berjêr dibû, ewqas intîn nêzik dihatê bihîstinê. Şev e safî bû û bê hîv bû, hema Şemo rîya xwe bi nalînê texmîn dikir, pêşberî wî qeretûyek hate xanêkirinê. Wexta Şemo nêzikî wî qeretûyî bû, ewî dît ew zinar e, li ber wî zinari merikî dikire ofeof. Şemo daçiviya erdê û ecêbeke giran ber çevê xwe dît, ku axîn û ofîna Morofê hevalê wiyî şivan bû. Ew şivanê Xalit begê bû. Şemo pêra pêra tê derxist, ku beg ecêb aniye serê Morof, çimkî kirinêd beg şivanan ra eyan bû, tim car şivan di wî gelî da rastî meytan dihatin, lema jî gundiyan navê wî geliyî danibûn geliyê Qetilê.

Şemo hêdika Morof hilda ser milê xwe û berê xwe da hevrêz. Wexta ewî Morof bire jorê, hevalê wî temam topî ser Morof bûn. Gunê wana pê dihat, ku ew xortê kinêzî delal ketiye wî halî. Wana diranên xwe diçirikandin, lê gef li kê dixwerin, bi xwe jî nizanibûn; ne jî ewana qêmiş dibûn, ku jî Morof bipirsîn.

Niškêva Morof serê xwe hilda, dor xwe nihêrî û kire qîrîn: “Begê min, gunê min çi ye?”. Û careke dinê kesereke kûr hatê û bi xwe va

çû. Şivan rind haj jî xeysetê Xalit begê hebûn; gelek caran, wexta ewî meriv didane cezayê, laşê wana digirt û davîte geliyê Qetilê, ku debe wana biperitîn. Lê sibetirê beg xulamên xwe dişande gêlî, eger ew merî hela sax bûya, qemê xulama dewsa diranêd deban digirt û ew şuxul dianîne serê wan.

Şemo dezmal jî dora kolozê xwe vekir, nav ava elbê da şil kir û danî ser eniya Morofê kever. Hevalan potê xwe avitibûne ser û dora wî top bûbûn.

Xêleke xurt derbaz bû. Morof ser hişê xwe da hat, dît ku dor û berê wî hevalêd wî ne. Livat bi Morof ne dibû. Lê ewî dixwest kulên xwe ber hevalan birêta. Ewî hêdika gote hevalan:

-Gidîno, di bextê we da me, zulma ha nabe... Xûnxur cimaetê ra nabin yar. Nîvro, wexta min pez vî gelî ra dajote bêriyê, nişkêva berdîra qerqas, ku desteka Xalit begê ye, jî berpala zinarê şîn hol bû û jor da ket. Nebixêr, lingekî berdîrê şikest. Ez bi xeysetê beg beled bûm. Min wê sehetê pê kêrê dar şimşat kir, bevşîk hazîr kir, kirasê xwe êxist, qelaşt, lingê berdîrê pêça. Min berdîr hilda ser stuyê xwe û mî ajot, berbi bêriyê çûm. Ez di nava xûdanê da bûbûme av. Hûn dizanin berdîre çiqasî giran e, lê gelo min dikaribû berdîr wira bihiştê? Wî çaxî begê ez bidama ber qeman. Nebixêr beg nizamî seba çi hate bêriyê, çawa ew çev li berdîrê ket, beg hew dizanibû lingê ezizê wî şikestiye û derdê wiye kevin – reva biraziya wî, rabûna cimaetê mîqabilî wî, ewî ser min da rê, ew gişk wê demê bîr anîn. Hema ewî mecal neda min û ez dame ber qamçîyan, pihînan, pelan, bi vê yekê dilê wî hêsa ne bû, emirî li ser xulam û xizmetkaran kir. Bi emirê beg xulaman ez hincirandim. Ez bi xwe va çûm û dû wê ra tu tişt nayê bîra min. Tenê niha min çevên xwe vekir, min dît hûne ser min ra sekinîne.

-Ax... çiqas çetin e ev roja, wisa jî kal û bavên me ev roja derbaz kirine û jî derdan kor-pûç bûne, emê jî wisa ne seba tiştêkî kor-pûç bin. Ewî murxuzê bê îsaf ne seba tiştêkî ez kirime vê rojê. Xalit begê li we bihesê, wê wisa jî bîne serê we.

Gişkan aliyê zomê nihêrî, dîtî zomeke si-teqirî ye, deng jê nayê. Wana dixwest ew bibirana cem xwe, lê nedibû...

Morof heta berbanga sibê bi hevalên xwe va li wir ma û paşê gote hevalên xwe, herin, di bextê we da me.

Şemo got:

-Morof, birê min, sibe ye, Xalit begê binhêre çika tu miriyî, yanê na, eger ne mirî bî, wê te bikuje. Geli lawikan, zû bikin em Morof biguhêzine ciki mayîn.

-Kuda?

-Zaxa gera Dewatiyan û emê hertim dizî wî xûnmijî va bêne cem te. Belkî pak bî û herî bighijî êleke mayîn.

-Na, na... Ez naçim, bira min bikuje. Morof got:

-Lawo, tu dîn bûyî, nayê bira te, ewî ew ecêb jî anî serê Heso, Bekir, Reşid û ew di axiriyê da jî kuştin. Wisa jî anye serê te.

Wana qirar kir, ku Morof biguhêzine qendîla Dewatiyan, mixara Şivanan û wisa jî kirin. Cî û nivîn ji wî ra danîn, misinê avê tije kirin û danîne ber serê wî û xatirê xwe heta sibê ji Morof xwestin.

Sibe safî bû. Pencên tevê xwe avîtine bedena çîyan. Dûmana sibê noli hêratiya gewr serê çîya aliyaye. Kew ji xewê vediciniqî, ji hêlîna xwe difiriya, qulozî hewê dibû, baskên xwe vedikirin, te digot qey di nava hewê da sovekarîyê dike. Hocehoca şivana ye, hêlehêla gavana ye, kalîna berx û miyan e, hirîniya menekîyan e. Her ruhberêk rabû piya, bawîşkên xwe ji xwe dadiweşandin, niqoyî hewa sibêye xweş dibûn û beşer lê vedibûn.

Xalit beg ji konê deh sitûnî derkete derva, sê caran tevîzî da xwe, dora xwe zivirî û berê wî kete newala Qetilê. Nişkêva berdîr û kirinên Morofê mayîn ketine bîra wî. Bijangê wî noli diriyên şîlanê daliqiyane ser çevan.

Wî bi dengê hêrs gazî xulamên xwe kir. Wê sehetê Dirbo û Tajdîn ber beg sekinîn. Herdu noli kelbê ser darînekê, timê emirê beg rind diqedandin, dihatine hesabkirinê piştovanêd beg û zulmeke mezin li gundiyan dikirin. Cimaetê navê ekis li wan kiribû. Ji Dirbo ra digotin Pelengbeş, lê ji Tajdîn ra digotin Devrût.

Beg nêzikî wan bû û got:

-Lawo, "dar ser koka xwe şîn dibe". Tê xa-

nêkirinê, ku gundiyan derheqa dê û bavê Morof da ji wî ra gotine û ew dixweze heyfa xwe ji me hilde. Heyf, ku min wî çaxî hesabê wî ji tizbiyê ra derbaz ne kir. Lawo, ku her gundik lingekî peza min bişkêne, hespê min kevir kin, çeleka min geve bikin, wê li ku bisekine? Ne lazime rû bidine wan kelban. Herin binhêrin, eger deban Morof neperitandîye, lêxin wî bikujin, bila ji gundiyna ra bibe ders û ew biza-nibin ku ez Xalit beg im...

Dirbo û Tajdîn ber beg sucde dan û berê xwe dane gêlî. Wexta ewana çûne ciyê ku Morof lê bû, dîtîn, ku ew tune ye. Wana hew zanibû ku deba ew biriye û xweriye, ku berata wî bînin nîşanî beg dîn. Lê çiqasî ewana li Morof û beratê wî geriyan, tiştê nedîtîn, xêncî xûna ber kevire rêti. Hetanî nivro ewana noli du gurên devxûn nava zer û zinara da geriyan, lê tu tişt nedîtîn, por û poşman vegeriyane cem beg û her tişt jê ra gotin...

Beg mirûzê xwe kir û di bin lêvan da got:

-Hebe tunebe, kesîba ew birine malêd xwe.

Paşê ewî emir kir, ku çiqas malêd rênçbera hene, li gişka bigerin û wana gazî cem wî kin. Ew çûn malên wan geriyan, tiştê nedîtîn û êvarê gazî rênçberan gişkan kirin. Ewana gişk hatine hizûra beg.

Beg lingê xwe li erdê xist û hêrs bû, tema-miya bedena wî dihejiya, lê rênçberan hinekî dûr destê xwe ber hev va kiribûn, sekinibûn.

-Hi, gelî murxuzan, bêjin... kuye ew kopêka, we ew kuda veşartîye?

Gişkan bi hev ra got:

-Beg sax be, em nizanin hûn derheqa çî da ji me dipirsîn. Eger neheqiyê digerî, neheqî bi xulamê te dikeve. Qey wexta Morof kutane, ewî xwe bi mirîti avîtiye, xulama hew zani-bûye, ku ew miriye, lê wexta ew jê dûr ketine, ew rabûye û revîye. Îja gunê me çî ye?

Beg li wana hêrs bû:

-Çawa nava erdê min da meriv şev bireve û kesek wî nebîne? Ez bawer nakim...

Têbîniya Kovara Wyê: Bo reseniya romanê me dest nedayê.

Nezîre

Mihemed RONAHI

Ji bo Melayê Cizîrî

Roja te b'xêr nazdara min
Bi de'we û dozbara min
Bendewar û sozdara min
Tofan û bahozdara min

Ez nexweşim tebîb î tu
Dost û yar û hebîb î tu
Di nav rindan hesîb î tu
Ji min re xweş nesîb î tu

Tu mêvanî ez jî xan im
Sîba te b'xêr be ya xanim
Dema nebî min nîn e can
Dixwînin l'ser min selayê

Ji eşqa te perwane me
Ker û gêjim dîwane me
Bê malbatû bê xane me
Bê xeber û bê wane me

Şev û rojan dinalim ez
Bêpergal û bê halim ez
Emir çû êdî kalim ez
L'ber dergê te evdalim ez

Li dergê te bi efxan im
Sîba te b'xêr be ya xanim
Dema nebî min nîn e can
L'ser min dixwînin selayê

Ji bo Feqiyê Teyran

Derya û umman tu yî
Meded û eman tu yî
Zana û yeman tu yî
Sebekê çeman tu yî
Alimê zeman tu yî
Şairê deman tu yî

Bêav û qerax ez im
Nezan û çerax ez im
Ê bê şebçerax ez im
Ê dût û fîrax ez im
Matmayî b'merax ez im

Xwedanê xeyran tu yî
Heval steyrana tu yî
Şahê şa'îran tu yî
Bi kêf û seyrana tu yî
Ê ku ez b'heyran tu yî
Feqiyê teyrana tu yî

Bê wec zîbahî ez im
Bê kêf û şahî ez im
Ê di korahî ez im
Ê bê zanahî ez im
Memê ronahî ez im

Ji bo Şêx Ehmedê Xanî

Heleke kullî şairûn îlla ente ya xanî
Xaceyê ma mîslê nûrî hemîşe direxşanî
Ben xesteyem bêçareyem derdime derman hanî
Ez feqiyê l'dergê te me derdê min tu pê zanî

Ustadûna şewaîrûke fûadûn lîl ekrad
Her kesî ra yek wetan est wetanê ma nedarad
Ben çeraxam sen hostasan almax isterem mûrad
Dil bi pêl im ji eşqa te wa ye ez bûme ferad

Cêr şikestin

Huseyîn GUÇLU

Mizgîna min li te
Çirûsk dibe şîrîkê tenêtiya şevê
Bi kena birûskê
Biriqîna ronahiyê
Ji nû ve wateyê dide tariyê

Gelo du rûyên mirov tenê hene?
Nizanim! Nizanim ji xeynî ker û laliyê
Bêdengiya xwe lê dipêçe dibe rûyek
Yan jî kelogirîya di gewriya min de
Xwe di singê min de vedimirîne...

Çend cêr vê kêlikê
Di riya avê de dişkên
Çend dilop
Xwe ji şerbikên axa sor vedidizin (azad
dikin)
Çend gotin lêvên şîrîn radimûsin
Dibe ku niha zimanek pûç dibe
Peyv jî dirizin

Di şerbikekî de mey
Ji xwe vedixwe
Nizanim mey serxweş e
Ji maçkirina şerbik
Yan jî şerbik ji ya meyê

Çima, jixweçûyîn
Xwebilêvkirina eşqê ye gelo?

Agirê dilê min dikizkize
Şerbik şikest
Mey ber bi dilê axê ve rêwî ye

Ji wî bitirs!
Ji parsekê bermayiyên evîna xelqê

Divê mirov
Di agirekî soreşewatî de bihele
Hebe çûyîn, nebe veger

Tu dilêş û evîn dubare nabin
Her qendîl bi agirê xwe...
Dia bikin bêhîv be şev

Jixwe... Çend sal
Di hundirê hev de hatin girêdan
Di hundirê xwe de
Bireke bêbinî
Ketineke ne li xwe
Ji xwe

Dûr im qasî maçkirina te
Ketina min, a di qelişteken lêvên te de
Yarê! Ji eşqa te ye
Di tenêtiya xwe de, belengazî

Min navê xwe ji bîr kir
Bênav im..
Bênav...
Bê...
...

Du helbest

Şengul OGUR

Ji derzên zimên

Şevêk dişikê di min de îşev
Qeşayek bi piştê min ve xwe kaş dike
Û Xwedayek dizê di derzên zimanê min de

Dilerizim
Diderizim
Ditevizim
Dipengizim

Kijan Xwedayî xwe ji xewna min vedizî?!
Ev zimanê ku pê xewnan dibînim
Xwe li min dihejîne wekî qorziya mêr
Zarok ji nîn im ku tê bigerînim tifa xwe
Nexwe ev xewnek e ku ji piştê qozeqerê di-
bînim

Belê; min zarokê xwe jî kuşt
Ya rast; hat kuştin
Di şeveke xayîn de

Şopa piyên pisîka birçî me li vê berfê
Li dû şopa wê tirsê mirinê
Hîna jî dibihîsim dengê dilê wê

Tu aram be pisîka min
Ewteewt dimîne ji kûçikên birçî re
Min qoqê serê xwe avêt ber gava din
Da ku bikewite kêlik berî kêliyêkê

Nexwe ez çûm
Da ku hişyar bibim li xewna xwe
Şev dihîle li rojê
Baz baskên xwe divezilîne li ezmên
Li wî zinarî zarezarek dizinge

De porên xwe bi deyn bide min darçilokê
Ez ê çal bikim hemû biharên te soz
Giriyên min emanetî te ey geliya lalî
Keştiya min bi silametî bigihîne tu ey
bestê

Li wê girava wînda tu silavan li avan bike
Min gavên xwe di lêt de çandin
Li tilika min ma qewlên min
Çi bikim li parsûyên min
ala lalan li ba ye

Hêviya min

Bizrên jiyane, ên li vê zeviyê
Dê hêşin bibin li dahatûyekê
Gîsinê min zeman, cotkarê min dil
De bajo dilo!Tu bajo!..

Da bizelile zeraq û zerya
Jê ve bixuyê bihuştê wînda
Û vemire arê dojeha Xweda
De bajo dilo!Tu bajo!..

Ji bêrmên min biçîne tu gewrewran
Ji reşika çavên min tu lerza stêrkên
Ji dilê min tu hemû cure kulîlkan
De bajo dilo!Tu bajo!..

Min şev çandin lê; ên havînan
Û çirayên şevên wînda, tevî çirokan
Berbangên sor, ji çar kişweran
De bajo dilo!Tu bajo!..

Aliyek min sosin aliyek min beybûn
Dilê min êtûn ji nîvekê vêketî
Aliyek min şev e aliyek min roj
De bajo dilo!Tu bajo!..

Du helbest

Zekî KAYAR

Lêanîn

Min serê xwe daniye ser milê dûrbûna te
Devê xwe daniye ber guhê bendewariyan
Û hêdî hêdî ji te (xwe) re diaxivim...
Carinan rasterast diaxivim
Carinan awakî
Carinan jî amikî...
Tev mifteya deriyê dilê te ne
Nizanim lê tên an na?

Sirgûn

Bê mecal e rêwiyê sirgûnê
Gelekî dûr ketim ji perestgeha xwe
Belkî wek nîvteseliyekê be jî
Îbadeta çolberên nepenî
Pirtir kamil dike îmana evdan
Her kes bi emelê xwe tê pîvan

Di mêzîna hevpeymanên pîroz de
Birîndar bi birîna xwe dizane
Hê jî aşkere nebûye şopa niştecihiya nû

Wek dûdana ku roviyên mişext
Fetisandin çêlik di zerika hêkê de

Ji zû ve dimehilim û dimehitim
Li ser bextreşiya me her duyan!

Bîranînên sewsî

Xecê OMERÎ

Dilê kavi
Di zeryaya çavên te de li bihara rengîn dibişire
Û ji nû ve dixuşxuşin
Rûbarên eşq û evîna razayî
Bîranînên di bîrên sewsî wendayî...
Bi sewtîna te diqede mişextî...
Newêrim awirên xwe ji awirên te vedizim
Wê li kalanê xwe yê zengiyayî vegere dilê riziyaî!
Wê êşên hezar û yek şevê bibilînin, barînên zivistani
Newêrim du dangan ji te re bililînim
Ditirsim şiyar bikim zebaniyên xewrevîn
Ditirsim şiyar bibim ji xewnerojka şîn...
Zinhar!
Tu çavên xwe neqirpînî
Wê xwe bi mijûyên te yên hêwî bi dar ve kin Xec û Zîn
Wê xwe li çolistanan bi pepûk kin...

04.11.2009

Çarîn

Hemkoçerê CIZAWIR

Çarîn çi ne ji ku hatine bibîne
Çand û wêje bi wateyan bixwîne
Çemkê merî qet namire li jîn e
Çel sal borî gulên bejî diçîne

Gul kenîn der xemilîn hatî bihar
Gol û deryan av tê meyî ji rûbar
Gund û bajar çol û zozan bûn nîgar
Gel û millet jîn parzinandin bi kar

Bêjin û yar bêkur û zar dijiñe
Bêmilîk û mal dost û heval ji nîn e
Bextê min reş dilê min geş gergîn e
Barê giran can û rewan diqşîne

Baba Tahir dubeytê wî Gorî ne
Berî niha hezar salî rêşîne
Bandora wî li hişê min zengîn e
Bo vê yekê min ji hin nivîsîne

Wek oldar bo Xwedê dike nimêj e
Wisa pênûsa min jî per dimêje
Weku zemîn ji dil volqan davêje
Wiha xame hêsir bo wî dirêje

Da bimîne ev gotin li jiyanê
Deng û navê min jî li Kurdistanê
Def û zirne dengê xwe bê dilanê
Dengê min hat çavêd min çûn razanê

Van helbestan ez dibêjim bo zana
Va ye rê û doza her xwendevana
Vekişî ji rojê ewrê ezmana
Vîna mirov wî digîne hêlana

Ev name ye ev helbest e silav e
Ez dihûnim ez dirêsim bi rave
Erênî lê neyênî heş belav e
Ezbenî li min bibexşin ev tav e

Alafa dil rabûye digurbîne
Arişanên min û hêvî zayî ne
Aram li ser pênûs nemayî dîn e
Axîna min helbestek serpeyîn e

Ger hûn bidin min derfeta vê şorê
Guh bidin min xweş tê sazê bilûrê
Gazina min ji kurdan re bi torê
Govend divê gel kom bibe li dorê

Hêvî pir in têkurk pir in dilter in
Heterbûna pênûsa min jî per in
Hezdike gotin bi bîra min werin
Helbest wek min tim bi hesretan nerin

Kurdistan avis bûye ji hêvîyan
Kurd jî li welatê xwe mayî biyan
Kurmê darê ji dêr e baş tê xuyan
Keştiya gel ma li ber pêla deryan

Bi xatirê te

Yûsûf BAGI

Bar kirin çîrokên evînê
Li gel baqek kulîlkên sor
Penaber bûn şênîyên xaka zêrîn
Bûn keramper
Li ber bapêça bayê başûr û navnîşana nediyar
Hêvî bû welatên biyanî û çanda cuda
Her xwezî bû baxên gulan û mêrgên bi bîn
Di tûrikê penaber de
Mistek xaka zêrîn
Û baqek xewnên şiyar
Di sêkuçika dilê jar de
Çewlikên Şerefdînê
Û hewîngên Gola Wanê
Bi xatirê te Çiyayê Ararat
Kato û Qendîl dergûşa şaristaniyê
Bi xatirê te
Warê şêr û pilingan
Û mexelê pezkovîyan
Bi xatirê te dara kevînar
Warê civaka dilsoz
Bi xatirê te
Şiqîfê reş, lûsa bilbilê zorziman
Di tûrikê penaber de
Golek rondikên watedar
Gavên bêdaxwaz
Gavek li pêş û yek li paş
Bi xatirê te xaka zêrîn
Bi xatirê te erdnîgariya şêrîn
Bi xatirê te, bi xatirê te
Kurdîstana rengîn
i destê min de

Pepûle

Ercan DOĞAN

Şeşsed û şêst û şeş hezar ramûsan hene
Deynê biçûkbûna min in
Metê, xalo, xaltî

Ji min hez kirin bi zorê
Ev kur ne ji me ye gotin
Ev keçik nefsbîçûk e gotin...

Dêman reng avêtiye
Şîrqîna birûskan e
Di bin paniya azebiya min de
Di destê min de gopalê Xwedê
Ez qudqudîka ewran tînim
Kes nakene?
Na!

Pê li ku dikim ji dil dinale
Tenê av min hembêz dike
Û çav
Û maçek ji bostanê dilê te...
Di giriyê pepûleyan de
Çend reng mirine
(Sal û mehan nehesibîne)

Çima heft roj in emrê min?
Qey ez biçûkê heft xwişkan im
Ku rojê 666 caran
Têm evirandin bi sorlêvên jinanî

Rengên min

Evdê Koçer CANO

Ez zer hatim
Şîn jiyam
Sor dimirim

Reşê girênede
Tu dibînî li min nayê!
Di ferhenga min a rengan de
Çend biwêjên ku pir ji pesnan hez dikirin
Hebûn
Ez li wan geriyam berî niha
Şalê ji xeydê nebe
Ne li cihê xwe bin!

